ŞERRÊ ARMAGEDDON'Ê Lİ RÊ YE? • Faysal Dağlı • ▶ 2

Rûsya di rêya kê de dimeşe?
Hejaré Şamil • ▶ 4

Hikûmeta Hewlêr'ê bê stratejiya medyayê ye
Dr. John Hogan & Prof. John Trumpour • ▶ 18

LE MONDE diplomatique kurdî

Almanya: 3,50 Euro
Welatên din: 4,00 Euro

Nîsan 2010 - Hejmar 6 · www.lemondekurdi.com · info@lemondekurdi.com · 32 Rûpel

Bûrqa; axaftinên vala

SERGE HALIMI

Diyar e fransiyên ku hejmara minareyên li Swîsre'yê û jinên bi "bûrqa" yên li Fransa'yê (sê sed û şêst û heft kes (1)) agahdar in, ji yên dizanin ku xezîneya dewletê piştî stendina biryareka "teknîkî" ji alî desthilata tenfîzî ve 20 milyar euro wendakiriye zêde ne. Bi rastî, beriya hejdeh mehan, li cihê ku hikûmeta Fransa'yê alîkariya ji bo bankayên li ber îflasê têxe ber şertê beşdariya bi sermiyanên wan yên ku dikarîbûn piştre bên firotin bi qazenceke girîng, wê deynek bi şertên ku, van bankeyan bawer nedikir, da wan.

Bîst milyar euro qezenc gihîşt peredarên bankeyan, hewatekê qasî kêmketina budce ya ewlekariya civakî ya sala borî ye (22 milyar euro), û dike çil car tevahiya hatina aborî ya salane ku dewlet pêktîne, dema ku ew ji du karmendên dibin xanenîşin, cihê yekî tenê tijî dike.

Hatina li ser xwe ya Eniya Neteweyî di hilbijartinan de û bi awayekî giştî ya rastgirên ekstremîst li Ewrûpa'yê ne dûr in ji vê belawelakirina bala raya giştî di nav tekstê gengeşiyên erzan ku dikutin û pûşikê babetên girîngtir de ku dibêjin ew pir zehmet in ji 'evdên xwedê' re.

Birêz Nicolas Sarkozy yê fiyaskoya hilbijartinên herêmî li dû wî ne, wê dest bi "reforma mutaqaîdan" bike. Ji ber girîngiya encamên civakî û samanî, ji niha ve em dizanin ku hikûmeta Fransa dixwaze xelkê bi "gotûbêja li ser bûrka yê" mijûl bike.

Helwest li hember vê manevreyê, esse ne bi awayê ku dide xwuyan herwekî parastina semboleke taristaniyê ye. Ji xwe, çênabê fêmînîstên - mêr û jin- ku li dijî bûrkayê derdikevin, bi rasîsmê bên gunehbarkirin. Lê çawe mirov, rastgirek ku hema li herderê qedera xwe bi ya dêran, patriyarkê û bi nirxên olî ve girêdaye û ku ji nişkave bi xwe hesiya ye ku dilxwazê layikbûnê, fêmînizmê û ramana azad e, wek pêkenokekê nebîne? Ji bo rastgiran jî, Îslam mûcîzeyan pêktîne!

Di sala 1988'an de, birêz George H.W. Bush şûna Ronald Reagan girt. Piştî kampanyayeka ji demegojiyeke balkêş ku têde daxwaza krîmînalîzekirina sotana alaya stêrkirî kiribû. -Salê, ji carekê heta heft caran ev tişt çêdibe.- Bi wêrekiya ku em dikarin xeyal bikin, ji sedî 90'ê parlementerên amerîkî tedbîrek çewsaneyî bi vê wateyê standin, lê dadgeha bilind ew neyinkir. Di wê demê de bi xwe, yek ji hetîketiyên herî mezin di dîroka aborî ya Dewletên Yekgirtî yên Amarîka'yê, ya bankeyên danîna pereyan ku Kongre'yê ew ji hukmê rêbazan azad kirine û dûre hatin talankirin ji hêla hîlebazên piştgirtî, ji hêla hilbijêrên ku kampanyayên wan van hîlebazan fînanse kiribûn. Di sala 1988'an de, bêje hema tu kesî pêjin ji xwe ne anîbûn li ser xetera xapandineka wiha, tevî ku ji berê ve dihat zanîn. Pir tevlîhev bû, û dûre parastina alê mêjiyê herkesî dagirtibû.

Hetîketiya bankeyên danîna pereyan 500 milyar dolar li ser bacderên amarîkî kirin. Emê di nêzîk de bizanin ka bi rastî çi li pişt "bûrka" yê heye û ka bihayê wê li ser me çiye?

Wergera ji fransî
Şergo Omar

(1) Ger hesabekî pir zelal ji hêla Rêveberiya Navendî ya Saloxdariya Hundirîn (DCRI) bê kirin!

Bandora şerr û şîddetê li ser civaka kurd

İLHAN KIZILHAN*

Ahmet Gümüştekin (Qurbaniya Trûwa'yê)
(Derbarê hunermend de rûpel 31)

Dema di pirsgirêkên şîddetê de, weke şêweyê herî dijwar jî di şer de, mirov werin kuştin yan birîndar bibin (wateya vê jî ew e ku hin mirov hin mirovên din dikujin yan jî birîndar dikin), hingî ev rewş bi serê xwe xisleta civakekê yan jî civatekê gelekî diguhere. Ew xislet û karakterên civakan heta bi ferdan bi xwe diguhere, lewra wateyeke taybet a jidestdana jiyana mirovan û pêkanîna şîddetê, ji bo endamên civakan heye. Di encama şerekî bi vî rengî de mirina mêr, jin û zarokan ji bo tevahiya civakê serboriyeke gelekî girîng û bitesîr e. Ev serborî hevîrê jiyana wan disitire. Li ser mijara, ka civak wê çawa pêşkeve û bi pirsgirêkên xwe re bike der, bandoreke mayînde li civakê dike.

Dema şîddeta fizîkî demdirêj be, hingî bandoreke wê ya ewqasî bi tesîr li ser civakê çêdibe, ku 'çandeke şîddetê' (Bar-Tal, 2000) pêk tîne. Ev tecrûbe û serboriya demdirêj a bi şîddetê re ya ku gelek nifşan digire nav xwe, di warê hisî de jî digihêje endamên civakê, wan dikşîne nava ya diqewime û dikeve nav hilberandina civakî ango sazî û tevnên agahdarkirinê yên civakê. Bi demê re mînakeke çandî pêk tê. Di nava vê mînaka çandî de baweriya sereke ya civakî, ji bo bîranîna hevwelatiyên jiyana xwe ji dest dayî pêkanîna rîtuel û merasîman û ji bo rûmet û bîranîna kesên hatin kuştin avakirina abîdeyan, hene. Bi guherandina bîrûbaweriyê û pêre jî rabûnûrûniştina endamên civakê, ev yek şopan li pey xwe dihêle. Bi daxwaza xwe ya ewlekarî û paras-

▶ 16

ATOMÊN ÎRAN'Ê WÊ BI SERÊ KÊ DE BITEQIN?

Şerrê Armageddon'ê li rê ye?

FAYSAL DAĞLI

Li gor cîwanokên Îsewiyên protestan 'Armageddon' şerrê dawîn yê navbera xristiyan û muslumana ye. Heman bawerî di nav muslumanan de jî wek hatina Mehdî û şerrê wî bi Yecuc û Mecûc re tê îfadekirin.

Li gor fundamentalîstên protestan ji bo ku Îsa Mesîh careke din were jiyanê divê di navbera xristiyan û muslumanan de şerrê nihayî yanê 'Armageddon' biqewime.

Ji bo ku ev şer biqewime divê an cihû êrişê muslumanan an jî musluman êrişê Cihûyan bikin. Li gor efsaneyê şerrê Armageddon wê li girê Magedon ku li nêzî Qudus'ê ye biqewime. Li gor efsanê şer wê bi êrişa muslumanan ya ser Beni Îsmaîliyan destpêbike. Fûndamentalîstên Protestan dibêjin ku vî şerî de lazime ew piştgiriya Îsraîl'ê bikin. Lewra Hazretî Îsa jî wek 'Şêrê Îsraîl'ê' hatiye jiyanê. Heta ku cihû li dijî muslumanan di vî şerî de bisernekevin wê Îsa careke din nezivire cîhanê. Ji ber vê yekê hevkariya Îsraîl'ê fermaneke ayînî ye. Di vî şerî de tenê wê 144 hezar cihû xelasbibin. Wê ew jî îman bi Îsa bînin. Bi vî awayî vê li cîhanê tenê bawermendên Îsa bimînin.

'Mehdî' Ahmedînejad û 'Mesîh' Obama!

''Bê ku em hîç tawîzek bidin, di nava çend salan de em bûn welatekî nûkleerî. Hêza nûkleerî ya Îran'ê, desthilatiya pergala otorîter ya gerdûnî şikand. Niha 3 hezar santrîfuj dixebitin. Her hefte xelekek nû ya santrîfujan tên damezÎrandin. Ji alî me dosya ya nûkleer hat girtin. Yek dû dewlet bîlesebeb feryad dikin. Bawer bikin nikarin tiştekî jî bikin.''

Ev gotinên jorê yên Serokkomarê Îran'ê Mahmud Ahmedînîjad'in. Gelo rast e ku Ahmedînîjad ewçend wêrek û prowokatîf biaxife û Îran gav bi gav ber bi armanca bidestxistina çekên atmomîk bibe û di serî de Amerîka û Îsraîl û alema Rojava jî vê hewldana Îran'ê bê ku tiştekî bikin temaşe bike? Wek Ahmedînîjad dibêje bi rastî Amerîka û Îsraîl nikarin li dijî hewldanên bombeyên atomî yê Îran'ê tiştekî bikin?

Îran li dijî biryara Licneya Ewlekarî ya Netewên Yekbûyî bernameya dewlemendkirina ûranyûmê didomîne û hijmara 3 hezar santrafûjên heyî duxwazê derxe 50 hezarî.

Serokê Licne ya Enerjiya Atomî ya Navnetewî (LEAN) Muhamed Baradai di raporta xwe ya dawîn de dibêje ku bernama dewlemendkirina ûranyûmê ya Îran'ê di bin qapasîteyê de dimeşe û Tahran hîn jî dûrî hedefa hilberîneke xeter ya sotemeniya nûkleer e. Li gor raporê hevkariya Îran'ê li gel LEAN'ê gaveke girîng e û gerek dewlemendikirina ûranyûmê gerek jî înşakirina raektora hilberîna platonyûmê ya Rejima Tahran'ê gelek hêdî dimeşe. Li gor pisporên leşkerî û enerjiya nûkleer, Îran di navbera 3 û 8 salan de wê çekên atomî hilberîne. Li gor Ahmedînîjad ew 'gelek nêzî lûtkeyê ne.' Wiha diyar e ku Îran a nêzî lûtkeyê bernama xwe ya nûkleer neguhurîne Amerîka û Îsraîl beriya bidestxistina bombeya atomî wê li Îran'ê bidin.

Wiha diyar e ku di derbarê pirsgirêka hewldanên bidestxistina çekên atomî yên Îran'ê û biryara Amerîka û Îsraîl'ê ya dijberiya vê yekê wê Rojhilat a Navîn nêzî şerrê Armageddon bike!

Têkoşîna Navbera Şaristaniyan

Helbet hewldanên hêza atomî tenê nînê yê ku Îran û Amerîka aniye dijî hevûdû. Şoreşa Îslamî, ku rejima Şah ya hevkarê Amerîka ruxand, Washington'ê li Rojhilat a Navîn ji dosteke mezin bêper hişt. Îran a Îslamî piştî têkçûna sosyalîzma real li cîhanê wek dijbereke berjewendiyên Amerîka cîhê Rusya girt. Meleyên Îran'ê bi taybetî li Rojhilat a Navîn, li erdnîgara Îslamî, Asya navendî û Kafkasya wek rakîbê alema Anglo Sakson tev geriya.

Piştî dagira Îraq'ê jî ku Amerîka û Îran bûn cîranên hevûdû nakokiyên navbera herdû aliyan wek rewşeke rasteqîn hat rojewê. Niha şerrê navbera Tahran û Washington'ê li Filistîn, Lubnan, Îraq, Afganîstan û çend deverên din didome. Lê wiha diyar e ev şerrê sar yê aliyan di demekî nezîk de wê wek tofaneke germ rengê xwe buguhurîne. Lewra Amerîka di pêvajoya 'şerrê navbera şaristaniyan de' wek rakîbê herî xurt Îran'ê li hember xwe dibîne. Di hemû hesabên Amerîka yê Rojhilat a Navîn de Îran wek nokê hesinî di gewriya Amerîka de dieliqe û rayedarên Amerîkî vê noka hesinî nikarin daqurtînin. Ev yek jî perdeya dawîn ya têkoşîna herdû aliyan bileztir dike.

Di şerrê Îraq'ê de Amerika bê ku bihesibîne, Îraq a Şia diyarê Îran'ê kir. Amerika ku berî ruxandina rejima Saddam, Şîayên Îraq'ê wek hevkarê xwe dizanibû, piştî dagira Îraq'ê xeletiya vê hesabê xwe baş naskir. Amerîka ne Şîayan, lê Şîa ji Amerîka îstifade kiribû. Rejima Tahran'ê piştî ku Amerîka kaşî dafika Îraq'ê kir û Rejima Saddam ruxand, qertê Şîayan ji destê wan stend, li Îraq'ê dîsa bi saya Şîayan darbeyên gewre li pîlanên Amerîka dide. Li aliyê din li gor agahiyên ku ji deverên kûr ve tên, di navbera Qaîde û Îran'ê de hewa sar belavbûye û di navbera wan de li dijî Amerîka cehpeyekî hatiye sazkirin. Yanê Îran di heman katî de li Îraq'ê komên Sune yên êrişkar jî li dijî Amerîka manipule dike. Tê bawerkirin, li Îraq'ê di teqandina her bombe û fîşeka dijî hedefên Amerîkî de tiliya meleyên Tahran'ê heye.

Niha di hilbijatinên dawîn yên Îraq'ê de Barack Obama dixwaze xeletiya Bush sererast bike û ji ber vê yekê Malîkî yê ku teslîmê Îran'ê bû, bi Alawî re duguhurîne. Yanê Amerîka ji çemê Îraq'ê derbasbû niha dema guherîna hespê ye!

Tahran wek her baharan di bahara 2010'an de jî bi topbarana ser Başûrê Kurdistan'ê rasterast li dijî serdestiya Amerîka dest bi operasyonên germ kiriye. Wateyeke topbarana Îran'ê ya gundên sînorê Kurdistan'ê jî ev e. Herwiha balkêş e ku Obama jî wek Bush hefta borî hat Îraq a ku ji alî Îran'ê ve tê bombekirin û di derbarê vê meselê de bêdeng dimîne. Diyar e wê Obama jî wek Bush demekî li Îraq'ê kuştina leşkerên xwe yên ji alî Îran'ê ve temaşe bike.

Divê neyê jibîrkirin ku hêzen Brîtanî ku qaşo li dijî berbendkirina xetera Îran'ê li Başûrê Îraq'ê hatibûn mewzîkirin, wek vekişîna Necef'ê hêdî hêdî dev ji sengerên xwe berdidin bi vî awayî Împaratoriya herî kevnarê ya Rojava li hember Împaratoriya herî kevnare ya Rojhîlatî neçar û belengaz dimîne. Balkêş e li hember ev wêrekî û çalakiyên Îran'ê generalên Amerîkî, li Îraq'ê heta niha tenê karibûne çend dîpolamatên Tahran'ê derdest bikin. Lê serê generalên Pentagon'ê ku heryek bi qasî hemû Artêşa Îran'ê hêzgewren e, ji alî kesên wek Mukteda Sadr ê ve tên gerandin û ew di germola Îraq'ê de heta niha nizanin çi dikin?

Dema mirov li dîroka nêz ya Îraq, Îran û Amerîka temaşe dike yekser trajîkomedî tên bîra mirov; Amerîka di sala 1979an de bêrê Saddam Huseyîn dabû Îran'ê. Biaqilên Pentagon'ê qaşo wê bi destê Saddam, Şoreşa Îslamî têk bibrana û dostê xwe yên ruxandî Şah Riza careke din vegerandina ser textê wî yê li Tahran'ê. Bi saya êrişa Saddam Şoreşa Îslamî li Îran'ê temam bû. Di berdewama vê serpêhatiyê de Saddam bi kindirê Îran'ê hat sêdarê kirin, Îraq ji alî Amerîka ve hat dagirkirin lê ji alî Îran'ê ve hat fehtkirin û ev fîlmê trajîkomîk hîn jî didome.

Sînorên Îran'ê ji nêzî Qudus'ê destpêdike!

Di pirsgirêka Filistin'ê de Meleyên Tahran'ê bi saya bandora xwe ya li ser Hamas'ê hemû pîlanên Amerîka û Îsraîl'ê têk dibin. Herçend Îsraîl qaşo Hamas'ê tecrît dike û Fetih û hikûmeta Mehmûd Abbas diqetîne jî, berewajiyê vê yekê jî rast e. Mirov karê bêje Îran, Hamas'ê ji bin tesîra pîlanên Îsraîl'ê dûrdixe û bi vî awayî di siyaseta navxweyî ya Îsraîl û Filistîn'ê de wek mînaka Hîzbûllah a Lubnan'ê, enstrumanên taybetî diafirîne. Lewra li Filistîn'ê Fetih êdî li gel Îsraîl li dijî Filistîniyên din li dij Hamas e. Yanê Fetih û Tel Awîw li aliyekî, Hamas û Tahran jî li aliyekî ne. Bi vî awayî Îran coxrafya nakokî û şer fireh dike û sînorê xwe yê parastinê bi hezaran kîlometre ji dûrî ve didamezrîne.

Di pirsgirêka navxweyî ya Lubnan'ê de bi saya Hîzbûllah û Feht-ül Îslam'ê pîlanên Amerîka yên vî welatî hemû betal dikin. Katûyşayên Hîzbûllah'ê ku ji Tahran'ê tên îdarêkirin, ewçend bihêzin ku di dîroka Îsraîl'ê de cara yekem têkçûneke leşkerî bi generalên cihû dide tamkirin. Bi saya Hîzbûllah'ê Tahran di dewleta Lubnan'ê de wek hevparên hikûmetên Beyrûd'ê yên qederê ye. Ne bi wan ne jî bê wan dibe. Hîzbûllah piştî sengera yekem ya nav Îsraîl'ê di sînorê Îsraîl'ê de sengera dûyem ya parastina Îran'ê ye. Heta desthilatiya meleyên Tahran'ê bimîne wê Hîzbûllah a Lubnan'ê jî bimîne. Amerîka û Îsraîl piştî şerrê îsal yê navbera Şîayên Lubnan'e û artêşa Îsraîl'ê vê rastiyê careke din teyît kirin. Îran li Lubnan'ê bi taybetî di navbera penaberên Sune yên Filistînî de jî hevkarên radîkal afirandiye. Bûyera Feth-ul Îslam ya sala 2008'an ku di raûnda yekem de bi kuştina sedan kesî bidawî bû, pîlanên Tahran'ê dida dest. Wiha diyar bû ku întîxarkirina çekdarên radîkal yên Feth-ul Îslam'ê di kampa penaberan de peyameke xurt bû ji bo Amerîka'yê. Lewra ew karibûn teslîm jî bibûna. Lê wan ''şehadetê'' hilbijart! Bi vî awayî tradîsyonekî jî afirandin. Ji ber vê yekê di şerrê Gazza'yê yê sala 2009'an de Hammas'ê li dijê hêza erjeng yê Îsraîl'ê karibû berxwe bide. Divê neyê jibîrkirin ku di civaka Lubnan û filîstiniyên vî welatî de tevna Îran'ê ji bilî Hîzbûllah û Feth-ul Îslam'ê jî heye û heta niha Feth-ul Îslam nedihat naskirin!

Germola Afganistan'ê

Li Afganistan'ê 9 sal piştî dagirê hîn jî hêzên Amerîkî û hevkarên wan ji bilî bajarên sihêtiya vî welatî nekirine. Hikûmeta Kabîl'ê heta niha jî wek hikûmeteke leşkerî ye û li welat hîç projeyekî serkeftî yê civakî pêk neaniye. Hêzen dagirker û rejima Kabîl'ê hemû qabîlîyeta xwe ji bo parastinê xercdikin. Ger îro Amerîkî û hevkarên wan ji Afganistan'ê vekişin, wê kê rêya peytextê li dijî çekdarên Talîban'ê bigre? Li aliyê din yek ji sedemên dagirkirina Afganistan'ê dorpêçana Îran'ê bû. Lewra li gor pîlanê stratejên amerîkî, Îran ji bakûr ve bihata

Ahmet Gümüştekin (Tayr û Tav)

dorpêçkirin wê di rewşa şerekî parastinê de kûrahiya coxrafyayê nikaribûya bikarbaniya. Helbet meleyên Tahran'ê jî dersên stratejiyê dîtibûn û baş zanibûn ku taktîka herî baş, valaderxistina taktîkên dijmin e. Ji ber vê yekê dagira Afganistan'ê û tehdîdên ser Îran'ê Talîbanên Sune û meleyên Şîa anî kêleka hev. Îran bê ku ji sînorê Afganistan'ê werê tehdîtkirin, lê sînorê Afganistan'ê niha wek tehdît bikartîne. Generalên Pentagon'ê qaşo wê sînorê Afganistan'ê li dijî Îran'ê wek rêya îxrackirina terorê bikarbanîna. Esta sînorê Afganistan'ê ji alî heman generalan ve ji bo berbendkirina terorê ku ji Îran'ê tê ixrackirin, tê parastin. Bi saya piştgiriya Îran'ê, Taleban bi taybetî îsal careke din ji çiyayan daket û dest bi şerrê partîzanî kir. Di mehên dawîn de Talîban û komên Usama Bîn Laden ku tê gotin li Îran'ê ye, dest bi rêzêerişên xurt yên li dijî yekîneyên Amerîka û hevkarên wan kirine. Piştî ewqas hêz, desteka navnetewî û hevkarên heremî jî siyaseta Amerîka li Afganistan'ê biserneketiye. Wiha diyar e ku heta Îran destê xwe ji Talîban û komên din yên Îslamî nekşîne, wê Amerîka li Afganistan'ê bisernekeve.

Roviyên Tahran'ê, Afganistan a Sune ya ku ji bo ruxandina rejima wan hat dagirkirin niha wek sengera parastina welatê xwe bikartînin û Amerîkî bê ku nizanibin çi bikin li germola Afganistan'ê bi sîberê re şer dikin. Wiha diyar e amerîkiyan jibîrkirine ku musîbeta dawî li Yekîtiya Sowyet'ê anî şerrê Afganistan'ê û Talebanên Afganî bûn ku Pentagon alîkariya wan dikir. Lê niha ew li Afganistan'ê ne û Taleban li dijî wan şer dike. Tenê ferqekî heye; Niha Îran li pişt Taleban e û ew li hedefê ne! Divê em bînin bîra xwe ku Amerîka meha borî serokê Cindûllah a Belûcîstan'ê jî di ser da roviyên Tahran'ê!

Hevkariya Şîa û Nusayriyan

Îran herwiha wek sîbera Sûriyê jî tevdigere û rejima Şam'ê li dijî Amerîka û Îsraîl'ê fît dike. Tahran, Rejima Esad ji bo valaderxistina hemû pîlanên Amerîka û Îsraîl'ê li heremê birêdive û tevî Şam'ê blokeke hesinî li dijî wan dirîse. Rejima Nusayrî ya Şam'ê û Rejima Şîa ya Tahran'ê li dijî berjewendiyên alema Anglo Sakson û cihûyan qedera xwe kirine yek. Ji vê alyansê heta yek neyê ruxandin ya din wê li ser hikum bimîne. Ruxandina Şam'ê, ruxandina Tahran'ê ye û berewajiyê vê yekê jî wê heman encamî bide. Sûriye di parastina sînorên Îran'ê de sengera sêyem ya meleyên Tahran'ê ye. Ji ber vê yekê di bûyerên wek kuştina Herîrî, çekdarkirina Hamas'ê, Hîzbûllah û Feth-ul Îslam'ê û hêzên heta niha nediyar de hevkariya ev herdû rejimên ayînbrader hevkariyeke stratejîk e. Divê neyê jibîrkirin di backgraunda vê îtîfaqê de Rûsya jî wek fîgurekî siyasî tê xuyakirin. Li aliyê din Rejima Husnî Mubarek ya Kahirê yê jî ji bo li gel Amerîka û Îsraîl bibe dostekî qedirşînas, herçend li aliyekî vê di binî de vê hevkariyê teyît dike, li aliyê din wek braderê mezin yê alema ereb di proseya vê nakokiyê de bi rola nabençîtiyê, dewra 'Li Rojhilat a Navîn aştiya bê Misir nabe' didomîne.

Ji bilî vê yekê Rejima Tahran'ê bi saya eqaliyêtên Şîa yên li welatên wek Siûdî, Pakistan, Yemen û Emaret ev rejimen dostê Amerîka'yê tehdît dike û aloziyê li seranserê sahaya berjewendiyên Amerîka'yê belav-dike.

Roviyên atomî û maceraperestên global

Gelo Amerîka û Îsraîl di serî de xetera atomî wê heta kêngê tahamula vê siyaseta Îran'ê û têkçûnên beramber Îran'ê bikin. Rayedarên Îsraîl'ê heta niha gelek car diyar kirin ku hewldanên bidestxistina bombeyên atomî yên Îran'ê ji bo hebûna dewleta Îsraîl'ê xetera herî mezîn e û ev mesele ji bo wan xeta sor e. Îsraîliyan bi gelek awayan jî tînin ziman ku Amerîka li dijî Îran'ê tedbîr nestîne, ewê biserê xwe vê hewla Îran'ê berbend bikin. Tê zanîn ku Îsraîl'ê di sala 1982'an de santralên nûkleer yên Îraq'ê bi êrişên hewayî ruxandibû.

Rayedarên Îran'ê jî li dijî ev tehdîdên Îsraîl'ê ji devê Ahmedînejad îfadekirin ku êrişa Îsraîl'ê wê bibe sedemê ji holêrabûna vê dewletê. Di serî de Bush û Obama gelek rayedarên Amerîkî ji mêjve gelek caran gotine ku ew firsend nadin Îran'ê da ku ew ûranyûmê dewlemend bikin û bi vî awayî bibin xwedî çekên atomî.

Wek tê zanîn li Rojhilat a Navîn Îsraîl yekta dewlet e ku xwedî bombeyên atomî ye. Herwiha hebûna çekên atomî yên Pakîstan'ê li gor dengêyên Asya ya Nêz yanê dengeyên navbera wan û Hîndîstan'ê tê hesibandin û li dervayê mijarê tê girtin. Lê helbet Amerîka vê yekê jî dihesibîne û li ser girên Afganistan'ê temaşeyê bombeyên Îslamabad'ê dike.

Ger Îran hêza atomî bidest bixe wê li Rojhilat dengeya heyî xerabibe û serdestiya Îsraîl'ê ji holê rabe. Xofa bombeyên atomî heta niha wek dîwarekî nedîtî 6 milyon cihû û îsraîlî li dijî 230 milyon ereb û milyarek musluman parastiye. Ger Îran vê çekê bidest bixe wê parastina Îsraîl'ê betal bibe û dengeyên leşkerî dîsa werin ser hesabên konwansiyonel. Ev jî tehdîdeke mezin e li ser Îsraîl'ê. Herwiha li gor pisporên rojavayî li dewleteke ewçend radîkal ku têkiliya wê bi rêxistinên radîkal yên Îslamî re hene, li seranserê cîhanê xetereke atomîk rûdide.

Bi vî awayî ev pozberiya mijara bermaneya nûkleer ya Îran'ê ji niha ve wek sebebê şerekî navbera Amerîka û Îran'ê de ku tarîxa wê ne diyar e tê hesibandin. Hemû hesabên siyasî niha li ser şerrê mêjûnediyar yê navbera Amerîka (Îsraîl) û Îran'ê tên kirin. Muxalefeta Îran'ê li gor vî hesabî tevdigere, kurdên Îran'ê li benda vî şerî ne, dewleta Îran'ê amadekariyên xwe li gor vî şerî dike, Amerîka hêzên xwe li gor vî şerî tanzîm dike. Ji bilî vê yekê ji ber ew sedemên ku me li jorê analîza wê kir, Amerîka, Îran'ê wek rakîbê herî mezin li Rojhilat a Navîn dizane û Îran, Amerîka wek xetera herî mezin! Bi kirtahî şer navbera Amerîka û Îran'ê di kemînê de ye.

Dick Cheney'ê cîhgirê Serok Bush, bi perê Sûdiyên dijminên mezhebî yên Şîatiyê û bi hêza saloxdarî ya Îsraîl'ê ji bo têkbirina Îran'ê operasyonên sergirtî pêk dianî. Stratejên Pentagon û Qesra Spî ji mêj ve li ser pîlanên pasîfîkasyona Îran'ê hildiberînin. Heta niha siyaseta maceraperest ya Amerîka serî bi roviyên Tahran'ê re dernexistiye. Lewra di hemû nakokiyên navbera aliyan de Îran'ê heta niha paşve gav neavêtiye û hîç hevkarekî xwe ji dest nedaye.

Bi vî awayî di têkoşîna dijî roviyê atomîk de, maceraperesten global niha opsiyona yekta yanê mudaxeleya leşkerî anîne ser masê. Ji ber vê yekê leşkerên zêdetir li Afganistan'ê bicih kirine, li Îraq'ê Alawî anîne ser hikum û bi Baasiyên kevn re lihevhatine.

Li gor çavdêrên siyasî, ger Amerîka li dijî Îran'ê mudaxeleya leşkerî neke, wê ancax tenê belavbûn û bihêzbûna Îran'ê û şikestina hêviyên xwe yên li heremê temaşe bike. Wiha diyar e pîlanê hemû aliyan ji niha ve amade ye. Gelo di vê germolê de pîlaneke kurdan jî heye, an ewê di pîlanên kesên din de bibin fîgûran?

TÊKÎLÎYÊN RÛS Û KURDAN

Rûsya di rêya kê de dimeşe?

HEJARÉ ŞAMIL*

Kurdan fêm kiribûn ku çi ji bo "girtîxaneya gelan" Rûsya ya Çar, çi ji bo "bihûşta azadiya gelan Rûsya'ya Sovyet'ê", çi jî ji bo "Rusya'ya demokrat "a ji nîrxên gerdûnî re rêzdar" qîmetê wan ji bikarhatina maşikekê wirdetir nebû.

***

Rûsya bi helwesta siyasî ya destek-nedana hebûna Kurdistan'ê, berovajî vê yekê bi rawestîna xwe ya li dijî vê hebûnê, ji bo bi Kurdistan'ê re peymanên berfireh ên aborî mohr bike li peşiya xwe kelem û astengiyeke pir mezin çêkir.

Dîroka "evîna platonîk" a di dirêjahiya sedsala 20'emîn de di navbêra kurd û rûsan de rûda, ji gazinca kurdê aşiq a li ser nankoriya rûs a maşûq pêk tê. Nêzîkbûna gelê Rûsya ya empatiyê û liberketina wan a ji bo kurdên bindest û nêzîkbûna gelê kurd ê ji ber bindestiya xwe hînî psîkolojiya lêgerîna piştgiriyê bibû ya ji bo "Sovyeta mezin/gelê Rûsya" ku weke rizgarker didît, di dirêjahiya sedsala 22'an de berdewam kiriye. Radeyeke wiha ya têkîliya watevî, di ti dema dîrokê de wernegeriyaye encamên siyasî.

Kurdîstaniyan tim û tim di nava xeyalên ku bi Rûsya'yê re dest bidin hev evîna xwe dianîn ziman, lê belê Rûsya, bi nazdarî û nazenînî hewldida ku kurdistanî li dervehi balkêşiya wê nemîne. Bi tevî ku Serokê kurd Mele Mustefa Barzanî ku 12 salê xwe li Rûsya'yê derbas kiribû di salên 70'yî ya sedsala derbasbûyî de gazincên xwe bi gotinên weke "Kurdan her gava rabûne raperînê ji rûsan alîkarî xwestine, lê belê ti carî bersîveke erênî ji wan wernegirtine" anîbû ziman jî, evîna kurdan a ji Rûsya'yê re tim berdewam kiribû.

Ev evîn, di dawiya salên 1990'an de ji bo kurdîstaniyan bi xeyalşikestineke dûr û dirêj bi encam bû… Di sala 1991'e de gava ku Bush'ê bav li Îraq'ê xist, kurdan bi pirsgirêkên giran re rûbirû hişt û xwe vedizand û ji ber vê helwesta Bush kurdan zulma nebûnê dikşandin, ji aliyê din ve kurd ji helwestên Rûsya/Sovyetan a di aliyê Saddam de jî gelek xemgîn dibûn.

Wiha xûya dikir dawiya evîna platonîk a mezin dihat.

Rûsya, di sala 1998'an de xwedî li Serokê kurdan Abdullah Öcalan derneket. Ev yek jî bû darbeyeke herî mezin ku li sewdaya kurdan a ji Rûsya'yê re ket. Heta li gorî baweriya beşeke girîng ê gelê kurd, "li dijî Öcalan û têkoşîna azadiya gelê kurd, Rûsya di komploya navdewletî de jî cîh girtibû."

Di 2003'an de Rûsya ku li dijî dîktatoriya Îraq'ê di nav hêzên hevpar ên navneteweyî de cîh negirt û piştgiriya Saddam kir, evîna kurdan a bê bersîv bi tevahî ji dest revand. Li Başûrê Kurdistan'ê avabûna Dewleta Federe ya Kurdistan'ê û avabûna Hûkumeta Herêmî ya Kurdîstan'ê ango bi gotineke din kêm be jî pêkanîna hesreta sedsalan a gelê kurd a ji bo dewletdariyê rûs'an xistibû nav tirs û xofê de.

Ji bo Rûsya'yê ku di çarçoveya siyaseta xwe ya li dijî Amerîka'yê de nêzî bûyerên li Rojhilata Navîn dibû, qêrînên azadiyê yên kurdan li ber gûhê wê ferqa xwe ji vize viza mêşekê pê ve tinebû. Kurdên ku siyasetê di nav tevkûjî û raperînan de hîn bûn, êdî ji bin nîrê hêviyên bê bingeha maddî û evîna bê bersîv derketibûn.

Kurdan fêm kiribûn ku çi ji bo "girtîxaneya gelan" Rûsya ya Çar, çi ji bo "bihûşta azadiya gelan" Rûsya'ya Sovyet'ê, çi jî ji bo Rusya'ya demokrat "a ji nîrxên gerdûnî re rêzdar" qîmetê wan ji bikarhatina maşeyekê wirdetir nebû.

Bi vî awayî ji salên destpêkê yên sedsala 21. û pê ve, çirûskên hêvî û baweriya dawî ya Kurdîstan'ê li hemberî Rûsya'yê vemirîn; têkîliyên kurdan û rûsan derbasî qonaxeke nû bû. Êdî kurd ji nêzîkatiyên îrrasyonel ango ne-rasteqîn ên li hemberî rûsan derbasî nêzîkatiyeke rasyonel ango rasteqîn bûn.

Bi sala 2003'an re bingeha siyaseta Rojhilata Navîn a Rûsya'yê hilweşiya bû û nêzîkatiyên li hemberî kurdan ên weke "bikarbîne û bavêje" têk çû bûn, hatibin têk birin.

Bi gotineke din kowboyên Washington'ê mûjîkên (gundîxulam) Moskowa'yê neçar hiştibûn ku li Rojhilata Navîn nalan bidin hev.

Rûsya li hemberî guherîna statukoyê û mêzênên li Rojhilata Navîn nerazî bû. Nêzîkatiya wê ya neyênî ya ji avabûna Herema Kurdistan'ê re, ji rewşa rayedarên rûs ku bi israr ji bikaranîna bilêvkirina pevya "Kurdistan" direviyan dihate fêmkirin.

Di 28'ê Cotmeh a 2007'an de dema ku li paytexta Hûkumeta Herêma Kurdistan Hewlêr'ê balyozxaneya Rûs hate vekirin, hingî di daxûyaniya Wezareta Karê Derve ya Rûsya'yê de bêyî ku peyva "Kurdistan" were bikaranîn dihate gotin ku "li bajarê Îraq Erbîl'ê balyozxaneya Rûsya'yê hatiye vekirin." Di berdewamiya daxûyaniyê de dema navên kesên di merasîma vekirina balyozxaneyê de cîh girtine dihate rêzkirin, ji bo Nêçîrwan Barzanî weke "Serokê Hûkumeta Herêma Federe ya Kurd" dihate behskirin ku ev yek dida xûyakirin dîplomatên rûs hêna di bin bandora dema Saddam de bûn.

Rûsya, bi taybetî ji bo li hemberî hewildanên DYA'yê yên "azadkirina Îraq'ê" yên di salên 2003 – 2006'an de, di qada navneteweyî de bibe asteng, her wiha bi esasî Sûriye, bi qismî jî di ser Îran'ê re bi rêyên îstîxbaratî cesaretê bide "berxwedanvan" ango bermayiyên Saddam ên li Îraq'ê. Lê belê Rûsya, bi qasî ku nerazîbû ew çend jî bi temkîn bû. Moskowa ku ji aliyekî ve serê wê bi çeçenan re di belayê de bû, ji dengên dijber ên li dijî hikûmeta navendî ya Tatarîstan û Başkurdistan'ê bilind dibû bêzar dibû, ji aliyê din ve li hemberî bandora DYA ya li Ûkrayna, Kafkasan û Asya Navîn lewaz diket û bi pirsgirêkên aborî re digewizî. Lewra Moskowa bi awayekî cidî û eşkere, ne wextê wê hebû û ne jî hêza wê hebû ku li hemberî destêwerdana DYE ya li Rojhilata Navîn têbikoşiya.

Di vê demê de hin siyasetmedar û stratejên evîndarê "Rûsya ya mezintir" dinivîsandin ku "ji sala 2003'an û pê ve statukoya li Rojhilata Navîn di ser Îraq û Kurdistan'ê re ketiye nav gûherînekê, lewma pêwîst e Rûsya ji bo berjewendiyên xwe tevlî vê pêvajoyê bibe û êdî wext hatiye bi kurdan re têkîliyên aktîftir deyne." Lê belê nîrxandinên di vî warî de li Kremlîn'ê ti bersîv nedidîtin.

Yek ji alîkarê dostê Saddam, Jirinovskî; A.Mitrofanov, ku rê dida ber siyaseta Rûsya ya li Başûrê Kafkasya'yê, wirditir çû û digot: ''Divê Gurcîstan di navbêra Rûsya û Îran'ê de were parvekirin.'' Mitrofanov, ji bo Kafkasya dihatûyê pêşbîniyek dikir û digot, wê çar dewletên serbixwe, Rûsya, Îran, Ermenîstan û Kurdistan hebûna xwe biparêzin. (Dugîn A.G. "esasên Jeopolîtîkê." Beşê 5. Moskowa, 1997).

Bêgûman nêrînên ku digotin "Kremlîn peşketina pêvajoyê zehmet fêm dike" ji bo berhêlkirinê bûn. Rûsya, didît ku li Rojhilata Navîn statuko ber bi guherînê ve dire lê belê bi banekînên siyaseta derve ya ji heyamê Çar mîras mayî, nedixwest bibe parçeyekî gûherînê.

Di 2003'an de Rûsya xwe ji meşandina siyaseta aktîf a Rojilata Navîn dida paş. Mirov dikare behsa çend sedemên vê yekê bike:

Berî hertiştî hewildanên DYA yên gûhertina statukoya li Rojhilata Navîn, li dijî "berjewendiyên neteweyî" û "prensîbên ewlekariya netewî" ya Rûsya'yê bûn; ji ber xwemezindîtinê Rûsya bibû dijber. Wê ne dixwest bibe dûvikvanê DYA'yê û nedixwest bi vî awayî mezinbûna xwe li ber çavan piçûk bixwe.

Piştî Îraq'ê bi hemleya Îran'ê û bi pêkanîna projeya Rojhilata Navîn a Mezin re, wê bi destê xwe amerîkiyan bikira hevparê "sînorên xwe yên stratejîk" ên di Kafkasya re derbas dibe. Jixwe Rûsya'ya ku doktrîna ewlekariya xwe ya derve li dijî berfirehbûna NATO'yê ava kiribû, ji ber ku NATO di ser Polonya û

**Nivîskar, lêkolîner di derbarê kurdên Sovyeta kevn de.*

Bulgarîstan'ê gîhîştibû sînorên Ewrûpa'yê, li Ûkrayna û Gûrcîstan'ê ji meylên ji bo Bloqa Atlantîk'ê heta dawî aciz dibû.

Ji aliyê din ve Rûsya, ji ber rastiya "statuko gelek zehmet tê gûhertin", difikirî ku DYA li Rojhilata Navîn ketiye nav lîstikeke dijwar de û hesap dikir ku Washîngton wê di vê têkoşînê de lewaz bikeve.

Rûsya dilê xwe xweş dikir ku çawa serê wê demekê bi Afganistan'ê re di beleyê de bû, hêviyên xwe diparast ku DYA jî wê ji avzela Afganîstan'ê bi hêsanî derneketa.

Kremlîn'ê ji xwe re weke rêya herî rast dîtibû ku li dijî şerên DYA'yê bi temkîn be, di her dîtina fersendê de avê şolî bike û bi vi awayî siyaseta xwe bi rêve bibe. Di rastiyê de Rûsya, li gel vê rewşa xwe ya mayîna di kemînê de, her wiha ji bo rêyên alternatîf ji Rojhilata Navîn re bibîne jî serê xwe gelek diêşand, lê belê dema ku didît hemû rêyên zexm ji Kurdistan'ê derbas dibe, hingî di nav hesûdiya xwe ya li hemberî "xwediyê Kurdistan'ê" Amerîka'yê, digevizî. Moskowa îroniya "Rûsya di rêya kesên din de nameşe. Lê belê Rûsya di rêya xwe de jî nameşe" (nivîskarê hîcîv ê rûs Konstantîn Melîxan) dijiya.

Di sala 2003'an de bi darbeya ku Amerîka'yê li Bexda'yê xist siyaseta Rûsya ya Îraq'ê jî hilweşiyabû. Bi tevî ku di her fersendê de gotinên şablonwarî yên weke "Divê yekparebûna xaka Îraq'ê were parastin" bikartanî jî, Rûsya'yê fêm kiribû ku yekparebûna xaka vî welatî rastî erezyona siyasî hatibû.

Ji ber ku hêza wê têrê nedikir rawestîne, dixwest qet nebe, nebe parçeyekî vê lîstikê. Siyasetmedarên rûs, xeyalşkestî bibûn; di her serdana li Îraq'ê dikirin Saddam bi mîlyon dolaran xelat dida wan, lê niha deriyê van xelatan hatibû girtin, bazirganiya çekan jî êdî nema dimeşiya. Hêzên hevkar ên textê Saddam qûlipandibûn, ji zû ve rahiştibûn para şêr a pazara Kurdistan û Îraq'ê. Rejîma nû ya Îraq'ê, deynên Saddam ên li Rûsya'yê nas nedikir, peymana derbarê fîrma herî mezin a petrolê "Lukoyl" a bi dîktator re hatibû kirin, a xebitandina hevbeş a madenên petrolê yên 'Kurna Rojava-2'êdî têk çûbû. Di Îlona 2005'an de, Serokkomarê Îraq'ê Celal Talabanî, di daxûyaniya ya ajansa Rûsya 'Înterfaks"ê de, daxwazên rûsan ên weke "divê artêşa amerîkiyan ji Îraq'ê derkeve" rexne kiribû. Her wiha Talabanî digot, ji nû ve vegera 'Lukoyl'ê ya li bazara Îraq'ê û bi rejîma nû ya Îraq'ê re pêşxistina têkîliyên nû, girêdayî yekparebûna "aborî, siyaset û dîplomasiyê ye." Ev daxûyaniya Talabanî gelek watedar bû. Lewma C.Talabanî dida xûyakirin ku rêya tenê ya par-stendina ji vê bazarê destekkirina rejîma nû ya Îraq'ê û federalîzma Kurdistan'ê ye.

Derbarê xebitandina petrol û gaza Başurê Kurdistan'ê ku xwedî 45 mîlyar varîl rezerveyên petrolê ye û xwedî qanalên herî mezin ê gazê ye, 20 fîrmayên biyanî kontrat îmze kirin. Şensê fîrma rûs ku di nava van fîrmayan de cîh digirt, zêde mezin xûya nedikir.

Rûsya bi helwesta xwe siyasî ya destek-nekirina hebûna Kurdistan'ê, berovajî vê yekê bi rawestîna xwe ya li dijî vê hebûnê, ji bo bi Kurdistan'ê re peymanên berfireh ên aborî mohr bike li peşiya xwe kelem û astengiyeke pir mezin çêdikir. Kurdên ku di Bexda'yê de jî xwedî giranîbûn, niha gîhîştibûn wê hêzê ku peywateke di navbêra hikûmeta Îraq'ê û Rûsya'de çêbibe, asteng bikin.

Di rewşeke wiha de Moskowa difikirî ku li Îraq û Kurdistan'ê tenê dikare kar û barên mûtehîdiyê bike û bi tamîrkirina kargehên li Îraq'a berê avakiribû re mijûl bibe. Di nav 1200 fîrmayên biyanî yên li Kurdistan'ê bi qedr û qîmet, fîrmayên rûs, hejmara tiliyên destekî derbas nedikir. Jixwe ji sala 2003'an heta 2006'an, hikûmeta Îraq'ê tenê bi dû fîrmayên Rûsya'yê re derbarê tamîrata santralên elektrîkê peymanên piçûk çêkiribû.

Rûsya bi taybetî piştî 2005'an, her çend dixwest siyaseta xwe ya derve ya li ser Kurdistan'ê bispêre prensîbên pragmatîzmê jî, ji stereotîpên polîtîka derve ya Yekîtiya Sovyet'ê rizgar nedibû.

Pirsgirêka Rûsya'yê ew bû ku kurdan weke partnereke siyasî qebûl nedikir. Di dema Yekîtiya Sovyet'ê de siyaseta derbarê kurdan de jî, dirêjahî û berdewamiya siyaseta Tirkiye, Îran, Îraq û Sûriye'yê bû û weke faktorekî alîkar hatibu destgirtin, karekterê serbixwe yê pirsgirêka kurd ji nedîtîve dihate dîtin. Di rêxistina îstîxbaratê ya rûs de pisporên Kurdistan'ê dihatın peydekirin, lê belê di wezareta karê derve ya Yekîtiya Sovyet'ê ne jî di ya Rûsya'ya hemdem de pisporên raste rast bi pirsgirêka kurd re mijûl bibin û li pirsgirêka kurd serdar bin ti carî peyde nebûne.

Rûsya, di pêvajoyên piştî ku têkoşîna azadiya kurdan gîhîştiye asteyeke cidî, di qada navneteweyî de deng aniye û li Bakûrê Îraq'ê rastiya Kurdistan'ê domdariyek bi dest xistiye, hingî ketiye dewrê de û hewil daye li ser destkeftiyên kurdan berjewendiyan bidest bixe.

Eger em li dîroka 20 salên dawî binêrin, di kûlîsên Moskowa'yê de tenê dû carî pirsgirêka kurd bi awayekî cidî hatiye nîqaşkirin.

Di sala 1991'ê de ku hêzên hewayî yên Amerîka'yê Îraq'ê bombe dikir, li Başûrê Kurdistan'ê rêveberiyeke fîîlî ya kurdan ava dibû û di sala 1992'an de ku tevgera PKK'ê zorî dida Tirkiye'yê, Rûsya hewil daye bi kurdan re bikeve nav têkîliyê de, bi taybetî bi rêya rêxistina îstîxbaratê KGB'ê re bi PKK'ê re hewildanên hin danûstendinên bê encam meşandiye.

"Piştgiriya" yekane ya Rûsya'yê ku tim talox dida daxwazên alîkariya leşkerî ya PKK'ê ew bû ku di sala 1997'an de ji bo Parlemena Kurdistan a li Dervehî Welat, destûr dabû li Moskowa'yê civînekê li dar bixe. "Hevkariya bi PKK'ê re" ya Rûsya'yê bi armanca meşandina şerê propaganda û enformasyonê bû. Stratejiya bingehîn a Moskowa'yê bi vê "hevkariyê" re ew bû, şerê çeçen ê Amerîka di ser Tirkiye'yê re destek dikir, ew jî di ser PKK'ya bi Tirkiye'yê re şer dikir balans bike û ji bo astengkirina xeta boriyê ya Ceyhan'ê ya wê di ser Kurdistan û Kafkasan re derbas bûba, bide xûyakirin ku ew dikare "çeka PKK'ê" bikarbîne.

Qonaxa dûyemîn ku Rûsya bi pirsgirêka kurd re ji nêz ve eleqedar bûye, piştî 2003'an teqabûlî pêvajoya damezirandina Dewleta Federe ya li Başûrê Kurdistan'ê dike. Vê carê Rûsya, destek dabû dîktatoriya Îraq'ê, "dagirkeriya Amerîka" şermez kiribû, daxwazên azadiyê yên kurdan paşçav kiribû û helwesteke statukoparêz wergirtibû.

Bi gotinekê, karekterê serbixwe yê pirsgirkê kurd û têkoşîna azadiya kurdan ti carî li "berjewendiyên neteweyî" yên Rûsya'yê hev nehatiye.

Berovajî vê yekê, di demên ku kurd nêzî armancên xwe bûne, rûsan hewil daye wan li paşxîne.

Di Kanûna 2002'an de, sefîrê sefaretxaneya Îraq'ê yê Rûsya'yê di serdana xwe ya li Kurdistan'a Îraq'ê de ku bi Neçîrvan Barzanî û Behram Salîh re rûniştibû, pîlanên Amerîka yên jihevdexistina rejîma Saddam şermezar kiribû, yango kurdan bi lidarxistina komploya li dijî Îraq'ê tewanbar kiribû.

Di 2003'an de Hevserokê Parlemena Başûrê Kurdistan'ê Roj Nurî Şaveş ji bo serdanekê çûbû Moskowa'yê û li wir neçar mabû gazinc û lomeyên siyasetmedarên rûs ên derbarê siyaseta Amerîka ya Îraq'ê de guhdar bike.

Di 2003'an de avabûna dewleta federal a kurdan, bala Rûsya'yê ji ber dijberiya DYA'yê kişandibû. Rûsya pêvajo bi baldarî şopandibû, ji bo ku Kurdistan li ser pêyên xwe nesekine, tiştê ji dest hatibû giş texsîr nekiribû, ji bo bi Kurdistan'a Azad re têkîliyên siyasî û aborî pêşnexîne, heta navîna salên 2000'î li ber xwe dabû. Rûsya, piştî dît û fêm kir ku Hikûmeta Herêma Kurdistan'ê bi awayekî bê-veger bi hêz bû û kurd di siyaseta Îraq'ê de bûn faktorekî diyarker, hêdî hêdî ber bi Kurdistan'ê ve dest bi gav avêtinan kir. Di sala 2005'an de piştî ku Parlemena Kurdistan'a Yekgirtî vebû û Serokê Herema Kurdistan'ê ku bi rêyên demokratîk hate hilbijartin dest bi wezîfeya xwe kir, di qada navneteweyî de eleqeya ji bo Kurdistan'ê bi hêz bû, evana giş Rûsya neçar hiştibû ku raste rast bi Kurdistan'ê re têkîliyên siyasî deyne. Di sala 2005'an de sefîrê balyozxaneya Rûsya yê li Îraq'ê, mebestên xwe yên li Hewlêr'ê vekirina konsolosxaneyekê beyan kiribû û piştî hin rêze hevdîtinan konsolosxane di sala 2007'an de bi fermî dest bi xebatan kiribû.

Her wiha piştî sala 2005'an hin fîrmayên rûs berê xwe dabûn Kurdistan'ê, li vê dere li gel çend fîrmayên piçûk, nûnertiya kargeha boriyê ya Lipetsk'ê hatibû damezirandin, bi fîrma rûs "Horbest Limited" re di mijara li nêzî Hewlêr'ê lêgerîna gaz û petrolê de peymannameyek hatibû mohrkirin û konseya bazirganî ya Rûsya-Kurdistan'ê hatibu avakirin.

Di Gulana 2008'an de, radyoya dewletê ya Rûsya'yê "Dengê Rûsya'yê" di ser pêlên kurt derbasî weşana kurdî bibû, ji meha Cotmehê û pê ve jî ji bo bajarên Başûrê Kurdistan'ê Hewlêr, Suleymaniye, Duhok û Kerkûk'ê di ser pêlên FM'ê dest bi weşana dû saetan kiribû.

Evana hwmû ango gavên derbarê Kurdistan'ê de ku dihat payîn di çarenûsa Rojhilata Navîn de roleke girîng bilîze, ne li gorî "mezinbûna" Rûsya'yê bûne û di hewildanên hatine kirin di radeyeke gelek formalîte de wate. Gelek girîng e ku mirov analîz bike ka çima hebûna aborî ya Rûsya'yê li Kurdistan'ê ew çend lewaz e.

Ji ber ku di vê nivîsê de derfetên me tine ku em sedemên vê yekê dûr û dirêj dahûrînin, emê tenê qeneata xwe ya bingehîn diyar bikin. Li gorî baweriya me, mebesteke Rûsya'yê xûya nake ku bi Kurdistan'a "di bin kontrala DYA'yê de" têkîliyên aborî yên cidî ava bike û hewildanên heyî jî bi îhtîmaleke mezin ji bo îstîxbaratê û beralîkirina îstîxbaratê ye.

Y. Nebiyev, di nivîsara xwe ya bi sernavê "Rûsya û kurd roja îro" de destnîşaneke wiha kiribû: " li Rûsya'yê gelek kes naxwazin fêm bikin ku ew demên kurd ji hevdîtina çend sîxûrên îstîxbarata rûs" dilxweş diman, li dawiyê man. Ew nêzîkatiyên xwe yên weke "gava pêwîst bike wê ji lîstikên xwe re bikin alav, gava pêwîst neke wê weke hêzeke îhtiyadî bisekinînin" berdewam dikin. Heta gelek ji wan di nav xiyalên wiha xav de ne ku qaşo kurdan di herêmê de li dijî berjewendiyên Rojava bikarbînin."

Bi rastî jî siyasetmedarên rûs rastiya ku kurdên Başûr, dixwazin bi Rûsya'yê re têkîliyên partnerî yên ji dil, wekhev û rast pêşbixînin, gelek zehmet fêm dikin. Bi qasî tê fêmkirin, wê Rûsya hêna gelekî zehmetiyê bikşîne ku kurdan weke lîstikvanekî serbixwe yê siyaseta herêmê bibîne. Ev yek jî bêbaweriya kurdan a li hemberî Rûsya'yê zêde dike. Talabanî, di peyama xwe ya bi navgîniya rojnamevanên rûs de şandibû wiha digot: ''Nêzîkatiyên Rûsya'yê yên ne-dostanî gûmanên me zêde dike."

Nêzîkatiya Rûsya'ya hemdem a li hemberî têkoşîna demokratîk a li Bakûrê Kurdistan'ê (Tirkiye) tê meşandin, ji ya Başûr gelekî ne cûdatir e. Rûsya bi saziyên qanûnî yên li Bakûrê Kurdistan'ê re ti têkîliyên wê tine. Di salên dawî de yekane "qenciya" Rûsya'yê ya ji bo Bakûriyan ew bû ku li dijî hemû hewildanên bê dawî yên Tirkiye'yê, berovajî dewletên Ewrûpî, Rûsya PKK nexistibû nav lîsteya "rêxistinên teror" de.

Bi dawîbûna şerê sar re berjewendiyên Rûsya û Tirkiye'yê hin caran li hev gûnciwîne. Weke mînak, parlemena Komara Tirkiye'yê ku destûr neda artêşa DYA'yê di ser Tirkiye'yê re bikeve Îraq'ê de, tezkereya Adar'a 2003'an derxistibû. Naveroka vê teskereyê li gorî dilê siyaseta Rûsya'yê bû ku li dijî hilweşandina Saddam derdiket.

Di Tebax'a 2008'an de di şerê navbêra Rûsya û Gurcîstan'ê de, Tirkiye bi hêceta peymana Montro'yê destûr dabû ku pir bi sînoor keştiyên şer ên Amerîka'yê di tengavên tirk re derbas bibin, ku ev yek Rûsya'yê dilxweş kiribû. Di mijara şerê DYA'yê yê şerê Afganîstan'ê de, helwestên her dû dewletan dişibiyan hev.

Di qada aborî de Rûsya û Tirkiye di nava hevkariyeke cidî de ne. Di sala 2008'an de hecma bazirganiya derve ya di navbêra her dû dewletan de bibû 35 mîlyar dolar, ji bo pênc salên dahatûyê hat hedefkirin ku hecim bigîje 100 mîlyar dolarî. Di rewşa heyî de Tirkiye ji sedî % 68'ê pêwîstiya xwe ya gazê ji Rûsya'yê temîn dike. Her wiha di navbêra Tirkiye û fîrma "Gazprom" a Rûsya'yê de peywatek hatiye çêkirin ku xeta boriya gazê ya "Herikîna Başûr" di derya Reş a Tirk re derbas bibe. Di Tebax'a 2009'an de li Enqere'yê Putîn û Erdoğan gelek peymanên bazirganî-aborî mohr kirin. Di meha Gulan'ê ya îsal de tê payîn di gera Serokkomarê Rûsya'yê Medvedyev ya Tirkiye'yê de peymanên berfireh ên nû werin rojevê.

Bi kurtahî, teqez e ku Rûsya wê di çarçoveya têkîliyên aborî yên bi Tirkiye'yê re dimeşîne li daxwazên mafdar ên Kurdên Bakûr binêre. Ji aliyê naverokê



Ahmet Gümüştekin (Tav û Deng)

ve, ev têkilî, ti ferqa xwe ji têkîliyên bazirganî yên Yekîtiya Sovyet'ê bi Rejîma Saddam re ji 1970'an heta 2003'an meşand, tineye. Bê gûman, ji salên nostaljiya "evîna platonîk" wêdetir wateya xwe tine ku Kurd, ji ber têkîliyên wê yên ji bo berjewendiyên aborî bi Tirkiye'yê re dimeşîne, ji Rûsya'yê bixeyide.

Lê belê li gorî baweriya me fêde heye ku mirov tiştekî wiha bîne bîra rêveberên rûs: Têkoşîna kurd her çend bi gavên giran û azar bimeşe jî, divê hêza vê têkoşînê ya "hilweşandina rejîman" neyê jibîrkirin. Nêzîkatiya dijber a Rûsya'yê ya li hemberî hebûna siyasî ya Kurdistan'ê her weke ku wê windahiyeke ciddî bi kurdan nede jiyandin, wê tiştekî cidî jî bi rûsan nede qezençkirin.

Ji aliyê din ve di vê pêvajoyê de ku em dikevin dehsala dûyemîn a sedsala 21. de, em dibînin ku li Rojhilata Navîn têkîliyên "stratejîk" û qada bandorê ya Rûsya'yê bi gelemperî bi komên marjînal ên oldar û îdeolojiyên sosyalîst re û rejîmên mehkûmî hilweşînê (mînak: Îran) re bi sînor e. Rûsya, hêna bi israr siyaseta parastina statukoya li herêmê dimeşîne. Bi awayekî dîrek û îndîrekt parastin û hîmayekirina saziyên paşverû teokratîk, monarşîk (mînak: Sûriye) û antî demokratîk û rejîmên nihêrvan (mînak: Tirkiye) di warê pîvanên demokrasiya hemdem a navneteweyî û ji aliyê exlaqa siyaseta demokratîk ve ti aliyê wê yê mafdar û were parastin tine ye.

Ji aliyê din ve dîrok; nîşand dide ku li Rojhilata Navîn ên rejîmên statukoparêz ên bi navên "komar", "demokrasî" ku nîzama rêvebirinê ya serdama navîn tîne bîra mirovan diparêzin bi sernakevin, berovajî vê yekê kesên hewil didin û vîna gûherîn û vegûhezîna vê yekê nîşan didin bi ser dikevin, mezin dibin û pêş dikevin.

Pêşketinên di salên destpêkê yên sedsala 21. de tên dîtin, bi hemû aliyê xwe datîne holê ku li Rojhilata Navîn "sedsala kurdan" destpê kiriye. Kurdan, li herêmê li ser bingeha gûhertina statukoyên paşverû vîneke bi hêz nîşan dane. Bê gûman, ji bo têkoşîna demokrasiyê ya ku kurd li dijî statukoparêzan dimeşîne, alîkariya helwestên hêzên derve yên gûherînxwaz jî çêbûye.

Ji niha û pê ve li Rojhilata Navîn rêya bi bandorbûyînê ji parastina demokrasiya herêmê û azadiyan derbas dibe. Parastina rejîmên li ber hilweşandinê, her weke ku wê Rûsya'yê ji hêz û taqetê bixîne, dikare bibe sedem ku wê bi tevahî ji Rojhilata Navîn jî dûr bixîne.

Ev nivîs ji bo Le Monde diplomatiquê kurdî hatiye nivîsandin.

Wergera ji tirkî
Nurettin Akad

SIYASETA NÛ LI SER DENGEYA ATOMÎK

Cîhana bê nûkleer û Barack Obama

SELIG S. HARRISON*

Çend deh gotinên bibawer karibûn bibin sedemê ku Serok Barack Obama xwe berbi girtina Xelata Nobel'ê ya Aştiyê bike. Bi vî awayî ew bû lewendê derdorên dijî çekan û di hin aliyan de kêmaqilê derdorên fanatîkên nûkleerê. Dema ku wî soz da ku ewê peymanên di derbarê kontrolkirina çekên nûkleer bi Rusya'yê re dirêj bike û her wiha firehtir bike –ev weke peymanên ji bo kêmkirina çekên stratejîk (Strategic Arms Reduction Treaty, START) (1), hatine naskirin, ku her wiha ev peyman kapasîteya çêkirina çekan jî kêm dike, nebûn sûrprîz. (2) Lê belê ev "bawermendên rast"ii bi keder bûn dema ku Barack Obama, li Prag'ê, di 5'ê Nîsan a 2009'an de, got; "Di çarçoveya stratejiya neteweyî de em rola çe-kên nûkleer kêm dikin." Digel ku çend roj bûn ku Serok û rêveberiya wî ya nû, "pîlana pozîsyona nûkleer" (Nuclear Posture Review, NPR) dabûn destpêkirin. Dema ku wî heman daxûyanî dubare kir, bi hin gotinên nêzîk, li pêşiya Civata Neteweyên Yekgirtî, di axiftina xwe ya roja 23'yê Îlon a 2009'an de, di derbarê pirsên bingehîn de nerazîbûn hate diyarkirin.

- Ecêba doktrîna nû pêwîst dike ku Amerîka xwe ji bikaranîna çekên nûkleer "beriya hemû hêzan" şûnve bikêşîne, weke ku Çîn û Hîndîstan'ê ji mêjve kirin, her wiha weke ku rêveberiya Clînton, di çarçoveya peymana beruvajî ya sala 1994'an ku di navbera wî û Bakurê Kore'yê de pêkhat, soz dabû. (Bêguman ev peyman ji aliyê rêveberiya W. Bush ve hatibû betalkirin)

- Gelo birêz Obama wê qebûl bike ku, heta çar salan, çawa ku Berlîn'ê ji wî xwestibû, çekên nûkleer yên Amerîka'yê ku ji aliyê Saziya Peymana Bakurê Atlantîkê (NATO) ve tên kontrolkirin, ji Almanya'yê bikişîne? Gelo wê heman tiştî ji bo çekên nûkleer ku bi armanca taktîkî li Ewrûpa'yê hatine bicihkirin jî bike?

- Ya ku ji bo endûstriya parastinê zêdetir girîng e, gelo ewê hejmara roketên nûkleer, çekên bi- navê yên Trident û her wiha roketên balîstîk ên navparzemînî bisînor bike?

- Komîteya Nobel'ê ya norweçî dabû xûyakirin ku "wê girîngiyeke mezin daye vîzyon û çalakiya birêz Obama ya di derbarê cîhaneke bê çêkên nûkleer de." Lê belê, di axaftinên wî yên bi karmend û şêwirmendên wî re, yên ku ji nêz ve bi NPR'ê re eleqadar in, daye xûyakirin ku ewê, di teksta ku wê ku di 1'ê Nîsan a 2010'an de biweşe de, hemû "bawermendên rast" razî bike. Digel şerê ku di hindirê rêveberiya wî de pêş dikeve, yên di derbarê guftugoyên bi Moskova'yê re ku ji bo Peymana START'ê de dimeşin de, digel ev helwest li ser pozisyona Amerîka'yê bandorê çêdike jî, wî ev nêzîkatî raber kir. Ev rastî jî tê qebûlkirin ku ji vir bi şûnve rola çekên nûkleer di stratejiya parastina Amerîka'yê de, bi awayeke berbiçav kêm nabe.

Wê were zanîn ku, di pêvajoya şerê sar de Amerîka'yê dabû xûyakirin ku ewê wan çekan di dema êrişeke konvansiyonel de bikar bîne. Wê demê bloka Sovyetîk li ser Ewrûpa'yê de, di warê hêzên leşkerî û her wiha çekên biagir de xwediyê avantajan bû. Di heman demê de NATO'yê, bi armanca amadekariya demeke şer, hêzên xwe ji bo pêlên berxwedanvaniyê amade dikir. Heman bûyer, a di derbarê bikaranîna "çekên nûkleer" de, di derheqê Kore ya Bakur de jî hate dîtin.

Lê belê divê di vî warî de em hin gotinên Wezîrê Karê Dervê yê Almanya'yê, yê dema borî Joschka Fischer bigirin dest; "Ti yekîneyeke biçekê qeyîm tine ku di nava 24 saetan de bikevin nava sînorên me. Siyaseta di derbarê bikaranîna yekemîn a çekên nûkleer weke bersiveke rewşa ku bi awayeke bingehîn hate guhertin bû (3)" Hêza qayîm ya Kore ya Bakur êdî nikare li ser hêzên çekdarî yên Kore ya Başûr, ku bi alîkariya Amerîka'yê hatine lipêşxistin de biçe.

Pêşniyarên di derbarê devjêberdana "bikaranîna destpêkê" ya çekên nûkleer tim weke xewnên kesên dilpaqij ku ji zehmetiyên rastiya siyaseta navneteweyî tiştekê fêm nakin tê dîtin. Lê belê dema ku mirov prensîban berewajî bigire dest ev dîsa zêde rast nayê dîtin. Birêz Fischer vê jî dide xûyakirin ku; "Heke em nêzîkatiya hêzên mezin, ên di derbarê kêmkirina çekên nûkleer de, ciddî bigirin wê demê divê heman hêz atmosfereke wisa çêbikin ku êşên welatên din, ên ku dixwazin bibin xwediyê heman çekan, kêm bikin" Xala 6'an ya peymana di derbarê kêmkirina çekên nûkleer de (TNP), ku di sala 1968'an de hatiye îmzekirin, her wiha kêmkirina pîşesaziya heyî jî pêwîst dike. (Bi taybetî yên welatên endamê Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekgirtî). Heman xal nahêle hêzên din, ên ku çekên wan ên nûkleer tinene, ji xwe re heman çekan çêbikin. Lê belê bêdiliya hêzên mezin ku naxwazin çekên xwe yên nûkleer kêm bikin û tirsa "bikaranîna destpêkê" ya heman çekan dikare nehêle ku Amerîka bi heman peymanê ve girêdayî bimîne.

Mînak, Pentagon wiha dide xûyakirin ku "divê ku çekên nûkleer bikaribin bibin bersiva xetera komkujiyan li Amerîka'yêii", her wiha ew çekên kîmyawî, yên biyolojîk û nûkleer di nava "yek mijarê" de dipejirîne. Qesra Spî dixwaze formûlekê wisa bibîne ku ew bikaribe pêşniyarekê di derbarê kêmkirina rola çekên nûkleer de, çawa ku li Prag'ê hatibû zelalkirin, pêşbixe. Di vê navberê de ew ji bo bikaranîna hêzeke dorfireh jî derî vekirî dihêle. Hinekan jî pêşniyar kirine ku bêjin niyeta wan, ya Amerîka, ew e ku, heke hin hêzekî li dijî Amerîka'yê an jî hevalbendên wê van çekan bikar bînin wê demê mafê wan ê tolhildanê çêdibe. Wateya gotina "tolhildan"ê ew e ku di van şertan de bikaranîna çekên nûkleer tê bisînorkirin.

Di vê derbarê de pir xalên hevpar hatine pêşniyarkirin: Mafê bikaranîna çekên nûkleer li dijî êrişên konvansiyonel an jî kîmyawî ku ji aliyê welatekî wek Kore ya Bakur, Peymana TNP'ê binpêdike; guhertina gotina "pêkanîna bersivan" şûna gotina "bersivdayînê", ev jî tê wateya ku, heke hin amadekarî ji aliyê hin hêzan ve werin dîtin, wê demê êriş dikarin li dijî dijmin çêbibin.

Piştî axiftina ku li Prag'ê pêkhat, delegasyonekê bibandor ya Wezareta Parastinê ya Japonya'yê dest pê kir ku li ser Kongre'yê de û her wiha li ser tevahiya rêveberiya amerîkî zextê bike. Heman delegasyonê diyar kir ku, heke Amerîka "bikaranîna destpêkê" daxilê naveroka peymanê neke û Çîn û Kore ya Bakur tehdît bike, her wiha hemû hêzên wê ku ji aliyê Japonya'yê ve weke hêzên nûkleer tên dîtin qebûl neke, wê demê Tokyo çekên xwe yên nûkleer lipêşdixe.

Heman delegasyonê xwest ku karê ji bo bicihkirina fûzeyên Tomahawk'ê, yên nûkleer werin berdewamkirin. Halbukî ev kar wê di 2013'an de werin sekinandin: Wisa tê zanîn ku hêza Amerîka ya deryayî xwediyê kapasîteyeke baş a ji bo fûzeyên Trident ku bi armanca parastina Japonya'yê li wê derê hatine bicihkirin e. Ji heman hêza amerîkî 8 keştiyên deryayî herdem Pasîfîka Bakur di bin kontrolê de digirin, ji wan heft heb tim di alerma sor de ne, di dema xeterê de ew dikarin di nava 12 deqeyan de bersiv bidin.

Qasî "bawermendên rast" ên li Pentagon'ê bazên (alîgirên şer) Tokyo'yê jî dixwazin atmosfera nûkleer li ser hemû konsepta "îqnakirina fireh" bibandor be. Ji ber ku bi vê hêza Amerîka dikarin li dijî hemû xeteran, ên weke nûkleer, kîmyawî, biyolojîk an jî konvansiyonel, bibin xwediyê bersivê. Ev doktrîn hebûna xeteke çetin, a li dijî Çîn'ê û Kore ya Bakur diyar dike. Heman xet ji aliyê Partiya Lîberal Demokratan (PLD), ku van pêncî salên dawî Japonya'yê birêve bir ve tê parastin.

Atmosfera siyasî ya meha Tebax a 2009'an rewşê berbi çêkirinê ve dibe. Partiya Demokrat (PD) zêdetir vîziyona birêz Obama ku li Prag'ê hatiye ziman dipejirîne. Wezîrê Karê Derve Katsuya Okada pir caran li dijî vê nêrîna xwe diyar kiriye. Di civîneke kabîneya hikûmetê, di 16'ê Îlon a 2009'an de, wiha gotibû: "Gelo ew welatên ku behsa di destpêkê de bikaranîna çekên nûkleer dikin mafê wan heye di derbarê kêmkirina heman çekan de biaxifin?" Dîsa, roja 16'ê Cotmehê, di dema hevdîtinekê bi Sekreterê Amerîka yê Ewlekariyê Robert Gates de birêz Okada xwest heman mijarê biaxife lê belê birêz Gates nexwest li ser heman mijarê bisekine. Piştî hevdîtinê, di civîna çapemeniyê de birêz Gates balê kişand ser pêwîstiya bi "nêzîkatiyeke nerm a ji bo îqnakirinê." Di heman rojê de, li Tokyo'yê birêz Okada balê kişand ser nakokiyên borî yên siyaseta welatê xwe: "Heta niha hikûmata Japonya ji amerîkiyan re gotiye 'em naxwezin ku hûn mijara bikaranîna destpêkê li derve bihêlin', ji ber ku ev dikare hêza îqnakirina nûkleer qels bike." Di derbarê bangên li dijî çekên nûkleer de û her wiha ya di derbarê "bikaranîna destpêkê" de Japonya tim xwediyê yek nêzîkatiyê nebûye." Bi armanca bersivdayîna rexneyan de, birêz Okada dida xûyakirin ku; "Heke Washington dev ji 'bikaranîna destpêkê' ber bide ev nayê wateya ku Japonya wê li derveyê hêza nûkleer bimîne. Dema ku li Japonya'yê tiştekê neyênî biqewime, an jî ew bi êrişekê nûkleer ve rûbirû bimîne em bê bersiv namînin"

Birêz Okada her wiha balê kişand ser helwesta bazên li Tokyo û yên li Washington'ê jî, bi taybetî di derbarê gefa ku li dijî Kore ya Bakur heye: "Çekên konvansiyonel dikarin bibin bersiv", her wiha "herêmeke bêçekên nûkleer li Bakurê Rojavayê Asya'yê tê xwestin." Serokwezîr Yukio Hatoyama ji birêz Okada pirtir bidîqet nêzîkê mijarê bû. Em bawer nakin ku Wezîrê Karê Derve nêrînên birêz Ichiro Ozawa, yek ji rêveberên partiya wî ye ku weke alîgirê şer tê naskirin, parve kiribe. Ev cudahî jî weke parçeyekê nêrîna civakê ye. Hejmareke mezin ya bazên japonî dixwazin bi rêveberiya Obama re bikevin nava nakokiyan. Ji bo ku Japonya bibe xwedî hêzeke nûkleer a serbixwe ew dixwazin destê xwe biquwetir bikin.

Piraniya alîgirên şer ên li Washington'ê ne birêz Okada û ne jî birêz Guido Westerwelle, Wezîrê Karê Derve yê Almanya'yê, ku çend caran xwestiye ku Amerîka hêzên xwe yên taktîk yên nûkleerî ji xaka welatê wî şûnve bikişîne, nagirin dîqetê. Ev derdor van herdû kesayetiyan weke wêneyên polîtîk ku di demeke kurt de ji qada siyasî biçin dibînin. Di heman demê de Serokê Konseya Tanzîmkirina Siyasî ya Beşê Dewletê ku di nava rêveberiya birêz William Clinton de cih digire, birêz H. Halperin ji me re diyar kiribû ku yek ji xebatkarekê payebilind yê wezareta wî van daxûyaniyan paqij kiriye: "Ev ne hikûmeta rast ya Almanya'yê ye." Nêzîkatiyeke wiha di derbarê rêveberên nû yên japon de jî heye.

Li gorî birêz Hans Kristensen, ji Federasyona Zanyarên Nûkleer ên amerîkî, Dewletên Yekgirtî yên Amerîka ji 10 heta 20 roketên nûkleer ên B-61, ku xwediyê kapasîteyeke avêtina dirêj in, di wargeha leşkerî ya Buchel'ê de, ku li Rojavayê Almanya'yê ye diparêze. Li gorî heman kesî, Amerîka xwediyê 150-200 fuzeyên nûkleer ku li Almanya'yê, li Belçîka'yê, li Îtalya'yê, li

* *Berpirsê Programa Asie au Center for International Policy, Washington.*

Ahmet Gümüştekin (Çavê şahîn)

Hollanda'yê û li Tirkiye'yê hatine bicihkirin e. Ji ber van sedeman e ku NPR destûr nade Amerîka hêzên xwe şûnve bikişîne: Ji ber hebûna gefên Îran'ê, ya êrişeke nûkleer, Tirkiye dixwaze hebûna hêzên amerîkî biparêze. Pentagon jî heman tiştê dixwaze, ji ber ku di sala pêşî de NATO wê stratejiya xwe di ber çavan re derbas bike, heke vekişandinekê pêkwere ew dibe tişteke pêştwext.

Argûmateke din ku tê bikaranîn jî ev e; Peymana START'ê ku wê di pêşerojê de bê qebûlkirin tenê bi fabrîqeyên çekan ên stratejîk ve girêdayî ye. Ev jî avantajeke taktîkî ji Rûsya'yê re dihêle, ji ber ku tê gotin, ku ji 500 heta 1200 çekên nûkleer yên Amerîka'yê ku li Ewrûpa'yê hatine bicihkirin, halbukî hejmara yên Rûsya'yê ku hatine bicihkirin derdora 2000'an e, 6000 jî di rezerwa Moskova'yê de hene. Ev çekan xwediyê roketên ku dikarin ji 450 heta 600 kîlometre bavêjin in.

Hewldanên rêveberiya Obama, di çarçoveya Peymana START'ê de, yên di derbarê kêmkirina hejmara serê roketên nûkleer ên stratejîk de – ji 2200 heta 1500'an jî 1675 hebanderdorên li dijî çekan xemgîn kir. Di rastiyê de, Rûsya'yê sînyal da ku ew amade ye ku hejmara van çekên xwe daxîne heta 1000'î, bi armanca ku di bûdçeya xwe ya ji bo parastinê de kêmkirinê çêbike. Her wiha di vî derbarî de lihevhatinekê, ya li Washington'ê heye û ev vê yekê weke asteke baş ji bo parastinê dipejirîne. Di heman demê de John Deutch, yê ku di nava rêveberiya Clinton de NPR'ê birêvedibir, vê armancê parastibû.

Niha, di çavên zanyaran de, metoda ji nûh ve hatina kapasîteya çekên nûkleer (Roketavêjên stratejîk, roketên ser erd û yên deryayî) dikarin pirsgirêka serê roketên nûkleer derxîne holê. Tekoşîneke balkêş hate meşandin ku vê yekê derxîne holê ka pêwîst e hejmara roketavêjan, bi taybetî yên ku ji bo roketên balîstîk ên navparzemînî û her wiha yên ji bo roketên binavê tên bikaranîn, kêm bikin an na? Ev tevlihevî bûye sedemê ku NPR neyê zelalkirin.

Bi awayeke matmayî, Air Force Association, ku berjewendiyên hêzên hewayî diparêze, xwestiye ku 114 bombeavêjên nûkleer B-52 û B-2, ev bombeavêj di servîsê de ne, bi armanca xurtkirina roketên balîstîk ên navparzemînî û binav, werin tinekirin. Di rastiyê de, ev roket êdî nikarin ji êrişeke nûkleer re bibin bersiv. Ev daxwaz êdî nikare were qebûlkirin, ji ber ku hejmara roketên balîstîk ên navparzemînî –vê demê 450 heb in- di çarçoveya Peymana START'ê de wê kêmtir bibe. Tenê wê 13 keştiyên nûkleer ên binavê, ku li ser her yekê 24 heb roketên Trident hene, wê werin parastin.

Endamên Kongre'yê, yên alîgirên "bawermendên rast" ku li Pentagon'ê ne, ji vê kêmkirina ku hatiye pîlansazkirin nerazî ne. Van endaman li rêveberiyê gefan xwarine ku, heke di derbarê projeya qanûnê ku weke "modernizasyona" çekên nûkleer ên Amerîkî hatiye pêşwazîkirin daxwaza wan neyê qebûlkirin, ewên di derbarê Peymana START'ê de astengiyan çêbikin. Rêveberiya Bush, bi awayeke bêencam, xwest programa ku bi navê "roketên qayîm", ku armanca wê xurtkirina hêza çêkirina keştiyên şer ên Dewletên Yekgirtî bû. Niha birêz Obama tenê dixwaze çekên heyî (Stockpile Stewardship and Management Program) nû bike. Lê belê 40 senatorên komarger, her wiha senatorê serbixwe Joseph Lieberman, roja 17'ê Kanûn a 2009'an jêre nameyekê şandin: "Em bawer nakin ku programa nû ya START'ê, ya di derbarê kêmkirina çekan de, bêyî programeke biwate ya ji bo modernizasyona hêzên me yên nûkleer, ji bo berjewendiyên ewlekariya neteweyî yên Dewletên Yekgirtî bi feyde be" Van senatoran bi taybetî daxwaz kirin ku bi awayeke lezgîn roketên nûkleer ên B-61 û W-76 werin nûkirin.

Komeleya Payebilind a Kontrolkirina Çekan da xûyakirin ku Strategic Command (Stratcom), organa kontrolkirina leşkerî ya çekên nûkleer û rêveberiya neteweyî ya parastina nûkleer (NNSA), "ji bo xurtkirina kapasîteya hêza çekdarî çêkirina roketên nû pêwîst e" Sala par, li gorî agahiyeke ku ji NNSA derket, diyar bûye ku pîlanekê di derbarê pêşxistina kapasîteya çêkirina Plutonium heye û ev di wargehên Los Alamos (Nouveau-Mexique), Oak Ridge (Tennessee) û Kansas City (Missouri)'yê de têne meşandin. NNSA hewldide ku, bi alîkariya Kongre'yê, ji xwe re alîkariyê bidest bixe ku vê programê bimeşîne. Li gorî wê, heke ev program bimeşe ewê destûrê bide Dewletên Yekgirtî ku kapasîteya xwe ya salane ji bîstan 20 derxe heta 80 yekîneyan.

Heta niha pîlana NNSA ji Kongre'yê re nehatiye pêşwazîkirin, lê belê tenê hebûna wê diyar dike ku, heke birêz Obama bixweze vîzyona xwe ya di derbarê bêçekkirina nûkleer de zelal bike, ewê bi hin nêzîkatiyan re zehmetiyan bijî. Wisa diyar e ku Serok hebûna dijminên xwe, di derbarê pîşesaziya leşkerî de, piçûk dîtiye, çawa ku wî heman tiştî di derbarê pîşesaziya dermansîgorteyên nexweşiyê û her wiha bankeyan de jiyan kir. Tenê wî birêz Gates, weke Sekreterê Ewlekariyâ Dewletê, di wezîfeyê de negirt, her wiha wî ti sivîlekî jî neşand Pentagon'ê, bi armanca ku ew bikaribe tezên xwe di cihên girîng de bide parastin, wî NPR'ê bi tevahî ji alîgirên şer re hîşt. Her wiha wî dîrektorê NNSA'yê jî, ê ku ji aliyê rêveberiya Bush ve hatibû destnîşankirin, bi tevî hemû personelên berpirsyar ku di nava pîlana xurtkirina kapasîteya plutonium de cih digirin, di cih de hîşt. Li Qesra Spî, kesê ku zêdetir ji bo kêmkirina çekên nûkleer hewldida Şêwirmend Ivo Daalder bû, cihê wî jî hate guhertin û ew ji bo karekê siviktir çû navenda NATO'yê. Ev jî dibe sedemê ku hemû rê ji endamên Saziya Ewlekariya Neteweyî, yên alîgirên Pentagon'ê re vekirî bimînin.

Dema ku birêz Obama destpêkir bibêje "divê em di demeke dirêj de li ser pêwîstiya bi kêmkirina çekên nûkleer bisekinin" wî şer winda kir. Di vir de yên ku destê wan hatin xurtkirin generalên berbiçav ên weke Kevin Chilton, ku fermandarê Stratcom'ê ye, bûn. Roja 11'ê Mijdar a 2009'an vî generalî diyar kir ku, heta çil salên din jî Dewletên Yekgirtî pêdivî bi çekên nûkleer dibîne. Roja 15'ê Kanûn a 2009'an, li Ohama (Nebraska), di dema konferansekê li ser agahiyên nûkleerî de, ku bi alîkariya aborî ya Stratcom'ê hatibû tenzîmkirin, heman generalî bi van gotinan nêrînên xwe xurttir kir û wiha got: "Heta ku Dewletên Yekgirtî hebe pêwîstiya me bi çekên nûkleer heye." Di heman konferansê de 5 zanyarên leşkerî û her wiha yên programa kontrolkirina çekan jî amade bûn.

Wergera ji fransî
Ahmet Dere

---

(1) Peymanên START 1, piştre jî START 2 di destpêka salên 1990'î de hatine îmzekirin. Heman peyman, bi alîkariyê, kêmkirinekê sanayiya çekan ya herdû hêzên-sûper pêwîst didît.

(2) Olivier Zajec bixwîn, "Di navbera Washington û Moskowa'yê de lîstika kişikê", Le Monde Diplomatique Nîsan 2008.

(3) Süddeutsche Zeitung, Munîh, 27 Mijdar, 1998.

AFRÎKA

Rexne li alîkariya navneteweyî?

ILKA VARI LAVOISIER

Ahmet Gümüştekin (Baxçeyê xeyalan)

Alîkariya navneteweyî "cotkariya bingehî xerab kir, sîstema parastina civakî hate xetimandin, bi awayeke indîrekt bû sebebê mirin û nexweşiyên ku dikaribûn neqewimîna (1)." Navenda Ewrûpa-Welatên Sêyemîn (Cetim) di bin dokûmanan de hatiye pelçiqandin. Alîkariya ku ji bo welatên feqîr tê dayîn pir kêm e, ew qasê derfetên ku ji bo qebûlkirina penaberan, ji bo pêşxistina fransî li derve û ji bo bûrsên ku ji bo xwendevanan tên dayîn tine. Çawa ku "hacetên ji bo dîplomasiya stratejîk a alîkariyê " tên zelalkirin, cihên ku ev alîkarî tên şandin wisa nîn in, heman alîkarî di navbera welatên "dewlemendên niftê û di bin dagirkeriyê de ne, ên ku rewşa wan li gorî her du awayan nîn e" de, bi awayeke ecêb tê tengav kirin. Di sala 2008'an de her sê welatên ku zêdetir alîkariya navneteweyî girtin ev bûn ; Îraq, Nîjerya û Afganîstan… Saziya Cetîm'ê derxistiye holê ku, ji bo tevlêbûneke baş li "Stratejiya ewlekariya şertên tovkirina alîkariyê (…) ji aliyê aktorên heman karî (…) ên bihêz" were kirin, hedefên Neteweyên Yekgirtî xwe li ser esasê rewşên semptomên (kiryara ji bo çareserkirina nexweşiyekê) tên zelalkirin, ew li gorî feqîriyê zelal nabin.

Di vê demê de, digel ku li gorî rastiyê Başûr tim Bakur fînanse dike (2), kollektîfa cenevreyî tenê "alîkariyekê girseyî ya ji bo pêşvebirinê" didomîne. Rêbazên çareseriyê yên zehmet ji Swîsre'yê nayên, ew ji Afrîka'yê tên anîn. Ew bi navê –bi awayeke heqaretwarî- "Alîkariya ne pêwîst û çareseriyên nû ji bo Afrîka'yê" hatine naskirin. Berhema aborînasê zambiyayî Dambissa Moyo (3) bang dike ku ev alîkariya navneteweyî were sekinandin. Lê belê, di derbarê siyasetên hevkariyê de, ew pêşniyaz dike ku, ji bo deynê heman welatan, formûlên sûrprîz ji aliyê Bankeya Cîhanê ve werin dîtin. Li vê derê zêdetir dia ji sektora taybetî û ji azadiya "dostên me yên çînî" re tên kirin, amîn…

Weşanên Pambazuka (4) diyar dike ku, miqabilê rewşa heyî, ew bibiryar in ku berhemên ji bo çareseriyên bi feyde biweşînin. Aid to Africa: Redeemer or Coloniser? çardeh (14) nêrînên rewşenbîrên ku di derbarê alîkariya navneteweyî de, bi mînakên bêhempa mêjiyên xwe hêşandine aniye ba hev. Bi analîzkirina berheman tê dîtin ku kirîza aborî di rewşa heyî de wê neyê çareserkirin, lewre ew bangê li Neteweyên Afrîka'yê dikin ku xwe ji vê "dirêjkirina dema dagirkeriyê" muhafaza bikin (dê wiha were fêmkirin: şertên bi deynan ve girêdayî hatiye diyarkirin "li gorî dilê wan e". Tê diyarkirin ku welatên rojavayî di pêşketina rewşa aborî ya Afrîka'yê de ti berjewendiyên xwe nabînin, ew dixwazin ku sîstemekê herêmî were xurtkirin. Di nava wan rewşenbîran de Samir Amin hin pêşniyarên ku ligel Pambazuka hatine ziman digire dest û wan ji bo wergera fransizî, ku ji Yash Tandon hatiye nivîsandin, bikar tîne.

Bi daxwaza dawîanîna li girêdana bi alîkariyê ev rewşenbîrê ugandayî balê dikêşîne ser siyaseta girêdana "konseptî" ya hêzên ku alîkar (5). Bi awayeke taybetî ew konseptên pêşxistina encamên kin, bi hin aliyan ve tîne ziman. Bi rêbazeke fêrbûyînê, ew pêşniyar dike ku, li gorî encamên aborî yên di navbera neteweyan de, sîstemeke bacdayinê were çêkirin. Ev gotin dabeşandina encamên dizî yên "alîkariya îdeolojîk" dide xûyan: Ev rastî rewatiya hin dewletên ku dixwazin bala xwe bikêşînin ser pêdiviyên bi hêzên ku ji wan re alîkariyê dikin û xwe ji berpirsyariyên xwe dûr dixin dike xeteriyê.

Ji bo pêşxistinekê "xwe naskirinê" ya demokratîk, wê em rihê Bandung şah bikin. Destekkirina beşê cotkariyê û pêşxistina bazara hindirîn. Di cihê ku tim xwe li gorî alîkariya hêzên derve tenzîm bikin û pêdiviyên xwe bînin cih, divê wendabûna fonên dewletê were sekinandin… Di vî warî de gelek pêşniyarên konkret dikarin werin kirin. Gelek pêşniyaziyên din jî dikarin werin ziman û ev dikarin weke; "şereke din ê azadiyê" were dîtin. Ji ber ku Tandon di zanistiya "pêşxistineke baş a neolîberal di cewherê xwe de zehmetiyan jî diparêze" de ye, her wiha ew jibîr tîne ku; "ya yekem ku di nava wan de ye ketiye nava rihan."

Wergera ji fransî
Ahmet Dere

---

(1) Julie Chatel û Florian Rochat, Bibandor, bêteref, bêalî? Nêrîna rexnedar a Bakur di derbarê hevkariya ewrûpî de, (Efficace, neutre, désintéressé? Points de vue critiques du Nord sur la coopération européenne) CETIM, Genève, 2009, 192 rûpel, 6 euros.

(2) Di sala 2007'an de, welatên di rêya pêşketinê de nozdeh (19) milyar dolar deynê xwe dan (li gorî pîvana deynê xwe), ev mîqdar ji alîkariya ku wan girtibû pirtir bû.

(3) Dambissa Moyo, L'Aide fatale, Jean-Claude Lattès, Paris, 2009, 252 rûpel, 20 euros.

(4) Hakima Abbas, Yves Niyiragira, Aid to Africa: Redeemer or Coloniser?, Pambazuka Press, Cape Town, Dakar, Nairobi, Oxford, 2009, 204 rûpel, 13 euros.

(5) Yash Tandon, En finir avec la dépendance à l'aide, CETIM, Genève, 2009, 220 rûpel, 8 euros.

ŞERRÊN BÊDAWÎ YÊN ÎSRAÎL'Ê

Mantiqa hêza ku bêfikara stratejîk e

JEAN-PAUL CHAGNOLLAUD*

Hemû pevçûnên di navbera welatên ereb û Îsraîl'ê de (1948, 1956, 1967, 1973) derketine, -berî peymana aştiyê ya dîrokî ku di navbera Tel Avîv û Kahîre'yê de, di sala 1979'an de, hatiye îmzekirin- weke şerên klasîk bûn: Şerwanên di nava pevçûnan de îtiraz li çekên konvansiyonel dikirin, weke ku wan îtiraza stratejiyên konvansiyonel dikirin. Balefirokiya ku ji aliyê tankan ve dihat komandekirin jî wê demê roleke girîng dilîst. Sedemê hebûna Îsraîl'ê tim li paşiya pevçûnên wê maye, digel ku rastiya gefan pir hatibûn mezinkirin, tenê paşeroja pevçûna 1948'an nediyariya xwe hê diparêze.

Şandina hêzên leşkerî ya Suweyş'ê di sala 1956'an de bû sedemê ku di nava Fransa, Brîtanya û Îsraîl'ê de koalîsyonekê çêbibe û ew bibe sedemê têkçûna rejîma Serok Cemal Abdulnasir. Heman têkçûn pêşî li xetera li dijî dewleta Îsraîl'ê girt. Şerê 1967'an, piştî çend hefteyên ku tansiyona bi Kahîre'yê û Şam'ê re çêbû, ji aliyê Tel Avîv'ê ve hat destpêkirin. Di wê şerî de, di derbarê serkeftineke mezin a leşkerî de, ne hikûmet û ne jî fermandariya leşkerî ya Îsraîl'ê ti car neketin nava dudiliyê.

Di sala 1973'an de, piştî amadekariyên pir bidîqet, Misir û Sûriye'yê, ji sala 1948'an bi şûn ve, ji bo cara yekem înîsyatîfa bikaranîna hêzên leşkerî yên ereban girtin û ji du eniyan ve êrişê ser Îsraîl'ê kirin. Her du eniyên ku lê êriş hatin kirin cihên qels yên Îsraîl'ê ku bi minasebeta Cejna Kippur'ê û her wiha hilbijartinên giştî ku ji bo 31'ê Cotmehê dihatin amadekirin hatibûn berdan bûn. Di heman qelsiyê de rola sistiya saziya îstîxbaratê jî hebû (1).

Encama ku derkete holê herkesî matmayî hîşti. Digel vê rewşê, hebûna dewleta Îsraîl'ê ti car nehate tehdîtkirin. Kahîre û Şam'ê tenê dixwestin xaka ki di sala 1967'an de hatî dagirkirin şûnve bistînin. Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê dixwest berjewendiyên jiyanê yên hevalbendên xwe biparêze.

Ji sala 1973'an vir ve Îsraîl'ê ti pevçûnekê dîrekt bi dewleteke ereb re nejî (2): Tenê yek dewletekê jî nikaribû pevçûnekê leşkerî dest pê bike, digel stratejiya ku ji aliyê roketavêjên balîstîk ve hatibû serobinkirin ev rastî hebû. Ji wê demê bi şûnve xwezaya şer hate guhertin. Ji wê demê bi şûnve Îsraîl xwediyê artêşeke bihêz ya "li gorî pêdiviyên xwe" (tank û teyare) ku li dijî gerîlayan ditekoşe ye. Digel hemû tiştî, ev guhertina bingehîn bi bêdengiyekê pêkhat û Îsraîl wisa dilebite wekî ku pêşeroja wê di nava lîstikê de ye.

Di nava vê rewşa guherînekê bingehîn de, sala 1982 bû destpêka dîrokeke guhertinê. Bi rastî jî di bahara wê salê de leşkerê dawî yê Îsraîl'ê, li gorî peymana aştiyê ku di sala 1979'an de di navbera Kahîre û Tel Avîv'ê de hat îmzekirin, ji Sîna'yê vekişiya. Di heman demê de artêşa wê, bi armanca ku Rêxistina Azadiya Filistîn'ê (OLP) bipelçiqîne, hewldida ku bikeve xaka Lubnan'ê. Serokwezîr Menahem Begin (3), ku ji aliyê Wezîrê Parastinê Ariel Sharon ve dihate destekirin, stratejiyeke zelal dabû pêş xwe. Aştiyeke bi welatê ereb yê herî bihêztir dikaribû jêre bibe sedemê ku ew li ber çavên cîhanê bibe xwediyê kesayetiyeke aştixwaz (di sala 1978'an de bû xwediyê Xelata Nobel'ê) û bikaribe ewlekariya welat, bi awayeke demdirêj û hemû hêza xwe bide ji bo kontrolkirina xaka Filistîn'ê (Jérusalem, la Cisjordanie û Gaze) ku bikaribe li wê derê pîlanekê dorfireh ya ji nûh ve bicihkirina îsraîliyan pêk bîne.

Digel qiyasên ku di navbera Yasser Arafat û Adolf Hitler de hatin kirin, di navbera Beyrûd û Berlin a Nazî de, û her wiha ji nûh ve aktîfkirina retorîka "Holocausta nû", vê operasyona ku li dijî OLP û hevalbendên wê pêkhatî, derî li pêvajoyeke pevçûnên asîmetrîk vekir. Di wê pêvajoyê de Îsraîl bi tekoşîna hêzên gêrîlla ve rûbirû ma. Di derbarê wan şeran de, di pirtûkeke ji yên herî baş ku ji aliyê du pisporên artêşa Îsraîl ve, Ze'ev Schiff û Ehud Ya'ari, hatiye nivîsandin de wiha tê gotin: "Şerê dagirkirina Lûbnan'ê yê sala 1982'an ji aliyê keseke (Sharon) tenê bi xwe bawer û bêdîqet hat destpêkirin. Ev dagirkirina Lûbnan'ê, ku li ser bingeheke xeyalî û derewan hat destpêkirin, dikaribû encameke pir xerab biafiranda (….) Ti armancek wî şerê biha û bextreş tinebû. Tiştê herî baş ku mirov dikare bike ev e; ji wî şerî derseke baş derxîne(4)." Mixabin, ti rayedareke îsraîlî vê yekê nake. Miqabilê wê rastiyê, hemû mantiq li ser hêza ku ji hemû fikirandina stratejiya demdirêj dûr hatiye lipêşxistin. Di Cotmeh a 2008'an de me ji fermandarê leşkerî yê Bakurê Îsraîl'ê General Gadi Eisenkott, di derbarê bombebaranên 2006'an ku li dijî navendên siyasî û çandî yên Hîzbûllah'ê pêkhatî de wiha bihîst. "Heke êrişê Îsraîl'ê bê kirin wê li her deverê ku li me gule tên reşandin, tişta ku li Beyrûd'ê pêkhatî biqewime. Emê hêzeke şedîd bikarbînin (5)."

Di nava 30 salên dawîn de, ji aliyê hemû hikûmetan ve biryarên zextên leşkerî yên nû hatine girtin; Pelçiqandina Serhildana (Întîfada) 1987-1988; Operasyona "Tiriyên Xezebê" ku di sala 1996'an de li dijî Başûrê Lûbnan'ê û Hîzbûllah'ê pêkhatî; Operasyona "Dîwar" a ku di sala 2002'an de, di dema Întîfada'yê de hate meşandin; Êrişên li dijî Hamas'ê, yên li Gaze'yê ku di meha Hezîran a 2006'an û di meha Mijdar a 2007'an de pêkhatî, piştre jî ya di meha Kanûn a 2008'an de pêkhatî û ya ku bi navê "Hesinê Hişk" tê naskirin.

Çawa em dikarin dijminê ku bi van êrişan ve rûbirû ye deryayî bikin? Ji bo leşkerên îsraîlî tenê du kategoriyên dijmin heye; Leşker û terorîst. Weke ku ti artêşeke nîzamî bi wan re di nava şer de nîn e, tenê terorîst ji bo wan dijmin in; Ji ber ku hemû kalîteyên berxwedanê nayên naskirin, ev rewş maf dide wân ku ew vî şerî, her wiha doza ku ew diparêzin, di nava bêdadiyê de weke ku ew adîl nêzîk dibin, bimeşînin.

Ev daxwaza ku tim tê ziman, her wiha bi tevahî siyasî ye, ji wan re dibe sedemê ku ew doza xwe mafdar û biqîmet, xetera ku di rastiyê de nîne jî weke "gefên heyî" bibînin. Ev rastiyekê ye ku ti hêz dijminê xwe weke berxwedanvan nasnake, heman rastî li Cezayîr'ê, di dema dagirkeriya Fransa'yê de, her wiha li Başûrê Afrîka'yê di dema rejîma Apartheid'ê de jî hebû. Dijmin tim 'terorîst' bû ye.

Binavkirina yê din weke 'terorîst' rêbazên lîstikê jî diguhere. Dema ku pêwîstî bi lêdana vî dijminî hebe wê demê hemû rêbaz sarbest in, ji ber ku ti qanûn li vir derbas nabe. Her wiha, Îsraîl dijminên xwe ji qada siyasî jî dike der û wan bi kuştinê re rûbirû dihêle.

Qet xema kesî nîne ku heke di vî şerî de sivîl têne kuştin, ji ber ku qeneet heye ku "terorîst xwe di nav sivîlan de vedişêrin", qet xema kesî tine ku heke hêzeke xedar tê bikaranîn, bikaranîna sîlehên şer ên qayîm û balafiran, ji ber ku wisa bawerî heye ku 'terorîst' ti tiştê nagirin dîqetê, dîsa qet xema kesî nîne heke mafên mirovan hatine binpêkirin…

'Tinekirina terorîstan' bikaranîna hemû derfetan mafdar dike. Dijmin tim xetereke zindî ye, ji bo ku ev xeter ji holê rabe bikaranîna hemû derfetan dikare weke mafeke xwezayî were dîtin. Di Çile yê 2008'an de berdevkekî artêşa Îsraîl'ê, di axiftineke xwe de, ya di derbarê êrişên li ser Gaze'yê çêbûn de, wiha digot: "Emê biçin hemû hêlînên terorîstan paqij bikin." Çend rojan piştre, berdevkekî hikûmeta Îsraîl'ê di derbarê hejmara kuştiyan de wiha digot: "Erê… Lê belê ew terorîst in"

Bi bahaneya vê mantiqî, Îsraîl tim, bi awayeke sîstematîk, rayedar, qadro û her wiha mîlîtanên normal yên van rêxistinan kuştiye. Cezayê îdamê li Îsraîl tine, lê belê siyaseta qetilkirina hedefan ji dehan salan vir ve heye û tê bikaranîn. Dema ku Arafat li wargeha xwe ya li Beyrûd'ê bû, di sala 1982'an de, wî pir êrişên kuştinê ku li dijî wî hatin tenzîmkirin vala derxist. Di dema destpêka Întîfada'yê de, di meha Nîsan a 1988'an de li Tunis'ê, Khalid Al-Wazir (Abou Jihad), ku ji aliyê Tel Avîv'ê ve weke organizatorê serhildanê dihate naskirin, ji aliyê komandoyên îsraîlî ve hat kuştin. Di dema Întîfada ya duyemîn de, Salah Shehada, yek ji berpirsyarê Hamas'ê yê Gaze'yê bû, di meha Tîrmeh a 2002'an de, di mala xwe de tevî hemû endamên malbata xwe û xizmên xwe, bi bombeyeke yek tonî hate pelçiqandiniii. Du salan pişt re, di meha Adar a 2004'an de, Ahmed Yassin, wek lîdereke naskirî yê rêxistina Îslamî bû, bi roketekê hate pelçiqandin. Çend hefte pişê, vê carê Abdel Aziz al-Rantissi, kesê ku cihê Ahmed Yassin girtibû, bi heman qederê ve rûbirû ma.

Ev rêbazên şer tenê ji aliyê Îsraîl'ê ve nehatine pêkanîn. Heman kiryar parçeyeke rastiya şerên ku ji aliyê dewletan ve, yên li dijî hêzên ku dagirkeriya wan qebûl nakin, hatine meşandin e. Li vir em dikarin di rêza yekem de navê Fransa'yê ê dema ku ew li Cezayîr'ê bû bînivîsînin. Hejmareke mezin ên rayedarên payebilind yê Eniya Rizgariya Neteweyî (FLN), ên weke Larbi Ben Mehdi, bi rêbazên îlegal hatin îdamkirin, ev kiryar di cotgehekê nêzîkê Alger de ji aliyê fermandar Paul Aussarésiii ve pêkhatibû. Ji bo bidawîanîna hemû rêbazên berxwedanê, dema ku mirov bawer dike ku pêwîst e mafê yên din were naskirin û guftugo werin pêşxistin wê demê pêvajoya şer dikare bisekine, çawa ku di sala 1962'an de li Evian, di sala 1993'an de li Oslo pêkhatin, bêguman li wan deran şert û merc cuda bûn.

Di vê demê de ti welatekî ereb gefan li hebûna welatê wan naxwe, siyasetmedar û rayedarên leşkerî yên îsraîlî dîsa jî ji her demê zêdetir şîdetê bikar tînin. Dor bi dor, pêwîst bû wan OLP qels kiriba (1982), piştre wê wan berxwedana filis-

** Profesorê hiqûqê li Zanîngeha Cergy, direktorê govara Confluences Méditerranée, Paris.*

Ahmet Gümüştekin (Evîna bedawî)

tînê bipelçiqanda (2002), dûre wê Hîzbûllah bihata qelskirin û pelçiqandin (1996 û 2006), piştî wî jî wê Hamas wisa bûya (2006, 2007 û 2008). Di encama van kiryaran de ne ku tenê ew negihîştin encama xwe, her cara ku dihate hêvîkirin pirsgirêka siyasî hatiye çareserkirin ew zêdetir mezintir dibû, ji ber ku hemû êrişên Îsraîl'ê dibûn sedemê bihêzbûna rêxistinên filistînî û afirandina komên radîkaltir.

Ev rewş encama êrişan diyar dike: Ew statûya berxwedanvanê ku raberê êrişên artêşeke herî bihêz û ûltra-modern hatiye xurt kiriye. Qasî ku mirov dikare komeke terorîstên ku ji derdoreke sosyal dûr in bipelçiqîne, ewqas jî zehmet e ku mirov bikaribe rêxistineke ku xwedî hêzeke girseyî ye û di çavê gelê xwe, an jî di çavê parçeyeke girseyê de weke rêxistineke berxwedanvan tê naskirin tine bike. Hêza van rêxistinan, Fatah, Hamas û Hîzbûllah, di encama hilbijartinên ku li Filistîn û li Lûbnan'ê pêkhatî de baştir xûyakir.

Di sala 2006'an de, li Lûbnan'ê, çend roj beriya êrişan Îsraîl'ê hêza Hîzbûllah'ê piçûk nirxandibû; Piştre hat dîtin ku Hîzbûllah êrişên roketan berdewam kir, di aliyekî de wan li dijî artêşa Îsraîl'ê liber xwe dida, li aliyê din de jî qedera leşkerên Îsraîl'ê, ku ji aliyê wan ve hatibûn bidestxistin, nediyariya xwe didomand.

Di demeke kurt de partiya Şîa weke rêxistineke bibandor derket holê. Ev rêxistin pir baş hatibû perwerdekirin û her wiha ew xwediyê gelek çekên sofîstîke bû, ku bi wan li ser xaka dijmin, bi awayeke pir fireh, berxwedan hat lipêşxistin û bidehan tangên Merkava hatin lêdan. Vê encamê hêzeke mezin li ya heyî zêde kir, bi taybetî li Lûbnan'ê û di nava girseya Misilman de wê prestîjeke pir mezin bidest xist. Bi alîkariya Îran'ê û her wiha piştigiriya Sûriye'yê vê rêxistinê karibû xwe di aliyê leşkerî de jî bihêztir bike û di siyaseta Lûbnan'ê de jî rolekê navendî bilîze.

Di sala 2008'an de, rewşa Hamas'ê ji ya Hîzbûllah a du salên borî cudatir bû: Ji ber encama darbeya xwe ya hêzê ku di meha Hezîran a 2007'an de pêkhatî û her wiha ji ber muxalefeta Fatah'ê û boykota Rojava ew qels bûbû. Digel vê ketina giran, wan dikaribû bi du aliyan ve xwe mafdar nîşan bida: Yek bi serkeftina xwe ya hilbijartinên 2006'an, ya din jî berxwedana wan ya li dijî hêza dagirker ku di heman demê de otorîteya (hikûmeta) filistînî di nava xwe de parçe bibû. Bi şerê ku wan meşand pozisyona wan bihêz bibû. Sih sal piştî aşîtiya ku bi Misir'ê re pêkhatibû, rewşa ne diyar ya hêzê bi awayeke kurt stratejiya Îsraîl'ê, ji derveyê ya di derbarê Îran'ê de, ti xeterekî ji cînarên xwe nabîne dide xûyan. Ev mentalîteya ku tenê pişta wî bi hêzê daye girêdan, dikare wî berbi trajedî û drameke cuda û her wiha daxwaza tola ve bibe. Ev rewş tenê dikare hê zêdetir û pir zêdetir pevçûnan zindî bike. Ev pevçûn wê li dijî heman hêza ku bi armanca bidestxistina ewlekariyê zirarên mezin dabû afirandin, were meşandin. Gelo çawa mirov dikare ewlekariya xwe li ser esasê tinekirina ewlekariya yên din bidest bixe?

Wergera ji fransî
Ahmet Dere

---

(1) Ev şer bû sedema mirina 9.500 kesan (6 hezar misrî, 3100 sûryeyî û 400 leşkerên hêzên mutefîk). Di şer de 3 hezar kes ji aliyê Îsraîl'ê jî jiyana xwe ji dest dan. Îsraîl di şer de 840 tank, 114 balafir wendakir, aliyê ereb, 2560 tank û 392 balafir wendakirin. Şerê Cotmeha 1973'an, Economica, Paris, 1999.

(2)Şerê sala 1991'an de herçend fuzeyên Îraq'ê xaka Îsraîl'ê hedef girtin jî, Tel Avîv'ê bersîv neda. Şerekî rasterast jî neqewimî. DYE nedixwest ku dengeyên heremê xerabibe û koalîsyona xwe bi vî awayî diparast.

(3) Serokwezîrê salên 1977 û 1983'an.

(4) Şerrê Îsraîl'ê yê Lubnan'ê, Weşanxane ya Unwin Paperbacks, London, 1986.

(5) Rojnama Yediot Aharonot, Tel Aviv, 3 Cotmeh 2008.



Ahmet Gümüştekin (Sumela)

AMERÎKA YA LATÎN

Revolución o muerte!*

MAURICEA LEMOINE**

An şoreş an mirin! * Tekoşîna bi armanca têkbirina dîktatoriya pîr ku ji çil salî vir ve Nikaragua'yê weke hacienda xwe birêve dibir pir bizehmet û çetin bû. Li hemû derê vê yaxa golên pembe û bi volkanên zer şer hate meşandin. Ev tê wateya ku eşqa gelêrî ji 19'yê Tîrmeh a 1979'an şûnde, dema ku bi çekan hilbijartin pêkhatin, muchachos'yên Eniya Sandinîstan a Rizgariya Neteweyî (FSLN) pir pêş de çû û general Anastasio "Tachito" Somoza ji cihê wî qetand.

Ala sor û reş li ser Managûa'yê li ba dibe. Mînaka bizehmet. Bi taybetî ji bo cînarên weke Salvador û Guetamala'yê. Wê demê, komarger Ronald Reagen, ku di meha Mijdar a 1980'ê de weke Serokê Dewletên Yekgirtî hatibû hilbijartin, li dijî vî welatî kete nava êrişan: Êrişa ku bi destê contra nikaraguayî pêk dahat heta deh salan li dijî rêveberiya sandînîstan dewam kir. Li hemberî tîrêjên roja çiyê ku dikelandin, cachorros (1) şer kirin: "No pasarán (2)!" Digel hemû tiştê, di sala 1991'an de, di welatekî xerabûyî û birçî de, wan çekên xwe danîn. Di encama hilbijartinên serokatiyê de wan desthilatdarî berda. Bi rêbaza demokratîk.

Û piştre…. Û piştre berbiçûyîna dojehê dest pê dike.

Du salan pêş de, di 1989'an de, li Venezûela'yê bihayê niftê (petrolê) pir kêm bû. Nift bi bihayê yavê hate firotin. Bi armanca azadkirina welat ji deynên giran, Fona Pere ya Navneteweyî (IMF) daxwaza sererastkirineke sazûmankariyê kir. Wê demê ti tişteke gel, ne ard, ne şekir, ne qehwe, ne rûn, ne jî birinc tine bû. Mezinbûna bihayên tiştan û terîfan ji bin kontrolê derket; bihayê wesaîtên girseyî di nava rojekê de 100 % bilind bû.

Roja 27'ê Sibatê, bê serokatî, bê rêxistin, bê ferman, bê yal girseya gel daket kolanên Caracas'ê: "Mafê me yê jiyanê heye! Em jî hemwelatiyên Venezûela'yê ne." Serhildaneke tevlihev, bi tevlêbûna gundiyan, êşên ji bo berxwedanê: wesaîtên şewutî, market û cihên bazirganiyê ku hatine şêlandin… Digel hemû encama xirab, Serokê Sosyal-Demokrat Carlos Andrés Pérez ferman dabû hemû hêzên ewlekariyê ku rewşê yaram bikin, bidin . Rewş pir xirab bû. Derdorê sê hezaran mirî -li Caracazo-.

Û piştre… û piştre, ti tiştekê ("por ahora" – ji bo vê demê).

Equateur, sala 1990. Rêyên mezin hatine xitimandin, haciendas kontrolê digire destê xwe, dêr têne dagirkirin… Ev rewşa li dijî dagirkeran û axayan, bi dîroka dirêj a serhildanan ve dibe yek, gelê xwecih ra bûye ser xwe û desthilatdariyê dihecîne.

Û piştre… û piştre dema jibîrkirinê tê.

Li Bolîvya'yê, hê zûtirîn, di sala 1985'an de rewşeke pir xeter çêdibe, di nava rojekê de bîst û çar hezar (24 000) karkerên xwecih bi mirinê re rû bi rû ne. Ji bayê sar yê yaltiplano'yê re rû bi rû ne, di demeke kurt de digehêjin herêma Chapare, li wê derê dest bi çandina coca, ku yek ji xebatên girîng ên gundiyan e, dikin. Mixabin! Li ba Washington'ê coca û cocaîn weke hev tê dîtin. Zext kêm dibe.

Û piştre… bi awayeke vekirî ti tiştekê nabe.

Beriya, di 1978-1979'an de, li Brezîlya'yê, di dema dîktatoryayê de, karkerên hesin ên ABC paûlîste (3) dikevin greva birçîbûne –digel rewşa xwe a îlegal- û bi hêzên ewlekariyê re pev diçin. Di heman demê de li Nikaragûa'yê – em dîsa vegerin ser xala destpêkê- Sandînîstan Somoza ji desthilatdariyê dûr xistibûn.

Di destpêka salên 1990'î de demokrasî dîsa gihîşt mafên xwe. Bihûşta berê ya dîktatoran, Amerîka ya Latîn dibe laboratûwara lîberalîzma bê kontrol. Di sala 1980'ê de hejmara feqîran 120 milyon bû; bîst (20) sal bi şûnde, hejmara wan dibe 225 milyon. Washington, FMI, Bankeya Cîhan'ê û bûrjûvaziya neteweyî (pir hindik e) qanûnên xwe ên tûnc li her deverî pêş dixin.

Tevgerên civakî dest danaynin. Li her deverî ew hewl didin ku liberxwe bidin. Û li her derî, ew liberxwedidin. Gundiyên birezîlî yên bê xak, (her wiha paraguî jî) û bolîvî li dijî nijadperestên fireneteweyî şerê "avê" û "gazê" dikin, kes nikare wî şerî bihijmêre. Lê belê heman serhildan, carna pir dijwar bûn, xwediyê karakterekê rojane û armancekê bisînor û nişkav bûn.

"Me şerekê pêwîst meşand ku em bikaribin mafên xwe, ên ku dewleta meksîkî ti car nefikirîbû bide me, bidest bixin: Kar, ax, xanî, zexîre, tendurustî, perwerde, dad û aştî (4)." Artêşa Rizgariya Neteweyî ya Zapatîsta (EZLN), ku di nava çiyayên Chiapas'ê de, bi awayeke bêdeng 1'ê Çile ya 1994'an derbas dikir, hêdî hêdî xwe ji têkoşîna çekdarî re amade dikir.

Çalakiyên EZLN'ê û yên Fermandar Marcos, di sala 2000'î de, di têkbirina Partiya Şoreşger a Sazûmankarî (RPI) de rolekê girîng û eşkere lîstine. PRI, ji 1929'an vir ve weke hukimdarê bêgotin ê Meksîka'yê dahate naskirin. Lê belê ji ber kêmasiyên eşkere ên stratejîk weke "girtina desthilatdariyê", ku ji bo wan wê ev di rêza duyem da ba, çalakvan nikarin hatina partiya pir li rastgir a bi navê Partiya Çalakiya Neteweyî (PAN) bo desthilatdariyê yasteng bikin. Û ew neçar in ku, digel hemû nexweşiyan, bi îdarekirina otonomiya herêmî ku di nava civakên li Chiapas'ê de heyî razî bin.

Bêguman, li aliyê başûr, serok ji cihên xwe dikevin, ên weke Jamil Mahuad an jî Lucho Guttiérrez (Ekvator), Alberto Fujimori (Perû), Gonzalo Sánchez de Losada an jî Carlos Mesa (Bolivia), Fernando de la Rua (Arjantîn), ew hatiye dûrxistin, bi bangewaziya; «Na ji bo globalîzmê!", "FMI derve!", "Que se vayan todos (5)!" Ji destpêka salên 1980 vir ve çardeh (14) serokên dewletan nikaribûn biçin heta dawiya dema desthilatdariya xwe.

Lê cihên wan ji aliyê çi ve an jî kî ve hatine tijekirin? Di dema hilbijartinan de, ji bo serkeftinê, di nava atmosfereke kermesê de, di bin siya pankartan de ditekoşîn. Qêrînên soz û sloganên wan nehîştin ku niqaş çê bibin. Tişta ku herî girîng, di nava demokrasiyên ku ji aliyê bazarê ve dîl hatine girtin de, her wiha di nava krîzeke aborî û civakî de, hemû partî, çi ên rastgir û çi jî yên çepgir, bibûn xwediyê rêveberiyeke weke hev. Hemû bibûn xwediyê yek paşerojê.

Ji ber ku di pir aliyan de gel xwediyê yek zanistiyeke kolektîf in, ev tişt digel tevgerên wan ên girîn ku her demê dikarin bandora xwe nîşan bidin. Weke varîlên ku ji teqînê re amade ne. Tenê ji wan re funye divê. Ev berpirsyartî ya keseke "Serok" bû. Neçariya serokên siyasî yên kevnar ku nikaribûn li pêşiya serhildanên girseyan rêveberiyê bikin, bû sedemê ku kesên ji sendîkayan, ji mîlîtanan, ji leşkeran an jî ji girseyên ku serî rakirine werin ser desthilatdariyê.

Encama bûyeran dikare di nava tevgerên altermondialîst de, di nava derdorên antîkapîtalist de an jî ligel kesên ku dibêjin "ne xwedê, ne pispor, ne trîbûn" ku di derbarê rêveberiya kolektîv de an jî li ser xwezaya gelêrî de nerehetiyê çê bike. Digel hemû tiştê, rola navendî ya "serokên karîzmatîk" dikeve çavan- bê ku rola bi mîlyonan hemwelatiyên anonîm, ku bi awayekê tevlî "pêvajoyê" bûne, bike mijara gotinê.

Bê hebûna birêz Fîdel Castro Kuba'yê nikaribû li dijî yêrîşkariya bênce (50) salî ya Amerîka'yê liberxwe bida. Li Venezûela'yê şoreşê bolîvariyê nikaribû bê serok Hugo Chavez pêkhatiba (gelo wê bibûya?) Guherîna civakî ya li Bolîvya'yê îro bûye xwediyê navekê din: Evo Morales.

"Di pêşdeçûna hemû rêveberên mezin de bûyerekê sembolîka bingehîn, çalakiyekê lewend bûyîna siyasetê diyar dike (6)." Weke çalakiya parastina karkerên mûzan, yên Eliécer Gaítan, di salên 1940'î de li Kolombiya'yê (7). Erişa li dijî wargeha leşkerî Moncada'yê, a li Kuba'yê, ku ji aliye "Fîdel" ve di 26'ê Temmuz a 1953'an de pêkhatî bû sedemê pêvajoya lewendiya Sierra Maestra'yê. Her wiha wê li vir em bûyera ceribandina darbeyekê leşkerî ya ji aliyê fermandar Chávez ve, di 4'ê Sibat a 1992'an de pêkhatî jî jibîr bînin. Heman çalakiya ku sê salan piştî pêvajoya navberê ya hikûmeta Caracazo ketibû rojevê, bi armanca, li gorî wî, "têkbirina demokrasiya ne rast û riziyayî" pêkhatibû.

"Dîrok wê min efû bike" ev gotin ya Castro'yê cîwan bû ku piştî Moncada'yê, di dema mehkemeya xwe de anîbû ziman; "Em negihîştine armanca xwe, ji bo vê demê" digot birêz Chavez, di dema ku xwe teslîm dikir, piştî ceribandina darbeya leşkerî. Ev du (2) hevok bandorekê mezin lin ser xizanan çê dikin û statûyekê sembolîk didin çalakvanan.

Ji derveyê norman, lê belê ev rastî, di derbarê doza gelêrî de, dikare weke mînak were dîtin: Di dema xwe de, li pêşberî girseyan, Salvador Alende, di sala 1940'î de wezîrê tendurustiyê bu, weke şexsiyetekê siyasî û di têkoşînên rojane de qayîm bûyî, li dijî navendên hîjyen alîgirên xwe seferber kiribû. Piştî greva birçîbûnê ya çil û yek (41) rojê dewam kirî ya ABC paûlîst, di sala 1979'an de, her wiha lêdan û zîndana ku hate jiyan kirin ku birêz Luiz Inacio Lula da Silva, weke serokê sendîkaya karkerên hesinkariyê ya Sao-Bernardo, karibû bibe xwediyê şexsiyetekê neteweyî. Piştî berxwedana wî ya li dijî zexta ku li hember cocaleros'ên Chapar'ê dahate meşandin ku birêz Evo Morales, weke rêveberê sendîkayê, di sala 2002'an de, û her wiha piştî yavêtina wî ya îlegal ji parlamenê, ew bû yek ji aktorên siyasî li Bolîvya'yê. Xebata kese Fernando Lugo, ya di

*** Rojnamevan.*

Sipaz. Files. Jinên Îndîana dibêjin Ya Basta!

nava "dêra feqîran" de, ya bi navê teolojiya azadiyê, bû sedemê ku ew berbi serokatiya Paragua'yê ve biçe.

Danûstandinên di navbera serok û gel de –li vir em dikarin li pozîsyona birêzan Chavez, Morales û, di hin aliyan de, Rafael Correra binêrin- dikare rehetsiziyê û her wiha tirsê jî di derbarê "ên ku xwe zana dibînin"de çê bikin. Axiftinên radîkal ên li dijî sîstemê, ên li dijî olîgarşiyê, ên li dijî sazûmaniyê dibe faktoreke bêhempa ji bo vê têkiliyê.

Popûlîzm! Ji bo krîzan bersîvên demagojîk û ji rastiyê dûr! Axiftvanên şanogerî ku girseyan nezan dibînin!

Di rastiyê de, di pratîka diyaloga wan de ev rêveber hest û daxwazên girseyê berovajî dikin û li gorî xwe didin xûyan. Carna ev bi hêzê pêk tê û girseyê dike nava çarçoveya civakî ya sîstemê: "Bêguman, têkîliyeke diyalektîk di nava wî [Chavez] û gel de, weke du (2) tiştên ku hevdu xwedî dikin pêş dikeve" Gelê venezûalayî (...) bi alîkariya hewldanên Hugo Chavez û tevgera bolîvarî xwe kir mijareke siyasî; yek bê yagahiya yê din biaxife ti wateya xwe, bi taybetî di vê demê de, tine (8)"

Ji bo alîgiran axiftinên serokên wan ne tiştên şanogeriyê ne; ji bo dînamîka tevgerên gelêrî ev tiştên pir pêwîst in. Alîgir tevlî çalakiyên ku ew bi rêya wan dikarin xwe xwedî bikin, guhertinên ku ew dixwezin çê bikin dibin. Ev jî di nava çarçoveya demokrasiyeke hevbeş de pêk tê. Bi heman rêbazên hevkariyê yek yê din xurt dike.

Her carê, hêza xwekirina çavên girseyan û ya ku dikare wan rabike ser piyan ji bo karîzmayê şertên pêwîst in, lê belê ew bi tenê têr nakin. Qasê ku mirov dikare muhafazakar be, tûjtir be an jî faşîzan be, wiqasa jî dikare bi wan were naskirin. Her rêveber bi kiryarên pêvajoya xwe tê mehkemekirin û naskirin.

Piştî hilbijartina xwe ya 2002'an, Serok Lula, bi tevlîbûna Forûma Sosyal a Cîhan'ê ku li Porto Alegre pêkhat û bi tevlîbûna Forûma Davos'ê, dest bi xebatên xwe kir. Wî tim hewl da ku di navbera şeytan û xwedayê baş de navbenkariyê bike. Wî çend çalakiyên polîtîk û gelêrî, ên bi armanca "alîkariyê" da destpêkirin. Ev hewldanên wî ji bo bidestxistina berjewendiyên feqîran bûn. Lê belê wî ti carî rewşa saziyên dewletê ên aborî nekir mijara gotinê, tenê wî modela neolîberal hinekê nermtir kir (9). Li gorî yasta hin serokên dewletan, ên "çepgir" Tabaré Vásquez (Uruguay), Nes- tor puis Christina Kirchner (Argentine), Michelle Bachelet (Chili), encama ku derkete holê baş bû. Weke nûnerê hêza pêşxistinê ya li dijî rastên olîgarşîk, wî nehişt ku reformên kûr ên civakî pêk werin, bi vî awayî wî ji daxwazên taybet ên kapîtalîzmê re serî danî.

Derdorên radîkal ji xwe re çekên bibandor bidest dixin ku di nava civakê de guherînên kûr çê bikin. Li Venezûala'yê, li Equator'ê û li Bolîvya'yê van derdoran, bi rêya hilbijartinên meclîsê, destpêkirin ku destûrekê bingehîn -bi rêya referandûmê- amade bikin. Rêbaz, ajîtasyoneke vala, dayîna sozên mezin... Di çavên pir çavdêran de weke pêkenok bûye. Her wiha, hatina ser desthilatdariyê ya serokê Paragûa'yê Fernando Lugo, bi alîkariya koalîsyoneke fireh û îdeolojîk pêkhat. Digel vê hatina ku bê yalîkariya kongreyê çêbûyî, Serok Fernando Lugo dest pê kir ku pirsgirêkên destûrî bîne ziman û alîkariya hilbijêrên xwe bigire: "Divê em qebûl bikin ku dema latifundio, hatiye, ew a ku ji aliyê tevgerên gundiyan ve weke afîş tê bikaranîn bi sînorên qanûnî tê yastengkirin. Heke em destûra bingehîn neguherînin an jî tê de hin guhertinan çê nekin reforma civakî ku tê xwestin nikare pêk were (10)."

Çi li Amerîka ya Latîn û çi jî li Ewrûpa'yê, piraniya hêzên mezin ên çepgir ji xwe re kirine adet ku hemû referansên sosyalîzmê reş bikin. Li vê derê êdî xeta parvekirinê çêbûye. Cara yekem, di 30'yê Çile yê 2005'an de, li Forûma Civakî ya Cîhan'ê, birêz Chavez gotinên di derbarê "sosyalîzma sedsala XXI'în" de bilêv kir. Ji wê demê bi şûnde, birêzan Morales û Correra jî dest pê kirin ku heman tiştî (Rubicon) (11) bînin ziman. Ligel wan sê kesan ti sarîyekê tine. Neteweyîkirina dewlemendiya stratejîk, programên civakî yên dirfireh, parvekirina axê, pêşxistin, bi taybetî li Venezûala'yê, reformên tiştên ku ne şexsî ne û kontrolkirina wan (Kooperatîf, fîrme û reveberiya wan, rêveberiyên herêmî) û hwd.

Bi encameke zanistî, bi derdorên "nerm" re wan karibû cudahiyeke pir mezin çê bikin:

Tedbîrên wiha bikaranîna hêzê, heta pevçûnan jî bi xwe re pêwîst dikin, sîstemên desthilatdar ti tiştekê jidest ber nadin.

Di meha Kanûn a 2001'î de, dema ku muxalefet, a pir bêhêz, dest bi protestokirina projeya ku, li gorî wan, radîkal kir, birêz Chavez derket pêşberî girseyê, li ser cedeya Bolîvar'ê, û wiha got: "Em nehatine vêdera ji bo çend guhertinên bêbingeh çê bikin, em nehatine vêdera ji bo gel bixapînin. Na! (...) Digel ku ew nexweze guhdarî kêmayetiyên xwe ên taybet bike û wê bibîne jî, ji bo pêşxistina şoreşê ti gav paş ve nayên avêtin!" Piştî çar mehan, di Nîsan a 2002'an de, ew ket nava hewldanên ji bo amadekirina ceribandina darbeya leşkerî. Piştgiriya girseya ku wî nexapandiye heta niha, jê re bû alîkariyeke mezin ji bo ku ew liberxwe bide. Ji ber vê wî karibû şoreşa bolîvarî lipêş bixe û kûr bike.

Ji ber sabotaja meclîsa damezrîner, girevên patronan, tehdîda sekinandina kar ya herêma Santa Cruz: Birêz Evo Morales, di meha Îlon a 2008'an de, mecbûre ceribandina dêstabîlîzasyonê bû, lê belê ev bûyer jî ne bû sedemê ku ew paş ve gav bavêje.

Bê ku ew bêje ev navberî wê pirsgirêken ciddî, ji bo teorisiyenan, derxin holê ew ê rêya xwe bidomîne. Bê ku ew şemayên dema borî, bi rêbazên azad û bi dengekê bilind û bi awayekê şoreşgerî kopî bikin, ew serî ji mantiqê xwe ê cewher re datînin, pêş de diçin, paş ve diçin, xwe dixapînin, dîsa ber bi pêş ve diçin, ji xwe re rêyên nû keşif dikin. Li hemberî siyaseta gumankariyê - bi awayeke pir muhafazakar, ji ber ku ew demokrasiya liberal weke modela herî baş û pêwîst dipejirînin-ew siyaseta qenetê bikar tînin. Carna ew jibîr tînin ku, di hin demên dîrokî de, gel xwe belave dike û "qedera" xwe xirav dike.

Wergera ji fransî
Ahmet Dere

---

(1) Leşkerên cîwan ên dilxwaz ku di nava Artêşa Gelêrî ya Sandînîst de ne (EPS)

(2) "Ew nikarin derbas bibin!"

(3) Santo André, São Bernardo, São Caetano: Herêmên pêşesaziyê ku di nava São Paulo ya mezin de cih digirin.

(4) "Organa ragihandinê ya EZLN'ê", n° 1, Mexique, Çile 1993; in Ya Basta!, Dagorno, Paris, 1994.

(5) "Ku hemû bihev re biçin!"

(6) Analîza Diane Raby bixwînin; "Di tevgerên şoreşger û populer de serokên karîzmatîk," Cuadernos del Cendes, Caracas, août, çapa fransî, Weşanên RISAL, Tîrmeh 2007.

(7) Dikeve ferqa xetera ku ew temsîl dike, beriya ku ew desthilatdariyê bigire, di sala 1948'an de olîgarşiya Kolombiya'yê wî qetildike; kuştina wî Kolombiya'yê davêje nava rewşeke aloz ku heta îro didome.

(8) Diane Raby, op. cit.

(9) Di sala 2006'an de ew careke din tê hilbijartin, ev ji nûhve hilbijartina wî weke encama popularîteya wî û nepolîtîkbûna wî ku, li dijî rastgiran weke ''başê xiraban'' hatibû naskirin, derket holê.

(10) El Pais, Madrid, 26 Adar 2009.

(11) Bêguman ev serokkomar di bin çavderiya çavderên biyanî de awayeke demokratîk tên hilbijartin. Lêbelê ew xalên wiha di destûrên welatê xwe de bicih dikin ku dikarin heta dawiya temenê xwe wek serok bimînin.

ÎSRAÎL-FRANSA

Tel Aviv ji Parîs'ê re dide ser hev

ALAIN GRESH*

Ahmet Gümüştekin (Xak û Ferîşte)

Di Kanûn a sala 2009'an de, li Qudûs'ê polîsên Îsraîl'ê davêjin ser Navenda Çanda Fransa. Armanca wan ew e ku berpirsiyarên payebilind yên fîlîstinî ku xwe sipartine vê saziyê bikşînin lêpirsînê.

Roja 22'ê Hazîran a 2009'an, leşkerên Îsraîl'ê Berpirsa Navenda Çanda Fransa ya Naplus'ê bi darê zorê ji seyera wê ya dîplomatîk derdixin, ew davêjin erdê û bi pihînan lêdixin. Yek ji leşkeran hingê jê re wiha dibêje: "Ez dikarin te bikujim."

Di Çile ya 2009'an de, di dema êrişa Îsraîl'ê ya li hember Gaza'yê de, leşkerên Îsraîl'ê davêjin ser mala Berpirsê Navenda Çandê û karmendê konsolosxana Fransa M. Majdi Chakkoura û dest datînin ser pere û zînetên mala wî. Di nava wan mehan de leşkeran ev helwesta xwe gelek caran dubare kirine û di ser de jî çend caran lêxistine û gule reşandine ser karmendên fransî.

Roja 11ê Hezirana 2008'an, Alîkara Konsolosê Fransa yê Qudus'ê Xanim Catherine Hyver, li nêzî xeta Gaza'yê bi qasî 17 saetan tê binçavkirin û rûmata wê tê şikandin.

Serokwezîr Benyamin Netanyahu ji bo xatirê 'dostê xwe' Nikolas Sarkozy hewlda ku li Gaza'yê ji bo avakirina navendeke nû ya çanda fransî bibe alîkar. Lê heta niha ti pêşketin çênebûye. Îsraîl destûr nade ku pêdivî û alavên hewce yên ji bo navendê bikevin welêt. Helbet disa wek dîsa bi bahaneya ewlekariyê. Belkî jî wisa baştir e: Qet nebe, di dema êrişên nû de, ev avahî jî weke bi dehan avahiyên din ku demekî bi alîkariya saziyên Yekîtiya Ewrûpa'yê hatibûn avakirin, ji aliyê artêşa Îsraîl'ê ve nayê hilweşandin. Weke mînak ruxandina balafirgeha navnetewî ya Gaza'yê di sala 2000'î de. Yekîtiya Ewrûpa'yê hilweşandina vê balafirgehê şermezarkiribû û herwiha îlan kiribû ku ewê ji Îsraîl'ê tazmînat bixwazin. Em hêjî li benda wê tazmînatê ne.

Di gel wê helwesta Îsraîl'ê ku ewqas bi rûmeta nûnerên fransî leyîst û ew piçûk xistin, Rayedarên fransî ti reyaksiyoneke berbiçav nişan neda (1). Îsraîl wisa ji hedê xwe derket ku réxistina wî ya saloxdariyê Mossad'ê roja 19'ê Çile ya 2010'an, li Dubayî di kuştina berpirsiyarê Hamas'ê de pasaportekî hemwelatiyê Fransa bikaranî. Lêbelê li ser vê bûyerê serokwezaretiya Fransa'yê berpirsiyarê karê derve yê Îsraîl'ê yê li Parîs'ê wezifedar bi awayeke şermok vexwend da ku li ser mijarê jê agahiyan werbigire. Bila şik û gumana we tinebe ku Parîs li hember Îsraîl'ê ancax ewqas dikare deng derbixe û pir naçe pêş!

Wisa xuya ye ku hikûmeta Fransa'yê yêdî hîm bûye qehra Îsraîl'ê bikişîne. Wezirê Karê Derve yê Fransa'yê Bernard Kouchner di meha Mijdar a 2009'an de di dema serdana

* *Endamê redaksiyona Le Monde diplomatique.*

Îsraîl wisa ji hedê xwe derket ku Mossad'ê roja 19'ê Çile ya 2010'an, li Dubayî'yê di kuştina berpirsiyarê Hamas'ê de pasaportekî hemwelatiyê Fransa bikaranî. Li ser vê bûyerê Serokwezîriya Fransa'yê Berpirsiyarê Karê Derve yê Îsraîl'ê yê li Parîs'ê bi awayeke şermok vexwend da ku li ser mijarê jê agahiyan werbigire. Bila şik û gumana we tinebe ku Parîs li hember Îsraîl'ê ancax ewqas dikare deng derbixe û pir naçe pêş!

xwe ya Îsraîl'ê de, hevdîtana bi hempîşeyê xwe yê îsraîlî Avigdor Lieberman re qebûl kir. –Ev ciwanmêr bi wê tevger û helwesta xwe eger îtalî yan avusturalî bûya weke nîjadperest û faşîst dihat îlankirin- B. Kouchner da xuyakirin ku avakirina nehsed (900) avahiyên li Gilo (Qudûs); "ne xwedî armanceke polîtîke û divê li pêşiya hevdîtin û diyalogan nebe asteng… (2)"

Mijareke din ya balkêş jî heye, Fransa hewldide ji bo avakirina nexweşxana li Gaza'yê bibe alîkar, lê Îsraîl pêdivî û malzemeyên ji bo avakirina vê nexweşxanê tev dane bloke kirin. Kouchner li hember vê helwesta Îsraîl'ê ti deng dernexist û herwiha ji bo xwendevanên ku mafê bursê bi destxisitne lê ji ber qedexeyên Îsraîl'ê nikarin werin xwendina xwe li Fransa'yê berdewam bikin, ti alîkarî nişan neda. Zehmetiyên ku Îsrail bi bahaneya wîze û 'polîtîkayên nû' li hember karmendên Saziyên Derveyê Hikûmetan (ONG) ku dixwazin li ser xaka Filistîn'ê kar bikin, derdixe dervayê hesaban. B. Kouchner di vê mijarê de bêdengiyê tercîh kir.

Herî dawî, B. Kouchner serî tewand û neçû serdana herêma Gaza'yê.

Hempîşeyê wî yê îrlandî Micheàl Martin ku li wî jî hatibû qedexekirin biçe wê heremê, di meha Adara 2010'an de bi wêrekî tevgeriya û di ser Misir'ê re çû herêma Gaza'yê. Piştre di nivîseke xwe de wiha gotibû: "Eşkere ye ku divê Yekîtiya Ewrûpa'yê û rayagiştî ya navnetewî zorê bidin ser Îsraîl'ê da ku blokaja li ser van nuqteyên çûyîn û hatinê rake û têkiliyên tîcarî û însanî normal bibe (3)."

"Zorê bidin ser Îsraîl'ê", ji bo Fransa ev termeke wisa xerîb e ku Serok Sarkozy hê wê nas nake. Blokaja li ser çûyîn û hatina Gaza'yê berdewam e. Dagirkerî berfireh dibe. Hevdîtin û diyalog xetimîne. Di rewşeke wisa de, hun ji Netenyahu mirovekî aştîxwaz derînin çi fayde ye?

Wek mînak, di Kanûn a 2008'an de, Înîsyatîfa Serokwezareta Fransa'yê û Yekîtiya Ewrûpa'yê biryar dan ku tekiliyên xwe yên bi Îsraîl'ê (4) re bi 'pêşbixin.' Di navberê re sê hefte nebuhurîn, artêşa wê êriş bir ser Gaza'yê. Serokê Fransa'yê ji êrişê re fetwa derxist û îddia kir ku Hamas şertên agirbestê binpêkirine. Ji bo rastî werin zanîn îcab nake mirov zêde dûr biçe, tenê li malpera Wezareta Karê Derve ya Îsraîl'ê jî binêrin, dikarin bibînin ku ew jî qebûl dikin ku heta 4'ê Mijdarê, yanî heta roja operasyona xwînî ya Îsraîl'ê şertên agirbestê nehatine binpêkirin.

Di vê demê de ku dibistanên li Gaza'yê û bi hezaran avahiyên rûxandî, nikarin ji nûhve werin avakirin (ji ber ku anîna çîmento qedexe ye), sefîrê Fransa yê li Îsraîl'ê M. Christophe Bigot, bi awayeke pir nazik behsa blokaja li ser çûyîn û hatina Gaza'yê dike: "Gotina blokaj divê di nava neynokan de were bikaranîn, Ji ber ku bi çi awayî dibe bila bibe, ha di tunelan re ha di ser Îsraîl'ê re dîsa jî pir pedivî û alav dikarin bigêhêjin Gaza'yê (5)." Mirov nizane, ka gelo M. Bigot kengê Fransa li Îsraîl'ê temsîl dike û kengê Îsraîl'ê li Fransa temsîl dike. Disa di Kanûn a 2009'an de, dema ku Swêd di derbarê Îsraîl'ê de pêşnîyazeke maqûl pêşkêşî Yekîtiya Ewrûpa'yê kiribû, ew wê demê bi dijwarî li hember derketibû.

M. Bigot di hevpeyvîneke xwe de niyeta Parîs'ê tîne ziman wiha dibêje: "Berî hertiştî divê daxuyaniya Yekîtiya Ewrûpa'yê biryarên erênî yên Benyamin Netanyahu li ber çav bigire. Netenyahu avakirina avahiyên koloni bi qismî be jî daye rawes- tandin. Divê em vê biryara wan, herçend bersîveke tam nede hemû heviyên me jî, silav bikin (6)."

Ya rastî ew e ku ne tenê dagirkeriya Îsraîl'ê ya li Qudus'ê domdike, herwiha ev biryara wan tenê 'demborî' ye (ji bo deh mehan e). Îsraîl bi biryare ku li Şerîa ya Rojava 3000 avahî çêbike. Di nava sala 2009'an de, li hêjmara îsraîliyên ku hatin li herêmê bi cîh bûn 10000 zêde bûn. Bi tevahî hêjmara îsraîliyan ya li herêmê îro ji 300 hezarî derbastir bûye.

Hikûmeta Parîs'ê di derbarê malên tîcarî yên îsraîliyan de ku bi qaçaxî dikevin bazara fransî, li gorî mevzuata Ewrûpa'yê tevnagere. Dadgeha Edaletê ya Yekîtiya Ewrûpa'yê jî roja 25'ê Sibatê di vî warî de biryara xwe eşkere kir. Lê Parîs'ê di şûna ku li hember vê qaçajxçitiyê derkeve, bi helwesta xwe jê re rê vedike.

Fransa di qada navnetewî de weke parazvanê Îsraîl'ê tevdigere.

Wezîrê Karê Derve yê Fransa'yê hewldan û pêşnîyazên Swêd'ê yên di derbarê Îsraîl'ê de wiha nirxand: "Ev helwesteke xeter û bêpîvan e. Ji ber ku Îsraîl îro bi biryara xwe ya cemidandina dagirkeriyê, tawîzeke mezin daye. (7)" Li ser daxwaza Parîs'ê, naveroka pêşnîyaznameya mijara gotinê bi qismî tê nerm kirin, ji ber ku tê de Qudus a Rojhilat weke paytexta Dewleta Filistîn'ê nayê nîşandan. Lê Qudus tenê weke paytexta herdû dewletan tê binavkirin. Di pêşnîyaznameyê de herwiha gotina "deshilatdari" ya dewleta Filistîn'ê tê derxistin û di şûna wî de gotina "berdewamiya xakê" tê bicîhkirin.

Di salên 1970 î de, Sekreterê berê yê dewletên Yekgirtî Yên Amerîka'yê Henry Kissinger bi awayeke îronîk prensîbên hevdîtinan yên hikûmeta Îsraîl'ê wiha destnîşan kiribû: "Eger hun bi wan re ji sedî 95 li hev bikin, tê wê wateyê ku hun dijberekî xeter ên cihûyan in."

Sûcdariyên bi vî awayî li hemberî Serok Barack Obama jî kêm nabin. Obama ji bo nîşan bide ku di politaka ya wan de hin guherîn çêbûne, axaftin û daxuyaniyên nû amade kirin. Lê belê di adara 2010 an de, di dema serdana alîkarê wî Joe Biden ya Îsraîl'ê de, krîzeke nû derket. Ji ber ku wî dekekî gotibû: ''Ji bo mirov bibe Siyonîstekî baş, ne hewce ye mirov bi eslê xwe cihû be.'' Kêfa îsraîliyan ji vê gotina wî re nayê. Tam di wê demê de, Îsraîl weke ku şîrmaqek li Biden bide, îlan kir ku ewê li Qudus'ê 1600 avahî çêbikin. Îsraîl hewldide bi hevalbendê xwe Amerîka'yê bide hîskirin ku li kesî guhdarî nakin. Roja 16'ê Çileyê ji Biryargeha Navendî ya Amerîka'yê, komeke serbazên ji hemû polîtîkayên leşkerî yên li Rojhilata Navîn berpirsiyar bi taybetî yên berpirsiyarên herêmên Afganistan û Îraq'ê li Pentagon'ê hatin komkirin.

Balkêş e ku di civînê de hişyarî û îkazeke ciddî li serbazan tê kirin: ''Polîtikaya ku Îsraîl îro dişopîne, giranî û bandora Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê ya li ser hevalbendên wî yên ereb qels dike.'' Tê gotin ku M. George Mitchell ku weke Nûnerê Taybet yê Serokê Amerîka'yê li Rojhilata Navin hatiye wezîfedarkirin: "Pir pîr e, pir giran e û di pêkanîna karê xwe de pir li paş maye."

Li gorî çapemeniya Amerîka'yê, Alîkarê Serokê Amerîka'yê M. Biden herwiha di hevdîtineke rûbirû ya bi M. Netanyahu re bi zimankî eşkere dibêje ku polîtikaya wan ya ku hêz dide 'cîhadist'an û axaftinên wan xwedî dike, jiyana hemwelatiyên amerikî yên li Îraq û Afganîstan'ê dixe xeterê (8).

Wisa xuyaye ku ne ev helwesta Pentagon'ê, ne jî tevgerên rûmetşikandinê yên rayedarên Îsraîl'ê tesîreke berbiçav li polîtîkaya Serok Obama nekirine. Biryara berdewamiya hevdîtinên îndîrekt yên di navbera filistînî û îsraîliyan de jî nikaribû di politîkaya Amerîka'yê de bibe sedemê guherîneke xuyange. Serokê Enstîtûya Washinton'ê ya Polîtîka ya Rojhilata Navîn, (Washington Institute for Near East Policy,) ku saziyeke fikir û raman e (think-tank) girêdayê lobiya aligên Îsraîl'ê ye, Robert Satlfof wiha dibêje: "Ti çavdêrekî polîtîk ne di wê baweriyê de ye ku di demeke kin de çareseriyekê were dîtin. Lê bi dîplomasiyeke aktîf û berfireh mirov dikare rexne û helwestên biguman yên ku dibin sedemê afirandina pirsgirêkan bide bêdengkirin û rawestandin. Herwiha bi van xebatan, atmosfereke wisa dikare were afirandin ku di encama wê de, raya giştî ya navnetewî bi awayeke lezgîn bala xwe bide ser pirsgirêka Îran'ê (9)."

Yanî bi kurtasî "pêvajoya aştiyê" li pêşberî raya giştî ya navnetewî tenê bûye sahneya kêf û seyranê. Lê li pişt sahnê li hemberî Îran'ê amadekariya şer tê kirin. Li gorî wan, ancax piştî şerê li hember Îran'ê ew dikarin, bi filistîniyan re li hev bikin. Ev gotin û axaftinên rêvebirên Îsraîl'ê bi dehan salane neguherîne, xwe dubare dikin. Tenê navê dijminê wan diguhere. Berî niha dijmin Misir û Îraq bûn, niha Îran e.

Ger M. Barrak Obama bixwaze, qet nebe ji hikûmeta Îsraîl'ê piçek zêdetir dilxwaz be, bila şik û gumana we tine be ku dikare ji dirama filistîniyan re çareseriyekê bibîne. Ji Fransa û Yekîtiya Ewrûpa'yê re jî tenê pirsek dimîne: Ew çawa dikarin ji vê pêvajoya çareseriyê re bibin alîkar?

Di Hezîrana 1980'an de, Civaka Dewletên Ewrûpa'yê, peymana bi nav û deng ya Venis'ê erê kir. Di peymanê de ku bi giranî di encama hewldan û xebata Fransa'yê de hat qebûlkirin, dihat xwestin ku hemû mafên meşrû yên filistîniyan were qebûlkirin. Herwiha Ewrûpa bi temamî li dij bû ku Qudus bi çi bahaneyî dibe bila bibe, diviyabû nehata dagirkirin û statuya wê nehata guherandin. Herwiha bi zimanekî vekirî dihat xwestin ku Rêxistina Azadiya Filistîn'ê (OLP) weke muxatab were qebûlkirin û tevlî hevdîtinan were kirin. Amerîka û hikûmeta Îsraîl'ê pir bilezginî bi awayeke dijwar li hember vê peymanê derketin. Îsraîl hemû pêşnîyazên ku têde dihat xwestin ku "SS ereb" jî tevlî hevdîtinan bibin, red dikir.

Piştî 13 salan, di sala 1993'an de, hikûmeta Îsraîl'ê Rêxistina Azadiya Filistîn'ê (OLP) weke muxatab qebûl kir. Ev deriyê pevajoya aştiyê bi xêra xebatên Ewrûpa'yê hatibû vekirin. Lê wê demê Ewrûpa'yek din hebû. Ew Ewrûpa ku wê demê Fransa dikaribû polîtkayek serbixwe ya derve sazbike û bişopîne.

Wergera ji fransî
Bedran Dere

(1) "Bêdengiya Kouchner li Îsrail'ê", Le Canard enchaîné, Paris, 25 Hezîran 2009; Gilles Parîs, "15'ê Hezîranê li Gaza'yê, Le Monde, 17 Tîrmeh 2009.

(2)Nûçeyên Rojhilat, http://blog.mondediplo.net, 19 Mijdar 2009.

(3) "Gaza a year later", International Herald Tribune, Paris, 5 Adar 2010.

(4) Nûçeyên Rojhilat, 10 Kanûn 2008.

(5) Le Canard enchaîné, 21 Cotmeh 2009.

(6) ''Paris comes out against Swedish plan'', The Jerusalem Post, 3 Kanûn 2009.

(7) Ji bo hemû tekstê ''Nûçeyên Rojhilat'', 18 Adar 2010.

(8) Nivîsa ''War in Context'' di bloga Paul Woodward de, 16 Adar 2010. Nivîsa Mark Perry jî di Govara Foreign Policy de, 13 Adar 2010.

(9) ''Biden's Israel visit and its aftermath'', Policy Watch, no 1642, The Washington Institute for Near East Policy, 15 mars 2010.

Ahmet Gümü

1 ◀

tîbûyînê, yên bi taybetî dibin mexdûr zarok in. Baweriya bi dinyaya mezinan di demên şer de dibe ku nemîne. Ev yek jî dikare bandoreke zêde li pêşketin û mezinbûna zarok a paşê bike.

Şîddet û xizanî

Gelek lêdkolîn ji Lubnan, Îsraîl, Bakurê Îrlanda'yê, Kamboçya'yê û Başûrê Afrîka'yê nîşan didin ku şîddeta yekser bêhtir tê serê malbatên xizan û tesîra neerênî ya ku şîddet li jiyana wan dike jî bêhtir e (Bryce & Walker, 1989). Bi taybetî zarok ji ber şîddet û xizaniyê zêdetir êş û kulên psîkolojîk dikşînin (Armenian,1989). Yan malbatên xizan jixwe li ser sînor in û şer bi dafekê wan ji sînor dibihurîn e, yan jî malbatên halê wan xweş derfetên wan bêhtir in da ku xwe ji tesîrên wêranker ên şîddeta siyasî xilas bikin.

Ji ber têkiliya di navbera malbata jê nayê xwe li ser xwe bigire û bêkêr, û statuya jêr a civakî-aborî de, ku mirov dikare di civaka kurd de jî çavdêriya wê bike, zarokên kurd ên ji beşên xizan ên civakê jî li hemberî bandora şer, tehlûke û şîddetê nazik û hesastir in. Lêkolînên cihê ji welatên cihê yên weke Filîpînan (Protacio-Marcellino, 1989), Afrîka Başûr (Liddell, et al., 1993) û Bakurê Îrlanda'yê (McWhirter et al., 1983) nîşan didin ku tiştên "besîttir" yên weke înflasyon û xizaniya giştî para bêhtir, zêdetir bandorê li zarokan û bi vê ve girêdayî jî li malbatan dikin.

Şerê leşkerî yê Tirkiye'yê li dijî kurdan, xirakirina gundan û şîddeta siyasî ya her çû tûj û dijwar bû heta dawiya salên 90'î binesaziya herêmên kurdan hema hema bi tevahî tine kir. Di serdema Saddam de rewşeke bi heman rengî li Başûrê Kurdistan'ê hebû. Ev yek hem di warê derûnî hem jî di warê fizîkî de li malbatan dibe bar, zorê li wan dike. Weke mînak xirakirina avahiyên wek nexweşxane û dibistanan tenduristiya zarokan a fizîkî dixiste tehlûkeyeke zêdetir. Li hin herêmên Kurdistan'ê serê bijîşkekî 10 hezar mirov dikevin. Di rewşeke bi vî rengî de doktor nikare bi tenduristiya hemûyan re eleqedar bibe. Di rewşên herî xirab de dibe ku jiyana zarokan weke mînak ji ber neparastîbûyîn, lawaziya ji ber têrnexwarinê û kêmasiya xizmeta tenduristiyê bikeve tehlûkeyê. Ev jî ji aliyê xwe ve dikin ku zarok li hemberî nexweşiyên besît yên wek zikçûyîn, nexweşiyên bêhndanûstendinê û yên zarokan qelstir bin. Ev her wiha dibe sedem ku rêjeya mirina zarokan jî zêde bibe (Armenian, 1989).

Jiyana malbatê û şer

Dema mirov di şert û mercên normal de girîngiya malbatê ji bo mezinbûn û gihiştina zarokan li ber çavan bigire, hingî bandora şîddetê li malbatê di beridîna zarokatiyê de hêwatekî gelekî girîng e. Li cihê ku şîddet ji radeyeke diyar bihurî, li wir dibe ku jiyana malbatê were ber jihevdeketinê, hilweşînê. Weke mînak îşaret hene ku nîşan didin rejîma Pol-Pot'ê bi zanîn û bi qest hewl daye malbatan ji hev de bixe (Ressler, et al., 1988). Di civaka kurd de her rejîma kurd li ser erdên wê dimînin, yekser bi riya eskeriyê û neyekser bi girtin û/yan jî kuştina dêûbavan yan jî bi jicihûwarkirinê gihişte heman armancê. Mirov bi tenê nayên kuştin, bi xirakirina gundan û bi darê zorê jicihûwarkirinê çanda civakê ya hevpar a sedsalan jî tê tinekirin. Ji bo pêkanîna kontrola tevahî, perwerde û çand bi şîddetê yan tên guherandin yan jî wêrankirin.

Di rewşen din de, nexasim dema zext û zor kronîk be û ne aktuel û demî be, jiyana bi şîddet û tehlûke dibe ku girêdan û têkiliyên malbatî xurttir û zexmtir bike. Dema endamên malbatê tevlî nav refên gerîla bibin, werin girtin yan jî kuştin, hingî girêdana bi hevdu re û pişgiriya malbatî bihêztir dibe. Raporên ji civakên cihê yên wek Filistîn, Kamboçya û Kurdistan'ê destnîşan kirin ku rola li gorî rêûresmê ya malbatê tevî rewşa aborî ya nebaş û şertên jiyanê yên nebaş, dibe ku bê parastin (Kızılhan, 2004). Di nava van şertan de malbat dîsa jî hewl didin derdora ji bo gihiştin û mezinbûna normal a zarok pêdivî pê heye, biafirînin û pêşkêşî zarokan bikin.

Dema şîddeta siyasî dibe sedem ku bav yan jî wê ji zarokan qut bibe, ev yek dikare bibe sedema zirarên mezin ên li tevahiya mabatê dibin û her wiha mumkin e bibe sedema barkirin û/yan jî revê. Rewşên eleqedarî şiddeta siyasî her wiha gelek caran dibin sedem ku para bêhtir mêr, endamên malbatê ji ber sedemên cihê di şerê siyasî yê demdirêj de li aliyê muxalefetê, yan jî di warê leşkerî di nava refên gerîla de cih bigirin. Di rewşeke bi vî rengî de tesîreke gelekî bihêz û xeternak dikare li malbatê bibe. Ev yek her wiha bandorê li rola malbatê ya destekkirina endamên xwe yên ciwan jî dike. Ji ber van sedeman di civakan de ku şer dikin yan jî di rewşeke wek şer de ne, malbat bêhtir ji aliyê jinê ve tê rêvebirin û dayik bi serê xwe divê xwe bide ber barê berpirsiyariya ji bo malbatê. Di van rewşan de dibe ku dayik hem bibe 'ya ku têr dike'û hem jî 'kebaniya malê', bi ser de jî ew di vê demê de hewldide di navbera zarokên xwe û tesîrên dinya derve de weke hêmana tewazûnê bi bandor be. Carinan jî ne ji wê û ne jî ji bav tê ku li vî rolî rabin, ji ber vê jî zarokên temen mezin berpirsiyariya ji bo xwîşk û birayên xwe yên temen piçûk digirin ser xwe.

Şîddet weke rêbaza perwerdeya zarokan

Li gelek dewletên otorîter yan jî dîktator bikaranîna şîddetê hê di dibistana destpêkê de parçeyek ji sîstema perwerdeya dibistanan e. Mamoste li zarokan dixin û wan dax didin. Piraniya dêûbavan newêrin xwe biparêzin yan jî van pêkanînên şîddetê ji bo ku zarok fêrî dîsîplînê bibe weke pêwîst dibînin. Dê û bavên van zarokan jî xwediyê heman tecrûbe û serboriyan in û lewra jî ti nakokî li ber çavên wan nakeve. Bi ser de jî herî dereng ferdên mêr paşê di dema eskeriyê de lêdanê dixwin û muameleya xirab bi wan re tê kirin. Bi vî awayî ev bikaranîna şîddetê di tevahiya civakê de dibe xwedî cihekî qehîm (Kızılhan, 1995). Di rewşên şer de şêwêyên şîddetê zêde bi tehlûke ne û bi vî awayî bandorê li tevahiya civakê dikin. Dîsa jî ji Lubnan û Bakurê Îrlanda'yê hin rapor hene (Bryce et al., 1986) ku dibêjin, şîddeta siyasî dibe sedem ku dêûbav awayê otorîter ê mezinkirina zarokan bibijêrin; li gorî van raporan dayikên ji ber şer depresîf bêhtir li zarokên xwe dixin.

Bandora şer li ser nifşan

Nexasim jî lêkolînên li ser qirkirina cihûyan dikarîbûn bi awayekî zelal nîşan bidin, ka çawa heta bi sê nifşan, hem zarokên gunehkaran hem jî yên mexdûran misêwa bi rabihuriya pêşiyên xwe re mijûl û eleqedar dibin. Lêkolînên din li ser çanda kollektîf (Assman, 1989), dîroka devkî (Kızılhan, 2008) û bîra otobiyografîk (Strube, 1992) nîşan didin ku nifşên paşê tên bi zanîn ya jî ne bi zanîn bi serborî û tecrûbeyên xwe yan jî nifşên beriya xwe re mijûl û eleqedar dibe. Soloman (1993) bi lêkolîneke demdirêj a ezmûnî (longitudinal study) ya bi 44 kesan re nîşan da ku zarokên herî kêm aliyekî dêûbavê wan yê ji felaketê xilasbûyî, PTSD'yek (Xirabûna stresê ya piştî trawmayê) bi wan re çêdibe û nîşanên wê jî demeke dirêj dewam dikin. Gelek pirsgirêkên civakî yên mirovên ji qirkirinê xilasbûyî hem reaksi-

*Prof. Dr. Ilhan Kızılhan, Instîtuya Lêkolînên li ser aştiyê – Rojhilata Navîn, Cooperative State University BW, Universität Freiburg, xebatkarê koma projeya Pirsgirêkan û aştiyê li zanîngeha Konstanzê, nivîskarê gelek lêkolînên li ser hindikahiyên etnîk li Rojhilata Navîn û li ser posttrawmatalojiyê, şêwirmendê zanistî ji bo gelek kanalên televizyon û radyoyê, ji bo dadgeh û saziyên din ên dewletê zilamê pispor, psîkolog, doktorê civakê, psîkoterapîst.

ı (Derîye bihûştê)

yonek e ku didin şoka ji civakeke watedar qutbûnê û hem jî serencama felaketê bixwe ye.

Endamên rêxistinên çepgir li Hindistan û Pakîstan'ê sala 1996'an ji min re gotin, gelek zarokên wan paşê gihiştine rêxistinên dewletê da ku şerên wan bikin. Ev zarok ji aliyê dêûbavan ve nehatine mezinkirin, li cem malbatên li nêz hatine bicihkirin. Ya ku dihat şîrovekirin ev bû ku zarok li dijî xemsariya dêûbavan û lidervehiştineke bar û bandoreke hestan a giran şer dikir.

Civakîbûna di nava civakê û malbatê de dikare bi riyeke gelekî aqilane û narîntir jî pêk were. Ewqasî narîn ku gelek caran zehmet e heta ne mumkin e ku mirov nikare wê bişopîne. Weke mînak li Afrîka Başûr u li Kurdistan'ê navê rêberên siyasî li zarokan tê kirin (Dawes, 1990, Kızılhan 2004). Ev awayê navlêkirinê ji bo zarokan kirineke siyasî-sembolîk e û mumkin e ji jidayikbûnê û pêde bandoreke mezin li nêrînên zarokan ên siyasî bike. Eger yê navê wê/wî bi zarokekê/î hatî hildan yeke/î gihiştî û rêzdar be ku niha yan jî ji mêjve di rêxistineke çekdar de çalak e yan jî di têkoşîna azadiyê de xwedî erk e, hingî dibe ku ew ji bo zarok bibe şêwe-rolekî xurt. Ji ber ku navlêkirina zarokan mînakeke ji bo şeweyê aqilane û narîntir ê civakîbûnê ye ku mirov bi rastî jî dikare çavdêriya wê bike, pêdivî bi lêkolînên din heye. Hemin ne rast e mirov yeqîn bike malbat yekane kirdeyên çalak ên civakîkirinê ne di nava civakê de, ku têde zarok dikevin nav şîddeta siyasî.

Kurd ev bi sedsalan yan jî dehsalan e ku bi awayekî mayînde û misêwa bi xetera şîddet û êrîşan re rûbirû ne. Weke mînak heta niha ezmûna wan çênebûye ku li cihekî gelek nifş di nava ewlekariyê de bijîn yan jî ewlekariyekê ji bo xwe û malbatê hîs bikin. Mirov yekser an jî neyekser di nava şerekî de ne ku her roj xizm û nasên wan tên kuştin, girtin yan jî neçar in cihûwarên xwe biterikînin. Bûyerên xedar û hovane yên wek qirkirina kurdan di demên bihurî de birînên kûr ên trawmatîk li dûv xwe hiştin. Bi vî awayî bi tenê di qirkirina Enfalê de sala 1988'an li Başûrê Kurdistan'ê bêhtirî 186 hezar kurdî bi awayekî sîstematîk ji aliyê rejîma Îraq'ê ve hatin qetilkirin, heman rejîmê bi awayekî sîstematîk 4.000 gund jî valakirin. Li gorî daneyên rêxistina mafê mirovan Middle East Watch'ê ji Sibata 1988'an heta Îlonê herî kêm 50 hezar mirov û bi îhtîmaleke mezin jî 100 hezar mirov hatine qetilkirin. Ev bûyer di bîra kollektîf a civakê de cihê xwe digirin û bi awayên cihê yên weke serhatî, tabû, merasîm, rêûresm û nirx û pîvanên nû ji nifşekî derbasî nifşê din dibin. Ev bûyer di heman demê de bandoreke mezin li biryar û helwestên siyasî yên rêberên kurd dikin.

Encam

Teza sereke ya vê gotarê ev e, dema şerek diqewime (çi demdirêj çi demkurt) ev dibe hêwatekî diyarker ê civakê û strûktûrên civakîbûnê jî xwe diguherin. Lêkolînên klînîk nîşan dan ku derdoreke ewle, têra xwe zad û qût û guhdariya tibî ya têrker çiqasî girîng be jî, dem bi serê xwe "birînên ruh (derûnî)" yên ferdan û civakê nakewîne û derman nake.

Di babeta civaka kurd de ya em pêre mijûl ew e ku ji bêhtirî sedsalî û virve dema aştiyê ya temenê nifşekî ajotî, çênebûye. Sedsala bihurî ji bo kurdan misêwa bi şer û şîddetê ve girêdayî bû. Lewra civaka kurd bi pirsgirêkeke ku heta niha qet nehatibû pêşiyê re rûbirû ye; di navbera daxwaza parastina nirx û pîvanên dîrokî û xwe li dinya global ya her diçe piçûk dibe vekirinê de maye. Wisa xuya dike ku girîng e li welatên lê ne ji bo berjewendiyên tevahiya Rojhilata Navîn kurd bi aliyên pirsgirêkê re ji bo çareseriyên siyasî hewl bidin, dawiyê li bikaranîna şîddetê bînin. Ev bang ne bi tenê li aliyên pirsgirêkan e, tevî derfetên wê li civaka navneteweyî ye jî.

Ev nîvîs ji bo Le Monde diplomatiquê kurdî hatiye nivîsandin.

Wergera ji almanî
Lokman Turgut

Xelekên herî lawaz ên civakekê ango jin û zarok, herî zêde dibin mexdûr. Lewra em dibînin û çavdêriya wê dikin ku ji 10 salan û virve li herêmên kurdan hewldanên xwe kuştinê û întîharên pêkhatî ji tevahiya pîvanên rêjeya xwekuştinê yên navneteweyî bihurtiye. Sedema vê çiqasî pirsgirêkên ferdî bin, ewqasî jî û heta beriya her tiştî guhertinên aborî, civakî û çandî ne, yên ku şer bûye sedema wan. Li Başûrê Kurdistan'ê ya darî çav ew e ku "ketineke ber bi jor ve" heye. Pêşketina bi lez a aborî, tevî halxweşiyeke diyar a heta radeyekê dema bi daxwaz û pêdiviya gel a dehsalan a ji bo azadî û dewlemendiyê re dibe yek, rê li ber guhertineke civakî ya erka xwe nikare bi cih bîne û gelekî dramatîk vedike.

Çavkanî

Armenian, H. K. (1989) Perceptions from epidemiological research in an endemic war. Social Science and Medicine (bi awirê lêkolîneke epîdemiyolojîk şerekî herêmî. Zanista Civakî û Tib), 1989, 7, 643-7.

Bar-Tal, D. (2000). Die Kultur der Gewalt (Çanda şîddetê). In ÖSFK (Edîtor), Konflikt und Gewalt. Ursachen- Entwicklungstendenzen-Pespektiven (Pirgirêk û şîddet. Sedem-Meylên pêşketinê-perspektîf), rûpel. 66-81. Münster: Agenda.

Bryce, D. & Walker, N. (1986). Family functioning and child health: A study of families in West Beirut. Final Report (Kêrhatî karkirina malbatê û tenduristiya zarok: Lêkolîneke li ser zarokên li Fojavayê Beyrûd'ê. Rapora dawiyê), Kanûn 31, UNICEF.

Dawes, a. and Donald, D. (1994) Understanding the psychological consequences of adversity (Fêmkirina encamên psîkolojîk ên zorî û bextreşiyê). In: A. Dawes and D. Donald (Edîtor), Childhood and Adversity: Psychological Perspectives from South African Research (Zaroktî û bextreşî: perspektîfên ji lêkolîna Afrîka Başûr). Cape Town: David Philip.

Kızılhan, I. (1995). Der Sturz nach oben. Eine psychologische Studie über Kurden (Ketina ber bi jor ve. Lêkolîneke psîkolojîk li ser Kurdan). medico international Frankfurt.

Kızılhan, I. (2004). Sozialisation im Krieg (Civakîbûn û şer). In Sommer und Fuchs (edîtor). Handbuch der Kriegs- und Friedenspsychologie (Pirtûka dest a psîkolojiya şer û aştiyê). Weinheim: Weşanên Beltz (rûpel 357-368).

Kızılhan (2008). Handling of traumatic events with soldiers with war-experiences (Jiheqî bûyerên trawmatîk yên bi eskerên şer dîtî re derketin). Journal of Psychosomatic (Îran) 2008/2,20-32.

Liddell, C., Kemp, J. and Moema, M. (1993) the young lions – South African Children and youth in political struggle (Şêrên ciwan – di têkoşîna siyasî de zarok û ciwanên Afrîka Başûr). In: L. Leavitt and N. Fox (Edîtor), The Psychological Effect of War and Violence on Children (Bandora psîkolojîk a şer û şîddet li zarokan dike). Hillsdale, N. J.: Lawrence Erlbaum.

McWhirter, L; Young, V. & Murray J. (1983): Belfast children's awareness of violent death (hayjêhebûna zarokên Belfastê ji mirina bi şîddetê). British Journal of Social Psychology, 22.

Protacio-Marcelino, E. (1989) Children of political detainees in the Philippine: sources of stress and coping patterns (zarokên girtiyên siyasî li Filîpînan: çavkaniyên stresê û hêmanên jiheqîderketinê). International Journal of Mental Health, 18, 1, 71-86.

Ressler, E. M., Boothby, N. and Steinbock, D. J. (1988) Unaccompanied Children: Care and Protection in Wars, Natural Disasters, and Refugee Movements (Zarokên bêrefaqet: guhdan û parastin di şer, felaketên xezayî û tevgerên penaberiyê de). New York: Oxford University Press.

Solomon S.D., Bravo M., Rubio-Stipec M., Canino G. (1993). Effect of Family Role on Response to Disaster Journal of traumatic Stress (Bandora rola malbatê weke bersîva ji govara Disaster Journal of traumatic Stress re), 1993, berg 6, n° 2, 255-269.

REWŞA RAGEHANDIN Û PROSEYA SIYASÎ LI KURDISTAN'Ê

Stratejiya Hikûmeta Hewlêr'ê ya medyayê nîne

DR. JOHN HOGAN & PROF. JOHN TRUMPOUR*

Edmund Burke dibêje, di parlamenê de sê desthilat hene, lê di galeriya nûçegihanan de desthilata çarem dirûn e ku ji hemûyên din girîngtir e. Desthilata çarem ne rewanbêjî yan gotineke nesteq, belku faktoreke wêjeyî ye û di dema niha de ji me re pir girîng e. Li parlamenên me edebiyat pêk hatiye. Çapemenî, ku di encama nivîsînê tê rojevê, pir car hevtayê demokrasiyê ye. Eger nivîsînê biafirînin, bêguman demokrasî jî çêdibe (1). (Tomas Carlyle)

Dema ku di sala 1898'an de Mîqdad Bedirxan hat sirgûnkirin, li Qahîre'yê yekem rojnama kurdî bi navê 'Kurdistan' weşand. Wî ji surgûnê peyama wêya ragehand ku kurd ji bo berhemanîn û avakirina civakeke siyasî, bi xwe girîngiya teknolojiya ragehandin ê fêm dikin. Di vî karî de jî, Bedirxan û rojnama wî berdewamî dan tradisyon û adeteke kevin. Pirsa komînaksyon – axavtin û rewanbêjî – aliyê kêm ji serdemê Roma û yûnaniyan, cîheke taybet di lêkolîna felsefî û siyasî de dagir dike. Wêya ku ji nêz ve peywendî bi wê behsê heye, pêkhatî ye ji hizra "komara fazîlet/bîrdoza dewleta baş li gor Eflatûn", ango wêya ku di pêvajoya mirovahiya sivîl a renesansa Îtalya vejiya û piştre jî li şoreşên Amerîka û Fransa'yê careke din serî hilda. Li vir, xuya dibe ku berpirsyariya xelkê ketiye ber zext û zordestiyê da ku gotûbêjan bikin, bi hûrî bala xwe bidin û di jiyana giştî û karûbarên dewletê de beşdariyê bikin.

Modela demokrasiyê ku bajarên kevnar ên Roma û Atîna'yê geşkir, di civîna xelkê de ligel jimareyeke kêm ji nûnerên wan pêk hatibû ku têde komek proseyên eşkere yên çêbûna biryaran û encamên wan axavtinên siyasî dadirêjin. Vir nêzîkbûna welatiyan mercê sereke yê beşdariyeke aktîv û çeleng di gotara siyasî û prosa biryardanê de ye. Lê demekê ku gel belawela dibe, wê demê hêviya daxuyaniya giştî û çêbûna biryarê û tevger û peywendiyên rûbirû û çalak ji nav diçe. Xuya ye ligel serhildana rojnamegeriyê û zêdebûn û geşekirina xwendewariyê, rewşeke erênî çêbûye bo jî hev nêzîkkirina alîgirên wê newewê û ew miletên ku di warê demografî de belawela bûn. Vê rewşê ew alîgir di peywendiyeke rasteqîne de kom kirine. Bendict Anderson (2) di vekolîna xwe ya derbarê nasyonalîzmê de, bawer e ku rojnamevaniyê roleke girîng di prose ya tunekirina herêmparêziyê de lîstiye, vê yekê jî bi rêya hişyarkirina xwendevan ji cihên xwe ên demografî, ku wek yek ji tuxm û bingehên avakirina netewe tê hesibandin. Ji xeynî vê, rojnamegeriyê roleke mezin heye di dûbare bihev re girêdan û ji hev nêzîkkirina encamên civakê de. Diyar e her wêya jî bûye sedem ku bandor kiriye ser nerînên ravekerê navdar yê civakî Tomas Carlyle, ku bala me dikşîne ser navbereke dirêj a peywendiyên di navebra rojnamegerî û hikûmet û civaka siyasî û "komara dewleta baş" de.

* Dr. John Hogan li Beşa Yasayê ya Zanîngeha Harvard a Amerîka vekolerê Verthaymê ye. Dr. Trumpour, li Zanîngeha Harvard a Amerîka profesorê beşa yasayê ye.

Rojnamegerî wek desthilata çarem

Piştî hilweşandina rejima Saddam Husên, di Kurdistana Îraq'ê de ragehandin bi awayekî berfireh vejiya ye. Li gor agahiyên heftenama Rûdaw, niha 901 rojanme û govar û belavok li Herema Kurdistan'ê tên weşandin (3). Ev yek destkevfteke mezin e. Lê gelo encama vêya li ser siyasetê çiye?

Di demekê de, rojnamegerî wisa hatiye pênasekirin ku sedemeke girîng yê veguhastina zanyariyan di hundirê civakê de ye, wêya tiştekî bêwate ye ger wiha bihesibînin ku desthilatê peywendî bi van pirsan re tuneye. Fîlozofê siyasetê Edmund Burke, demek zêde beriya niha dûbare kiriye ku pêwîst e rojnamegerî xwe wek desthilatê bihesibîne: Desthilata çarem di cîhana siyasetê de (4).

Bi awayekî zelal û vekirî, rojnamegerî dikare mîna pirekê di navbera hikûmet û xelkê de be, bi awayekî xizmetê bike ku alîkariyê bide mekanîzmên zelalî û berpirsyariya hikûmetê. Diyar e desthilat tenê ne di biryardan û kirinên serokên siyasî de ye, belku takekes yan grûb jî dikarin sînoran ji bo biryardan derbarê pirsên girîng danînin, wêya jî bi rêya bandorkirin li ser nirxên civakî û proseyên siyasî û adet û kevneşopan çêdibe. Herwiha dikare desthilat di asta wê karînê de jî bo xuyakirina wêya ku 'Schattschneider (5)' wek tevgereke alîgiriyê ango "Mobilization of bias" cîbicî bibe, ango çêkirin û xurtkirina wan kospan ku rêya pirsgirêkên siyasî digrin. Ew desthilat ji aliyê Bachard û Baratz (6) ve wek desthilata ne biryardanê – desthilatek ku bikare biryarê bide - hatiye pênasekirin. Herwiha 'Steven Lukes' (7) ku wek yek ji şarezayên nûjen ên bîrdoza desthilatê tê hesibandin, behsa wêya dike ku desthilat bingeha sêyem heye û pêwîst e em jê fêm bikin, ew rehend û bingeh jî pêkhatî ye ji şiyana darêtina têgih û nerînan, têgihiştin û hêviya wê çendê ku 'goriyê' desthilatê stoxwarbûna xwe di hundirê berhemê de bikar tîne ji bo ku bandorê bike ser ciwanan, ligel wê rêzbendî û ajanda siyasî ya ku li pişt wêya hatiye pênasekirin û berevajî berjewendiyên wêya ye jî.

Rola rewşenbîran

Fehmkirin ji rojnamevaniyê û pêşkêşkirina wê bi awayekê hêja û jêhatî erkê hemû welatiyekê ye. Lê wêya berpirsyariyek e ku bareke giran dixe ser milê rojnamevanên cidî û hemû kesên ku propaganda wêya dikin ku 'rewşenbîrên gel in, rewşenbîrên xelkê û sivîlan in.' Ew girîngiya bi rojnamegeriyê hatiye dan, rewşenbîran dixe nav berpirsyariyeke mezin, bi taybet jî di çarçoveya proseya avakirina neteweyê de. Her wek Anthony Smith dibêje: "Rewşenbîran têgih û zimanê netewe û nasyonalîzman afirandine (8) ... herwiha deng bexşîne wan îham û hêviyan ku wan di îmaj, efsane û sembolan de anîne ziman. Di vî warî de, nivîsarên Paulo Freire derbarê stratêjiya fêrkirin û zanîna çewisandiyan girîng e, hevta ligel gotûbêjên Michel Foucault bi Gilles Deleuze re, demekê Foucault radigehîne: "Sîstemeke desthilatê heye ku wê axavtin û zanînê red dike, hêzek ku tenê di desthilata sansorkirinê de derdikeve, belku wêya ku gelek bi kûrî û dijwarî diçe hundirê hemû torên civakî. Rewşenbîr bi xwe alîgir û girêdayî sîstema desthilatê ne... îdeolojiya berpirsyariya wan beramberî zanebûn û axavtina beşek ji wê sîstemê ye (9)."

Helbet şaş e ger hevkariya wan rewşenbîr û rojnamevanan bi aliyekê bê dan ku bi sedema xwe perwerdekirin û kursa hînkirinê şarezayî û têgihştineke kûr ji bo xuyakirin xwestekên welatiyên xwe bidest anîne. Lê tiştekî bi fêde û sûdwar dibe ger em axavtinên zanayan bi hişyarî û hûrî bistînin û zanînê jî bi ruheke sade û bê fêz û serxwereçûn û bi berçavgirtina bandora wan li ser xelkê bînin ziman.

Xaleke girîng di serdestbûna rewşenbîrî di axavtina giştî de pêkhatî ye ji geriyan li pey danûstanan. Ji ber ku dibe daxistina gotûbêjan gaveke metirsîdar be. Her wek dîrokzan 'Christogher Lasch' yê rexnegir dibêje, erkê girîng yê ragehandina azad ne dana zanyariyan e, belku pêşkêşkirina pirsên jêhatî ye. 'Lasch' dibêje: "Wêya ku demokrasî pêwîstî pêre heye, pêkhatî ye ji danûstandin û guftûgoyên giştî yên çalak, ne tenê pêşkêşkirina zanyariyan. Bêguman zanyarî jî pêwîst e, lê tenê bi rêya gotûbêj û diyalogê dikaribe wê corê zanyariyan ku hewce ye, derkeve rojevê. Em nizanin ku pêwîst e em çi bizanin da ku pirsên hêja û guncaw nekin, demekê jî pirs rast derdikeve ku em hizrên xwe derbarê cîhanê bixin pêşberî raya giştî (10)."

Pirsgirêka bêrê û gendeliyê

Yek ji nîqaşên ku di rojeva rojnamegeriya kurdî de ye, pirsgirêka bêrê û gendeliyê ye. Li gor nivîskar Marcus Daniel: "Riswakirin û kêm exlaqî" peywendî bi çêkirina kultûreke beşdarker (Participatory) û demokratîk (11)." Lewra heta qasekê di rewşa demokratîk de, hebûn û xistine rojeva kêm rewiştî û riswayî di rojnamegeriyê de tê çaverêkirin, lê wêya di stoyê dezgehên medyayê de ye ku tevger û exlaqên xerab bi nerîneke bêalî û rast û durist bixin rojevê, ne wiha bidin xwiyakirin ku hemû milet di bê rewiştiyê de winda bûye. Eger bêrê û gendelî fenomeneke serdest be, wê demê pir tiştên din jî heye ku pêwîst e girîngî jê re bê dan; ger em bi awayekî ne hûr û berfireh binerin gavên pêşkevtin û bicîhhatina aştî û geşekirina Kurdistan'ê, xwiya dibe gavên baş ber bi pêş hatine avêtin û hêjayî amajedanê ne û em hest dikin ku pirsgirêka bêrê û gendeliyê tenê ne pirsgirêka rasteqîne ya civata kurdî ye. Hin mijarên din ên zêde jî hene ku divê ciheke berfireh di rojnamevaniya kurdî de bigrin, aliyê kêm pirsa jinê û pêgeha jinê di civakê de hevta ligel pirsgirêka berdewamiya kuştin û tawanên bi navê şerefê.

Demekê rastiya Herema Kurdistan'ê û siyaseta kurdî bi tevahî wek bêrê û gendel û tûşbûyî bi bêrêtiyê were nîşandan, dibe raya giştî ya cîhanê ber bi aliyê parçe parçebûna herêmê û dûbare sepandina desthilatdar û desthilatdariya biyanî biçe, bi hêceta wêya ku kurd gendel û bertîlxur in û şiyana wan a xwe rêvebirinê tuneye.

Temaeşkirina kurdên dîasporayê wek biyanî

Em wek çavdêrên biyanî, bala xwe daye wêya ku beşdarîkirina wan kurdên ku li dîaspora vedigerin, di proseya siyasî ya kurdî de pirseke giştî a bê bersiv aniye rojevê. Ango ew kurdên dîaspora ku vedigerin, ji dêlva handan û hevkarîkirinê, di medya kurdî de rûbirûyê nerîneke neyînî dibin. Diyar e Kur-

distan tenê ne cîhek e ku tirsa vegeriyana kesên ji dîasporayê heye: Bo mînak Pakistan'ê gelek hewlda ku penaberên koçkirî venegerin. Herwiha burokrasiya Çîn'ê nîqaş dike ku gelo ew grûba ku wek 'kûsiyên deryayê' binav dike, hêjayî wêya ne ku vegerin û berpirsyariyên bilind di sazî û dezgehên Çîn'ê de dagir bikin. Bi giştî gumankirin ji 'biyaniyan/mişextiyan tiştekî çaverêkirî ye û girîng hatiye hesibandin. Bêguman, yên ku bandor li ser raya giştî hene, haydarê azmûna nişextiyan û rojnamegeriya kurdî ne – lê divê bîra me neçe ku yekemîn rojnama kurdî ji aliyê rewşenbîrekî kurd yê mişextî li dîaspora hatiye weşandin. Dîrok û tevgera azadîxwaziya neteweyî û civakî derbarê beşdarîkirina dûrxistiyan tijî nimûneyên wiha ye. Herwiha dîrok tijî ji wan rêjîm û sîstemên qirker e ku xemsarî nekirine kesayetî û serkirdeyên herî xwedî şiyan û behremend ên milet bikin armanc û wan qir bikin yan neçar bikin ber bi dîaspora biçin. Lê heta niha jî gumankirin ji wan kesên li dîaspora dijîn, tiştekî berçav e û vêya di ragehandin a kurdî de reng vedaye. Kesekî wek Prof. Dilawer Elaeddîn ku di kabîneya nû ya Hikûmeta Herêma Kurdistan'ê de posta Wezîrê Xwendina Bilind wergirtiye, bi azmûn, şarezayî û jêhatîbûna xwe dikare bandoreke baş bike ser Kurdistan'ê û civaka kurdî. Pêwîst e kesayetiyên wek wî bên handan û alîkarî bi wan re were kirin ji bo serxistina ajandaya wan, nek stegmatîz bên kirin. Ev rewş diyardeya herêmçîtiyê dide xwiyakirin ku her wek Martin Van Bruineseen (12) amaje jê re kiriye, qala pêkhata civakî ya kurdî dike ku awayê siyaset û civaka kurdî rêve dibe. Gelo vêya şêwazê herî baş a pêşdeçûnê ye ji bo neteweyekê ku bo gelek salan di dîrokê de li rewşa pêşketinê hatiye bêparkirin û kesayetiyên xwedî şiyan û zana tûşî qirkirin û koçberiyê bûne, neteweyek ku bi komek dewletên dijminkar hatiye dorpêçkirin? Eger Mîqdad Bedirxan biketa pey lojîkeke gumankirin ji mişextiyan, dibe kurd neçar bûyana demeke dirêjtir bo derketina yekemîn Rojnama kurdî û çûn bo nav cîhana nûjen çaverê bikirana.

Ahmet Gümüştekin (Mem û Zîn)

Pêwîstiya buroyeke taybet bo ragehandina hikûmetê

Hikûmeta Herêma Kurdistan'ê dikare derbarê wan xemsarî û kêmasiyên ku hatine destnîşankirin, alîkariyê bide ragehandin ê. Bi taybet, her wek şarezayê warê ragehandin a kurdî, Hîwa Osman, amaje jê re kiriye: "Pêwîst e hikûmet buroyên ragehandin ê û behreya berdevkên xwe xurttir bike ji bo piştrastbûn bi wêya ku zanyariyan digihînin xelkê (13)."

Di demekê de ku li Kurdistan'ê, kanalên ragehandinê di bin desthilata partiyên siyasî û piraniya siyasetvanan de ye û rasterast di bin rikêfa wan de ne yan xwediyên wan in, lê di deman demê de xuya û eşkere ye ku li Kurdistan'ê hikûmetê ne stratejiyeke navendî derbarê medya de heye û ne buroyeke taybet bi ragehandin ê jî heye. Hebûna buroyeke taybet bi medyaya hikûmetê girîngiyeke zêde ji bo rêveberiyeke demokratîk a nûjen heye; gelek ji hikûmetên cîhanê ew corê ofîsan hene. Avakirina beşa ragehandin a hikûmetê li Kurdistan'ê gelek bi feyde ye. Herwiha buroyeke bi vî awayî ji bo rojnamevan jî bi fêde dibe û dikarin wek navendeke peywendîkirin û peydeçûn û lêkolîn û geriyan li pey mijar û herwiha ji bo pirs û destkevta bersivên rast û rewan bikar bînin. Ji bo hikûmetê jî fêdeya dezgeheke navendî ya taybet bi ragehandin ê di vê çendê de ye ku nûçe û çîrokan rasterast û bi lezgînî bigihe rojnamevanan. Bêguman vêya jî zelalî û ruha berpirsyarbûnê pêş dixe û xurt dike. Dikare liv û tevgereke profesyonel û zanayane derbarê nûçe û bûyeran çêbe û pêvajo were pêşdebirin. Herwiha bi sedema pilandanîn û tevlibûn bi sîsteme tomarkirin ya baş, hikûmet dikare bi bidestxistina zanyariyan ji rojnamevana fêdeyê bistîne, ew zanyariyên ku divê ji bo pêşdebirina kar û rêvebirina hikûmetê bên bikaranîn û herwiha wek pireke peywendiyê jî bo nêzîkirina hikûmetê û xelkê were bikaranîn.

Rewşa rojnamegeriya dijwar û nebaş dibe sedema wêya ku 'atmusfereke giştî' ya kemilî û aktîv – li gor Jurgen Habermas – çênebe. Ango di rewşeke wiha de derfet û qada 'axavtinekê' ku dibe sedema veguherîna nerîn û fikran û xwiyakirina dîtin û nerîna xelkê, pêk nayê. Li vir, her wek Michael Roberto ku şagirdê Maks Weber bûye, dibêje, hejarî û xizaniya xelkê di warê ragehandin û bidestnexistina zanyarî û zanînê de, dibe sedema bêfermanîkirina xelkê ji bo desthilata Orlgakî (14) ango desthilata kêmaniya dewlemend bi ser piranî de. Nabe ji vê rewşê re wek yasayeke reha ya dîrokî were temaşekirin; dibe gelek asteng li pêşberî beşdarîkirina xelkê di ragehandin a siyasî û prosa demokrasiyê de hebin, bo mînak veqetiyan û dabeşbûnea zêde û aloz a civakên modern û pêşketî; lê her wek di karên 'John B. Thompson', bîrdoznasê hemdem yê warê medyayê de hatiye pêşniyarkirin, rojnamegeriyê roleke sereke di çêkirina formeke demokrasiya welatîbûnê de heye (15). Di rastî de rojnamegerî sedemek e ji bo çêkirin û berdewamiya gotûbêjên cidî û çêkirina raporên hûr û berfireh û cîbicîkirina xwestekên nîştimanî û demokratîk; her wêya jî dibe sedema damezrandina 'Komara fazîlet/bîrdoza dewleta baş li gor Eflatûn'

Wergera ji soranî
Azad kurdî

Ev nivîs ji bo Le Monde dîplomatîk kurdî hatiye nivîsandin.

(1) Thomas Carlyle, 1840, derbarê qehreman û qehremanperestiyê û pehlewançîtiyê di dîrokê de.

(2) Anderson, B. (1991) Imagined Communities: Reflections on the Origin and Spread of Nationalism, London: Verso. 1991.

(3) Rojname ya Rûdaw, jimare 1, 07.07.2009, çapa Ewrûpa.

(4) In Burke□s time the three other states of the political realm were church, nobility and commoners, or in the language of today: clergy, military/political/economic elite, and masses.

(5) Schattschneider, E. E. (1960), The Semisovereign People□. New York: Holt, Rinehart & Winston

(6) Bachrach P. and Baratz M. S.(1970), Power and Poverty: 6 Theory and Practice, New York, Oxford University Press, 1970.

(7) Lukes S., (2005) Power: A Radical View, Basingstoke, Palgrave Macmillan□ 2005.

(8). Smith, A.D. (1991), National Identity, Penguin.

(9) Foucault, M. (1977). Language, Counter-Memory, Practice. Ithaca, New York: Cornell University Press

(10). 10 Lasch,C. (1995), The Revolt of the Elite and the Betrayal of Democracy, New York: W.W. Norton.

(11) Daniel, M. (2009), Scandal and Civility: Journalism in the Birth of American Democracy, Oxford University Press.

(12) Van Bruinessen, M. (1992), Agha, Shaikh and State: The social and political structures of Kurdistan, Zed Books

(13) See: http://www.ekurd.net/mismas/articles/misc2009/8/independentstate3065.htm

(14) Michels, R. (1915, reprinted 1962), Political Parties, Free Press, New York.

(15) Thompson, J.B. (1995), The Media and Modernity, Polity Press, Cambridge.

FILISTÎN

Ramallah ji Filistîn'ê gelek dûr e!

SANDY TOLAN*



Diyar e bayekî azadiyê li ser parçeyekî teng yê Perava Rojava ya dagirkirî rabûye. Piştî rakirina hin bajar û nuqteyên sihêtiyê yên li ser rêyan, şoferên filistînî, ku bêrê ji ber seknadina dûvdirêj pir zehmetî dikşandin, mirov dişê bêjê, êdî ew bê kelem ji Eriha heta Ramallah û Nablûs'a Bakurê Filistîn'ê çûn û hatinê dikin. Di vê qetîtka bê hêwa de ji erda pîroz, duxwuye ku aborî careke din bi ser xwe ve tê. Barên sabûn, rûnê zeytûnan, şînkayî, vexwarinên bê alkol û bîraya ceh, bê astengî ber bi cihên gihiştina xwe ve diçin.

Li Ramallah'ê, li navenda siyasî-aborî ya Perava Rojava'yê geşbûneke aborî û aramiyek nisbî biserketiye. Dikanên nû û bareyên tijî hatine vekirin, dilên rewşenbîrên filistînî yên bihesreta wensekê ne bi vê yekê xweş bûye.

Mirov dikare here restorantan û biniwîse, her wekî, li Orjouwan, ev bareya nû ku bûye mode li Ramallah'ê û li ser malpera xwe ya Facebook'ê wiha dibêjin; "Şevşahiyên germ û xwarina gastronomîk pêşniyardikê li her demê... Li gor xwarinên bingehîn yên medbaxa tradisyonel ya filistînî û îtalî yê, ji welatên Derya Sipî, restoranta me xwarinên me yên klasîk ji nûh ve diafirînê û tecrubeyek yekta peyda dikê..."

De vêca hûn bixêr bên girdika azadiyê, cihê ku hilbijartiyên kêfxweş, beşek watedar, lê biçûk ji civaka Perava Rojava'yê, dewlemendî û xweşiyê tamdikê. Ev filistîniyên ku ji heqareta li ser barajan, li ser rêyan û biryarên ne qanûnî ku leşkerên ciwan yên artêşa Îsraîl'ê li wan ferz dikin xelasbûne û dikarin niha hinek azadî nasbikin, bi hêsanî herin û werin û li kar û barên xwe binêrin.

Piştî rakirina dagirkeriya qismî li Ramallah'ê û li hinekî bi saya pisporên ewlekariya filistînî ku li Washington'ê perwerde bûne, Serok Mehmûd Abbas di asta jiyana beşek ji hemwelatiyên xwe de karibûye hin pêşketinên hêja pêkbîne û firset daye Îsraîl'ê ku di vê lehiya mehkûmkirinan de ya ji ber şerê li Gaza'yê îmaja xwe ji nûh ve başbikê.

Naela Khalil ku dawiya her heftiyê vedigerê cem malbata xwe ya li Balata, nêzi Nablûs'ê û di nava heftiyê de li Ramallah'ê kardikê, li buroya Rojnama Al Ayyam dibêje: "Weha ji min re duxwuye her wekî ku ez şîzofren im." Wê li ser çewisandinên mafan ku mîlîtanên Hamas'ê di zîndanên Filistîn'ê de dikin ankêtek çêkiriye.

Ji bilî Qehwe ya Aştiyê, cihêkî din yê herî baldar yê çandî li Ramallah'ê, ev rojnamevana han, depek tenik li dest, vehesî dicû û dibêje: "Pirsgirêka herî mezin ya hevalên min yê vê derê, xwe zeîfbikin e. Yê xelkê kampa penaberên Balata jî sax mayîn e."

Khalil dilehay maye li ber van avahiyên nû ku dîwarên wan cam in. Li gor wê ew bi hêviya nayif ku wê bên parastin, hatine avakirin: "Niştecihên kampan heta newêrin qatekî li xaniyên xwe zêdebikin, ji ber ku hîn bûne ku di navbera şev û rejekê de her tiştê xwe wenda bikin."

Li parê pirtir ji Perava Rojava, çûn û hatin hîn jî gelek bisînor e ji ber barajên li ser rêyan û dewriyên leşkeran.

Gundiyê ku hewlbidê da xaniyê xwe başbikê yekser bûldozerên Îsraîl'ê têne ser wî; Timî penaberên kampan dibin armanca êrîşên şevê; Hin mêtingeran berxên wan jehirdan, ava gemarî rijandin nav zeviyên zeytûnan, li rêya dibistanê yêrişê zarokên wan kirin.

Ji bo van filistîniyan, gurdika nîv-azad ya Ramallah milkê welatekî din e: "Ramallah ne parçeyek ji Filistîn'ê ye." Muhammad Abdullah Wahdan ê pîr ku cixare ser cixarê dikşînê, wiha dibînê. Ew nefreta xwe ji bo desthiladariya Filistîn'ê û ji ber asta jiyana hemwelatiyên xwe venaşêre: "Ew ne pirtir 5 ji sedî ne ji xelkê. Yên mayi 95 ji sedî zehmetiyê dikşînin."

Birêz Wahdan em vexwendin mala xwe ya ku blokek ji betonê ye, li kampa penaberan ya Qalandia, li Bakurê Quds'ê da em çayekî vexwin. Em çend sed metre ji Ramallah a dewlemend dûr in ku ji vir wek planeteke din tê xwuyakirin.

Li derve, dîwarê cidakirinê yê Îsraîl'ê bûye wek dorberê zindanê. Li gor gotinan, wê Îsraîl wî dîwarî bibê nava kampê û desthiladariya Filistîn'ê wê nikaribê ti tiştî bibêjê, li gor Wahdan dibêjê: "Vê revebiriyê ti tişt ne da me. Me ne kar heye, ne welat, ne aramî ne jî ewlekarî."

Ev demek dirêj e ku Birêz Wahdan nema êdî xwew dikê: ''Wê ti carî desthiladari nikaribê ji wî re vegerînê, ew zeviyên wî yên leymûn û zeytûnan ku ji malbata wî hatibûn stendin di dema avakirina dewleta Îsraîl'ê de, beriya şêst salan.''

Piştî ku di şer de lawekî xwe wendakir –19 salî bû û jina wî bi keçekê bi haml bû, malbatê navê ''Filistîn''lêkirbû- ew ne hewqas dilxwze ku fedekariyên nû bide ji bo rêvebiriya filistînî. Jina wî vexwarinên hênik dida me û desthiladariya Filistîn'ê tawanbar dike: "Zarokên me dixin ber agirê topan. Ev çîna taybet ya bûrjûwaziyê kesên ku têkoşiyane bikartînin. Me ev ji bo wan kir, lê wan jê feyde kirin. Dixwestin ku em bê çek fedekariyê bikin.''Anas neviyê wî yê 15 salî ye, li bin wêneyekî mezin yê apê xwe yê şehîd diaxife: ''Zarokên wan xwedî seyare, villa û şirketên têlefonan in. Wekhevî tune ye di nav kesên wek wan û yen wek me de. Ez di xaniyê ku dikê biherifê de dijîm û bavê min bi zehmetî dikarê nan û cilan ji me re bikirê"

Çima ciwanên kampê ne razîbûna xwe diyar nakin? "Wê ji we re bêjin ku em zarok in, em yên kampê ne." Hevalekî Anas, Munîr vê yekê şîrove dikê: ''Li vir qet tiştek tuneye ku em bikin, em tenê li ser înternetê lîstikan dilîzin. Baregehek leşkerî û noqteyeke kontrolê, li vir heye, nêzîkî mala min e. Leşkerên îsraîlî bi şev tên. Em kêfxweş in dema ku em diçin kafeyên înternêtê, mirov hesdike ku tiştek ji roja xwe kir ye."

Munîr wiha dibêje: "Hêrsa me tev depresiyonê guvaştiye." Dibe ku rojekê we ev hêrs şiyar bibe û bide der: "Xelk dibêjin ku ew westiya ne û tişta ku wê wan azad bikin ne kevir in."

Wergera ji fransî
Şergo Omar

** Profêsora li Annenberg School for Communication and Journalism li Zanîngeha Kalîforniya ya Başûr, danera The Lemon Tree: An Arab, a Jew, and the Heart of Middle East, Bloomsbury ye, Londres 2006.*

WELATÊ ŞER DI MANIÈRE DE VOIR DE

"Afganîstan a ku nayê bidestxistin"

Hejmara dawî ya "Manière de Voir" dosyayeke gelekî balkêş li ser mijara Afganîstan'ê amade kiriye. Yekem nivîsa Stephen Hugh Jones behsa Afganîstan a di salên 1965'an de tûşî şerê navxweyî hatibû dike. Hingê Afganîstan welatekî tampon ê di navbera Yekîtiya Komarên Sosyalîst a Sovyet û Welatên Yekgirtî yên Amerîka'yê de bû û qebûl nedikir di hevgirtinên li dijî Sovyetan de cih bigire. Darbeya leşkerî ya komarxwaz li dijî Melîk Zaher Şah ji aliyê Prens Mohamed Dawîd (17'ê Tîrmeha 1973'an) ve û bi piştgiriya komunîstan pêk hat. Ev yek weke ku Jean-Charles Blanc di nivîsa xwe de behs dike, girîngiya etnîsîte, qebîle û ya malbatên mezin li welatekî ku ti carî serjimar lê pêk nehatiye dide fêhmkirin.

Bi rejîma Dawîd re nakokiyên tevahiya polîtîkayên modernîzasyonê xurttir dibin: Azadiya jinan, reformên cotkariyê, dadgeriya qebîleyan, tewazunên etnîk, rola paştûnan... Bi darbeya Partiya Demokratîk ya Gelê Afgan (partiyeke komunist bû) di bihara 1978'an de rih bi dîrokê hat. Li gorî Jean-Alain Rouinsard û Claude Soulard bêyî erêkirina Moskowa'yê ev darbeya leşkerî çêbû. Gelê Afganîstan'ê dû parçe bû: Alîgirên Xelq pesnê şoreşa demokratîk "ku çîna karkeran rêveberiya wê dikir" (wer xuya ye, xewn e) û alîgirên Parşam ên ku yekîtiya hemû çînên civakî dixwest. Di navbera van herdû aliyan de şerek qewimî ku tevahiya dema Sovyetê dewam kir.

Ji 1979'an û ji dema dagirkiriya Arteşa Sor û vir ve, Afganîstan dibe karîkatûra hevrikî û şerê Rojhilat û Rojava: Partiyeke komunîst ku ji aliyê kesên din ve tê beralîkirin, axaftinên nakok li ser azadiyê, piştgiriya amerîkiyan ji bo hêzên muxalif, bi taybetî yên herî radîkal, Pakîstan'ê xwe xist nav meselê, hevrikî û dubendiya di navbera Îslamabad û Delhi'yê de…Wisa xuya ye kêm kes orîjînalîteya xurt a vî welatê parçebûyî dibîne, ku tê de her etnîsîte parastina xwe bi xwe mîsoger dike û her mirovê biyanî weke dijmin tê dîtin (Jean-Christophe Victor "l'Islam, les paysans et le poids des traditions" 'Îslam, gundî û giraniya adetan'). Çawa beriya wê artêşa Brîtanya di sala 1842'de têk çûbû, Aretêşa Sor jî wê li wir bi bin keta.

Tevî ku hin kesên din di nivîsên xwe de weke "şoreşgerên azadiyê" behsa Mucahîdan dikin jî, Olivier Roy ji xwe vê pirsê dike; "Şerê pîroz (cîhad) yan şerê rizgariya neteweyî?" Lêkolîner di analîza xwe ya li ser avahiya civakî ya Afganîstan'ê de, ji niha ve li ser zehmetiyên li arteşên fermî wê pêre rûbirû bibin, agahdarîyan dide. Bûyerên weke serûbinbûna civakî û herikîna penaberan ber bi perestgehên Pakîstan'ê ve ji hev derdixe. Di sala1989'an de, bi vekşîna hêzen Sovyet'ê û piştre serkeftina Mucahîdan di sala 1992'an de "dema kaosê" dide destpêkirin: Têkoşerên berê li ber xwe didan, hev dikujin û xelkê paytextê yê di bin barana bombeyên giran de mayî, ne xema wan e.

Tevî ku hêzên mezin eleqeya wan ji vî welatî re namîne, Pakîstan pişgiriya Talîbanan dike da ku desthilatiyê bi dest bixin. Sedemên serkeftina wan û dîtinên wan li ser nîzama "Îslamî" di gotara Ahmed Rashid û Stéphane Alix a bi navê "Qui sont les 'étudiants en religion' (xwendekarên ilmê dîn kî ne)?" tê vegotin. Hin biyografiyên li ser lîderên Talîbanan ronî dikin ka "yên nû hatî" çawa bûn desthilatdar? Nivîsa Gilles Dorronsoro yê wê demê yek ji pisporên dawî bû ku bala xwe dida vî welatî, yên ku wê biqewimin pêş dît.



Hejmara dawîn ya "Manière de Voir"

Bandora êrîşên 11'ê Îlonê li Afganîstan'ê kir tê zanîn, yên ku êrîşa amerîkî dan destpêkirin heta niha jî vî welatî nas nakin. Heman mijarên "modernîst" yên dema Sovyet'ê îro bi awayekî birekûpek tên ber çavan: Azadkirina jinê, reformên demokratîk, hilbijartinên ji bo mafdar nîşandana dagirkirinê, tewazuna etnîk... Lîderên şer yên berê ku niha bûne hevgirên Rojava ji nûh ve hatin erdarkirin, ev yek rastiya wan piçekî jî naguhere ("Ces charniers si discrets ev mekîneyên kuştinê yên evqasî bêdeng" Mazar Shebergan û Jamie Doran). Yê ku ev dosya nexwendibe nikare ji nûh ve xurtbûna Talîbanan fêm bike: Ne karmendên NY'yê yên nû hatî Afganîstan'ê, ne tabûrên artêşên fermî ku hêzekê şer bikar tînin, ("Drones, la mort qui vient du ciel Balefirên bê mirov, mirina ji azmanan tê" Laurent Checola û Edouard Pfimlin), ne jî fermandarên amerîkî ku ev şer heta bi Pakîstan'ê birin, heta bi cihê ku îro jêre dibêjin AFPAK, nikarin yekê ji van fêm bikin.

Mijareke ku di heman beşên dosyayê de tim heye, polîtîkaya Pakîstan'ê ya derbarê Afganistan'ê ye. Ew jî hevgirekî bêwicdan e ku hem afganan hem amerîkiyan hem jî rojavayiyan bi giştî dixapîne û manîpule dike. Lê belê herkes vê jî dizane: Pakîstan welatekî ku "di şerê li dijî terorîzmê û li dijî belavbûna çekên nûkleer de" hevgirek e.

Afganîstan cihekî bi sînorên jeopolîtîk e, welatê dema dirêj e. Dosyaya hatiye amadekirin rîtma bûyerên dîroka vî welatî ya tijî û bi kîjan qertên xwe lîstiye, vedibêje. Li ser herkesê xwedî erka biryardanê yê îdîa dike "siyaseteke wî ya afgan" heye, diviyabû xwendina vê dosyayê weke xweagahdarkirina destpêkê bihata ferzkirin.

PIERRE CONESA

Wergêra ji fransî
Lokman Turgut

ŞOREŞGERÎ-REFORMXWAZÎ?

Gelo bîreke baş a sosyalîstên fransî heye?

Ahmet Gümüştekin (Teyr û Tav)

Berhema dawî ya bîranînên Lionel Jospin kêm tiştan zelal dike, analîzên xurt têde nînin û pirsên hatî kirin jî heta di dilê xwe de axaftinê, hatine kêmkirin. Dîsa jî mirov nikare bêje tevahiya wê ne hêjayî eleqeyê ye, lewra veguherîna yek ji fîgurên çepgirên fransî vedibêje yê ku ji mîlîtantiya troçkîst bû rêveberê Partiya Sosyalîst (PS): "Hevokek tê bîra min ku demekê bi me gelekî bi nirx û hêja bû: 'Şoreşgerek divê şoreşê bike...' Min fêm kir ku li Ewrûpa'yê emê şoreşê nekin û min dev ji şoreşgeriyê berda. Ez fikirîm ku divê karê were kirin reform bin. Bi min wiha ye ku li Fransa'yê em têra xwe mirov hene ku bi vî rengî heman xet şopandin..."

Dema "Lionel behsa Jospin" dike, ji ber ku mijara wî kelecanê pêre çênake, xemgîn e. Sernekeftinên çepgiran ên ji bo bibin desthilatdar? Di kêliya xirab de şaşî hatibû kirin. Şaşiya; "li cihê kapîtalîzm xwe ji nûh ve lîberalîze dike, xwe globalîze dike û dest pê dike xwe bike malî", şaşiya; "li cihê ku hêviyên mezin û hêvîşikestinên trajîk bi dawî dibin." Baş e, lê ma dema ku ew û gelek hevalên wî yên sosyalîst li welatên endam rêveber bûn û desthilatdarî jî têde, kevneparêziya civakî ya Yekîtiya Ewrûpa'yê jî şaşî ye? Berpirsiyarê siyasî yê wê demê Jacque Chrirac dibêje: "Bi tenê bihevrejiyan dikare pêşiyê li me bigire ku em pêngaveke xurttir ji bo Ewrûpa'yeke pêşverû bavêjin. Bi du serêyan rêvebirina siyaseta ewrûpî astengiyek bû ku leza pêşketinê kêm dikir." Me fêm kir, lê ma binketina wî ya di hilbijartinên serokkomariya Fransa'yê de? Vê carê jî guneh dixiste stûyê namzetên din: "Eger pirraniya pirrhejmar di dema kampanyaya hilbijartinên serokkomariyê de yekgirtî bimaya, piştî ku em hema hema gihiştin dema serokkomariyê ya 5 salan, emê di 2002'an de bi ser ketana."

Jospin li hin şaşiyên piçûk mikur tê: Dema di Sibata 2000'î de wî êrîşên Hîzbullah'ê li dijî Îsraîl'ê weke "terorîst" bi nav kir, diviyabû wî xwe "bi dîqettir" nîşan bidaya; ew (hindekî) gazinan ji xwe dike ji ber ku wî "zûtir" qebûl nekiriye ew demekê troçkîst bû. Ya rastî ev şaşiyek e ku mirov di kare lê negire, lewma serhatiya wî (hema hema) weke xeteke rast e: "Ez pêşî troçkîst û sosyalîst im, paşê yê troçkîst xwe li ber yê sosyalîst nagire."

Vegera wî ya salên Mitterand ji du aliyan ve girîng e. Serê pêşî ji ber ku Jospin gelek mijarên ku li ser wan 'du zilam (ew û Mitterrand)' li hev nakin eşkere dike – sala 1985'an çêkirina kanaleke taybet a sipartî Silvio Berlusconi; di şerê li dijî Îran'ê de sîlehfirotina Îraq'ê, ya ku berpirsiyariya wê di stûyê "hin şêwirmendên Pierre Mauroy in ku her wiha têkiliyên wan bi îndustriya sîlehan re hene"; ji 1988'an û şûnve vekirin (ya li navendê). Jospin bêyî dereng bimîne her wiha weke birîneke baş nekewiyayî îşaret pê kir ku herî kêm du caran serokkomarê berê yê dewletê ew daye aliyekî: Sala 1984'an beriya Mitterand dudilî bû ji nava wan ji bo serokwezîr Mauroy xelîfekî destnîşan bike, ew di nava 4 kesên navê wan ji bo vê erkê bihurî de nebû (Ji bilî Laurent Fabius ê ketî şûna Matignon, herşêyên din xanim Louis Mermaz, Pierre Joxe û Pierre Bérégovoy bûn). Paşê di 1995'an de jî Mitterand ji berdêla wî tercîh kir Henri Emmanuelli bibe namzetê serokkomariyê yê sosyalîst. Vê carê Jospin bi xêra dengên mîlîtanan bû namzetê sosyalîstan. Û Jacque Chirac ew di hilbijartinên seropkkomariyê de têk bir. Cara pêşî...

Dema behsa paşeroja Partiya Sosyalîst (PS) were kirin, divê rabirduya wê were ronîkirin. Jospin tîne bîra xwe ku di navbera 1977 û 1981'ê de piştî jihevketina yekîtiya çepgiran, di nava PS'yê de sê mêylên muxalifan hebûn. Michel Rocard serê meylekê dikişand ku vebûna ber bi navendê ve erê dikir. Meyla din dabû dûv Jean-Pierre Chevènement û wan li ber hin daxwazên Partiya Komunîst (PC) wê destên xwe ber xwe de berdaba. Di dawiyê de meyla Mitterrand, bi gihiştina encamên em jî bi wan dizanin, biryar da serkêşiyê bike. Aktorên siyasî guherîn, fikr jî, lê Jospin; "Tevî ku çepgirên radîkal ji hêza wê demê ya PC'yê lawaztir bûn û hewldanên navendparêz hebûn jî sosyalîst divê heman helwestê nîşan bidin. Hemin bi şertê ku ew bi xwe jî bi awayekî biryardar reformîst bin..."

Di nava lihevnekirinê wî yên bi Mitterrand re, bêyî ku zêde li ser bisekine, Jospin behsa biryara dawiya sala 1982'an hatî dayîn dike: Li gor vê biryarê generalên darbekar ên şerê Cezayîr'ê li payeyên wan yên berê vegerêyana. Pierre Joxe yê wê demê Serokê Koma di Meclîsa Neteweyî ya Fransa'yê de kite bi kite behsa vê rûdanê dike: "Bîranîna min a herî xerab di nava 20 salên min ên siyasetê de." Wî muşawirê dewletê yê erka wî pêwendîdarî yên ji nûh ve welatîkirî ye, Yves Courrière gunehbar kir ku însiyatîfa vê rehabilîtasyonê (rehabilîtasyona generalan); "ji ber sedemên pîsikolojîk yên hilbijar- tinê" û bi "korfêhmiyeke ehmeqane" girtiye destê xwe. Gelo meyla Joxe ji bo serokkomarê berê dike ku ew ewqasî şaş bibe ku li ser mijareke bi heman rengî bifikire Mitterand ê di dema şerê Cezayîr'ê de wezîrekî li ser kar bû, karîbû bihêle muşawirekî wî yê dewletê zorê lê bike? Her çawa be, Joxe li xwe mikur tê ku ew bi îstifaya ji erka xwe re rûbirû bû, lewra wê demê wexta parlemanterekî guh nedida disîplîna dengdanê ya partiya xwe, ew bi awayekî otomatîk û xweber ji koma partiyê ya parlemanê dihat derxistin. Dem û dewran der barê vê mijarê de jî guherîn. Hê nû du parlemanterên sosyalîst dengê erê dan qanûneke ku li ser mamosteyan ferz dike ku dersa "karên baş ên mêtingeriyê" bidin. Bi vê jî hîç xwe nexistin xetera werin cezakirin.

S. H.

Wergera ji fransî
Lokman Turgut

GEFEKE DIJWAR YA ABORÎ KU BI TAYÊ SIPÎ HATIYE DÛRÛTIN

Ger Çîn êdî deynê Amerîka’yê nekirre wê çi bibe?

DEAN BAKER*

Ji salekê vir ve, li Dewletên Yekgirtî yên Amerîka’yê, tansiyona aboriyê bilind dibe. Çîn ji politikaya derve ya Serok Barack Obama ne razî ye, lewma bi armanca bersîveke dijber bide vê polîtîkayê biryar da ku êdî bonoya xezineya Amerîka’yê nekire. Li gorî texmînên neyînî yên gelek analîstan eger rewş wisa berdewam bike û Çîn vê helwesta xwe neguherîne dibe ku di pêşerojê de Amerîka felaketeke finansî ya wisa mezin bijî ku dikare aboriya Amerîka’yê bîne ser çokan (1). Gefa Çîn’ê xwedî delîl û argumanên maqûl in. Armanc ew e ku di mijara bac û bihayê pere de, qesra sipî teşwiqê rê û biryarên nû bike. Beri niha rêvebiriya Obama hewldida zorê bide ser Çîn’ê da ku bihayê perê xwe yuan li hemberî dolar bilindtir bike. Çîn jî bi vê biryara xwe bersîveke dijber dide Amerîka’yê da ku dev ji van hewldanên xwe berde.

Bi vê biryarê ji Amerîka’yê tê hêvîkirin ku bernameya alîkariya ji bo xizanan ku dabû sekinandin dîsa bidomîne û herwiha projeya plansaziya xanenîşîniyê jî bi awayeke erênî bigîne encamekê. Eger Çîn bi wê hilberîna xwe ya mezin ya aborî deynê Amerika’yê nekire, rêvebiriya Obama wê bi çi awayî karibe valahiya xwe ya aborî dagire û ewê çawa karibe ji vê qeyrana aborî bifilite?

Ev gefa Çîn’ê ku weke bersîveke dijber tê nirxandin, îro di qada guftûgoyên polîtîk yên Amerika’yê de cîhekî navendî digire. Ev mijareke wisa girîng e ku dişibe xetera felaketa nûkleerî ya di dema şerê sar de. Çi dibe bila bibe, di her şert û mercî de, her alî ji bo polîtîkaya xwe ya muhafazakar li ser yê din ferz bike, potê sor li ba dike.

Di navbera rewşa îro û ya dema şerê sar de cudahiyeke mezin heye. Wê demê tirsa derketina şerekî nûkleerî pir hat mubalexe kirin, (aliyên gefkar ti caran dijberên xwe bi şerekî germ Gef nekirin), yanî tirs û fikara derketina şerekî germ ji rastiyê dûr bû. Lê belê îro rewş cuda ye. Ez di wê baweriyê de me ku ev helwesta Çîn’ê bi armanca heyf û tol sitendinê ye. Wan ev rewşa finansê ku weke felaketa aborî tê nîşandan, ji ber xwe derxistine û di çarçoveya planekê de bi temamî ji dozekî re xizmetê dike. Di rastiyê de, eger bonoyên xezîne yên Amerîkî li Pekîn’ê muşterî nebînin, Dewletên Yekgirtî yên Amerîka’yê pir zirar û ziyan nabîne. Heta em dikarin şert bigirin ku tiştike wisa ji bo faydeya ekonomiya Amerika’ye. Ji bo em di vî warî de xwe îqna bikin, îcab nake pir dûr biçin, tenê hin prensibên bingehîn yên aboriyê bînin bîra xwe bes e.

Aboriya Amerîka’yê xwediyê du aktorên sereke ne, yek ji wan Rezerva Fêdêral ya Dewletên Yekgirtî yên Amerîka’yê, ya din jî Banqe ya Navendî ya Çîn’ê ye. Ev herdûyên weke kilît di eynî giraniyê de rol dileyîzin. Karê wan yê esasî ewe ku bi kirrîna hebûnên demên kurt û demên dirêj, dixwazin qismekî rezervên mezin yên pereyê likid ku di tirafika aboriyê de ye, bikişînin. Rezerva Federal ya Amerîka’yê bi giranî bazara dema kurt tercîh dikir. Lê belê ji vê qeyrana dawî vir ve, wê jî awayê xebata xwe guherand û bi vekirina imkanên kiredi dayînê, biryar da ku li ser demên dirêj razandinên aborî bike. Ev biryara ji nûve plansaziya aborî, bi taybetî jî di warê bonoya xezîne û qezenca hîpotek de, faydeyên mezin bi xwe re anîn.

Banqe ya Navendî ya Çîn’ê jî ji aliyê xwe ve, bi kirrîna hebûnên demên kurt û demên dirêj, hêjmareke mezin perê lîkîd xist piyasayê. Di vê qeyrana dawî de, dema ku valahiya butçeya Amerîka’yê gihîşt qada herî jor, Çîn xwe li ser piyan girt û ji bo bonoyên xezîne ji bo deh salan bikire bi Amerika’yê re ket nava bazariyê (2).

Em wisa bihesibînin ku Banqe ya Navendî ya Çîn’ê ji nişka ve hemû razandinên xwe yên ji bo kirrîna deynên Amerîka’yê bide rawestandin. Sedemê wî çi dibe bila bibe, ha ji bo rêvebiriya Obama bikişîne ser xeta xwe, ha ji ber sedemeke din, firq nake.

Li gorî qêrîn û hawara çapemeniyê, ev rewş wê li Amerîka’yê bibe sedemê bilind bûna bêkontrol ya rêjeya faîzan. Ev jî hêviyên ji bo ji nûh ve pêşxistina aboriyê dikuje. Ya rast ew e ku ev senaryoya felaketê detayeke hêsan ji nedîtî ve tê: Rezerva Federal jî dikare xwe bixe şûna Banqe ya Navendî ya Çîn’ê û bi kirrîna nirxên aborî weke wê tevgere.

Herwiha gelek pirsporên ku li ser vê mijarê ketine nava guftûgoyên dûr û dirêj, di wê baweriyê de ne ku mudaxaleyeke li ser Banqe ya Navendî ya Amerîka’yê dikare bibe sedemê înflasyoneke berdewam û dîsa çapxaneyên pereyan wê li hev zêdebin. Tirs û fikareke wisa ne li cîh e û bi tememî bê bingeh e. Tendurustiya abori ya Amerîka’yê girêdayî hêjmara perê lîkîdite ye. Ne girîng e ev pere ji ku derê hatibe. Dîsa hîç ne muhîm e ka serê kaniyê di destê Rezerva Federal ya Amerîka’yê de be, yan jî di destê Banqe ya Navendî ya Çîn’ê de be. Ya herî girîng û hewce ewe ku kaniya pereyan tim vekirî be. Çîn dema ku bonoyên Xezîna Amerika’yê dikire, herwiha rêjeya faîzan jî di asteyeke maqûl de digire, ev yek jî nabe sedemê enflasiyonê. Eger rojekê Banqe ya navendî ya Amerîka’yê û ya Çîn’ê li hev nekin, ti sedemê ku mirov ji înflasyonê bitirse tine.

Serkêşên ‘gefên Çîn’ê’ garantî didin ku Pekîn ji bo bihayê perê xwe di asteyeke maqûl de bigire, ewê bi perê dolar, kirrîna hebûnên Amerîka’yê berdewam bikin. Ji me re jî dimîne ku em pirsekê bikin. Edî pirsgirêk çiye?

Eger rojekê ev pêşditinên wan pêk werin jî, bila Rezerva Federal ya Amerîka’yê û Banqe ya Navendî ya Çîn’ê wezîfeyên xwe li hev buguherînin: Dema yek razandinên dem kurt dike, bila yê din berê xwe bide razandinên demdirej.

Helbet ti garatiya ku Çîn bi vî awayî tevgere tine. Dikare bi hêsanî hebûn û kirrînên xwe yên bi dolar kêm bike. Heta niha Çîn bi kirrîna bonoya xezîne ya Amerîka’yê, dikaribû bihayê perê xwe yuan di rêjeyeke jêr de bigire. Raste ku Pekîn ji ber zêdehiya ticareta xwe gelek devîz bi destxistine. Eger Çîn ji vê yekê cesaret bigire û dev ji kirrîna bonoya xezîne berde û hebûnên bi dolar nekire, dibe ku di demeke kin de bihayê yuan li hemberî dolar qîmet bigire. Ev jî ne li gor daxwaza wan e.

Di encamê de, ‘gefa Çîn’ê’ ji bilî bilindkirina bihayê yuan nayê ti wateyekê Ji xwe ev rewş jî daxwaza Dewletên Yekgirtî yên Amerîka’yê ye. Ev bi salan e, hem di dema Serokatiya Barack Obama de hem jî di dema George W. Bush de, rêvebiriya Amerîka’yê tim ji Çîn’ê xwestiye ku bihayê perê xwe bilind bike. Serokwezîrê Çîn’ê Wen Jiabao ku li ser mijarê pirs jê hatin kirin roja 13ê adarê bi awayeke bi xwe bawer wiha gotibû: “Ez hin welatên ku dixwazin derfirotina xwe zêde bikin fem dikim, le tistek heye ku fêmkirina wî zehmete, ew jî hin dewlet hen in zorê li ser yên din dikin da ku perê wan biecibînin. Li gorî min ev yek parazvaniya berbi xwe ye (3).” Eger Pekin hemû daxwazên Washington’ê bi cîh bîne, ti wateya ‘gefê’ namîne.

Raste ku bilindbûna bihayê yuan dikare li Dewletên Yekgirtî bibe sedemê înflasyonê. Lê dema mirov bi çaveke demdirêjî li mijarê binêre, dibîne ku ev pirgirêkeke ewqas ne mezin e. Erzaniya bihayê yuan derfet û îmkan dide Çîn’ê da ku bi hêsanî hem derfirotina xwe ya berbi Amerîka’yê û hem jî ya li seranserê cîhanê zêdetir bike. Ev sitratejiya Çîn’ê tesîr ne tenê li dolor heriwha li hemû pereyên biyanî dike. Eger Pekîn dev ji kirrîna bonoya xezîneya Amerîka’yê berde neçar dimîne bihayê perê xwe bilind bike. Ev yek jî dibe dawiya sîstema wî ya derfirotin ê. Di rewşeke wisa de, hilberînên Çîn’ê ku îro li Amerîka’yê bi erzanî tên firotin wê bihatir bibin. Herwiha li hemû welatên ku tekiliya wan bi yuan re heye, tesîreke xirab li firotina malên Çîn’ê dikeve.

Helbet bihabûn dibe sedemê înflasyonê, lê belê encameke wisa xirab ku karibe zirareke cidî bide aboriya welêt, dernakeve. Eger hilberînên Çîn’ê bi bihayeke bilind bikevin piyasayê, Dewletên Yekgirtî dikare ji vê yekê îstifade bike û eyara valahiya butçeya xwe ku roj bi roj girantir dibe, bixe dengeyekî.

Derfirotina berbi Amerîka’yê ya ji Çîn’ê û ya ji hemû welatên ku perê wan girêdayî bihayê yuan e, tev dike tenê ji % 4’ê hilberîna brut ya navxweyî ya Amerîka’yê. Eger rêjeya vê îthalatê ji % 30 zêde bibe, rêjeya înflasyona li Amerîka’yê tenê ji % 1,2 bilind dibe. Helbet ev rêjeyeke ne kêm e, lê belê ji hîper-enflationa weke ya Zimbabwe (4) ku mirovan dilerizîne, gelek dûr e. Eger mirov bide ber hev û qiyasekî bike, di sala 2008’an de, bihayê petrolê ewqas bilind bû ku ji nişka ve di nava salekê de, bihayê barîlê ji 70 dolaran derket 150 dolaran. Ev jî dikir ji %2’ê hilberîna brut ya navxweyî ya Amerîka’yê. Di demeke wisa kirîtîk de jî kes neketibû nava tirs û fikara rîska hîper-înflasyonê.

Dema ku hilberîn û malên çînî biha bibe, reqabeta endustriya amerîkî di gelek sektoran de zêde dibe, hêjmara bêkaran kêm dibe, rêjeya îthalatê hindik be jî dadikeve. Wê demê emê bibin şahidê dengeyeke erênî ya tîcaretê. Dema ku derfirotin Amerîka’yê zêde be, ev dikare hemû aliyên xirab û neyînî yên bilindbûna rêjeya faîzê telafî bike.

Weke gotina dawî, ti sedemê ku mirov ji boykota Çîn’ê ya kirrîna bonoyên xezîna Amerîka’yê bitirse û bike qêrîn û hawar tine. Berovajiyê wê. Ev gef û bersîva dijber ya Çîn’ê dikare fayde bîne ji dewletên Yekgirtî yên Amerîka’yê re ku Çîn dixwaze wî bixe qurban…

Wergera ji fransî
Bedran Dere

* *Aborîzan, Hev-Dîrektorê Navenda Aborî û Enstîtûya Lêkolînê, Washington.*

(1) Di 1’ê Kanûn a 2010'an de Çîn bi 889 milyar dolaran, welatê ku herî zêde deynê Amerîka’yê stendiye ye. Japonya bi 765 milyar dolaran li pey Çin'ê tê.

(2) Martine Bular, ’’Fînans, hêz,... dinya diqelibe”, Le Monde diplomatique, Mijdar 2008.

(3) Civîna çapemeniyê ya di girtina parlamenê de.

(4) Bi hesabê sedane ku di sala 2008’an bi qasî 231 milyar tê texmînkirin.

BIHÛŞTA ROJNAMEGERÎ U WEŞANGERIYÊ

Li Norweç'ê dewlet ketiye dilê çandê

ANDRÉ SCHIFFRIN*

Ji Şerê Cîhanê yê Duyemîn vir ve hunermend û rewşenbîrên norweçî di nameyeke xwe ya vekirî de ji hikûmeta sosyal demokrat re gotin ku girse çandeke baş heq dike, bi taybetî li herêmên ku lê girse (gel) kêm dijî. Desthilatdariyê bi pêşxistina sîstemeke baş a tiyatroyê, sînemayê û pêşangeha (expozîsyona) huner bersiv da. Li ser vê esasê welat sîstemeke bêhempa, ya ku heta roja îro li her deverên welat belav bûye, pêşxist.

Bêguman welateke weke Norweç dikare siyaseteke wisa lipêş bixe; Petrola Derya Bakur wê kiriye xwedî sawateke dewlemend a cîhanê. Rezervên wê (li gor hejmara hemwelatiyan welatê herî xurt ê cîhanê ye) nahêlin ku ew di warê bûtçeyê de zehmetiyan bijî.

Piştî salên 1950'an edîtorên norweçî fêmkirin ku xebata wan di nav xeterê de ye. Piraniya hemwelatiyan bi zimanê danîmarkî dixwendin, jiber ku pirtûkên cînarê wan ê xurt hêsantir dahatin bidestxistin, jiber vê yekê firotina pirtûkên wan dadiket û tîraj kêmtir dibû. Ji aliyê din ve Norweç nikaribû xwe li dijî berjewendiyên nû yên reqabeta civaka nû, ya ku piştî şer çêbûbû, biparêze. Jiber vê yekê, di dehsaliya piştre vî welatî siyaseteke nû û xurt a çandê xiste rojevê û lipêşxist.

Norweç a wê demê pir herêmî û îzole bû. Digel vê rastiyê, mirov nikaribû li her firoşgehê rojnameyên biyanî bibîne, lêbelê di pirtûkxaneyan de jî mirov dikaribû bihêsanî rojname û govarên welat bidîta.

Di destpêka salên 2000'î de wêneya medyatîk bi awayeke zelal zindî bû, di welat de 14 govarên ku di her yekê de rûpelekê ji bo pirtûkan hatibû veqetandin hebûn. Daxwaz zêdetir berbi rojnameyên aborî ku bi kaxizên pembe dihatin çapkirin ve belav dibû, lê bi tîrajeke piçûk. Di tevahiya welat de du sed û bîst û çar (224) berhem derdiketin, di nava wan de heyştê û du (82) heb bikêmanî di hefteyê de çar caran derdiketin.

Bêguman, weke pir deran, belavkirina berheman kêm bûbû: Rojnameya herî mezin Verdeng Gang, a ku deh salan berê sê sed û heftê hezar (370 000) dihate firotin, daketibû du sed û heyştê û çar hezaran (284 000), yanê çaryekeke kêm bibû -ev hejmar ji ya Le Monde'yê pir dûr nîn e, ji bo welateke xwediyê hejmareke hemwelatiyan ku ji sêzdeyan yek ê Fransa'yê ye. Belê, her wiha di navbera Oslo û Parîs'ê de jî ferqek mezin heye. Li Oslo belavbûna çar heb rojnameyan roj bi roj fireh dibe, li gorî agahiyên nû, tîraja wan ji sed û bîst û sê hezaran (123 000) derketiye du sed û çil û heft hezaran (247 000).

Jibo çar kesan yek Verdens Gang tê frotin, ev tê wateya ku ew ji aliyê çaryekekê girseyê ve tê xwendin. Derketina rojnameyan –ji bo hezar kesan şeşsed û heft heb (607)- ji ya hemû welatan zêdetir e, li pêşiya Swêd'ê ye (çar sed û heftê û du heb 472), her wiha ji Brîtanya ya ku xwe weke bihuşta (cinet) çapemeniyê dibîne jî baştir e (sêsed û yek-301-).

Cihê mezin ku ji aliyê rojnameyan ve hatiye girtin li pêşiya medya din nabe asteng. Tîraja govarên ku di derbarê serkeftinan de û her wiha di derbarê otomobîlan de weşanê dikin jî weke ya hemû welatên din, ên Ewrûpa'yê ye. Ji aliyê din ve, her norweçiyek rojê şêst û yek (61) deqîqeyên xwe bi guhdarkirina radyoyê derbas dike –ev di bin rêjeya welatên din de tê dîtin- û sed û pêncî deqîqe jî li pêşiya televîzyonan derbas dike (Ji bo şopandina xebatên derveyê medyayê zêde dema wan a vala namîne, lê bêguman ew pir aktîwîteyan bi hevre dikin). Miqabilê vê rewşê, vîdeo zêde nayên temaşekirin û komputorên malan jî pir zêde nîn in: Yek ji bo heyşt (8) malan.

Ji demeke dirêj vir ve norweçî cudahiya nêrînan ku bi rêya çapemeniyê tê îfadekirin û ji xwe re cih dibîne weke şerteke demokrasiyê dinirxînin. Hikûmet ti alîkariyeke aborî nade rojnameyên taybet ku armanca wan qezenckirin e. Lê belê weşanên piçûk –ji du hezar heta şeş hezaran- ji aliyê hikûmetê ve, weke yên mezin ku zêde belav dibin, têne destekkirin.

Weşanên neteweyî ku weke referansên aborî û polîtîk têne naskirin jî alîkariya dewletê, weke weşanên partiyên siyasî digirin. Rêjeya vê alîkariyê ji % 2 heta % 3 li gorî karê salane yê çapemeniyê ye. Bi taybetî rojname ji bacê (TVA) azad hatine girtin, ku bihaya wê ji sed mîlyon kiron (pereyê Norweç'ê) zêdetir e. (ji bo salê 12,4 million euro). Herkes bawer dike ku ev alîkarî li ser naveroka çapemeniyê zextê çênake.

Digel vê rastiyê medya norwêçî ji bandora fîrmeyên mezin azad nîne. Sê grûbên mezin, ên di nava vê sektorê de ne, ji nîvî zêdetir belavkirina çapemeniyê girtine bin destê xwe, ev rastî ji bo radyo û televîzyonan jî xwedî heman wateyê ye. Grûba ku herî zêde hatiye naskirin, Schibsted, di nava hemû welatên Ewrûpa'yê de rojnameyên belaş derdixe û vê yekê bi siyaseteke pir dijwar a bazirganiyê dimeşîne. Ev grûb di nava çapemeniya herêmî de jî xwediyê parê ye, ji % 49'ê Aftonbladet, ku fabrîqe ya duyemîn a kaxizan e ku xwediyê wê Swêd e. Heman fabrîqe di welatên Baltik de jî xwediyê parê ye.

Di warê televîzûelê de jî ev welat bi qasî hemû cînarên xwe ye. Şebekeya neteweyî Norsk Rikskringkasting (NRK) li ser sîstema British Braoadcasting Corporation (BBC) kar dike; şeşsed û heftê hezar (670 000) cih heqê salane didinê, ev dibe bihaya şeşsed milyon kiron (derdora çil milyon euro). Weke îstasyonên herêmî yên radyo û televîzyonan ku xwediyê "bingeheke îdealîst û îdeolojîk" in, ev şebeke jî ji bacê azad e. Her wiha sê televîzyonên taybet jî hene, ew jî di destê grûbên mezin ên swêdî û norweçiyan de ne.

Li hemberî vê dagirkeriya grûbên mezin ên aborî, hikûmet hemû derfetan bikar tîne ku weşaneke azad biparêze. Ji sala 1965'an vir ve şêwirmendiyeke hunerî (Art Council) li ser modela Îngilîz hatiye avakirin. Armanca wê şêwirmendiyê ew bû ku alîkariya hemû formên huner û wêjeya welatê ku di Bakurê wê de pir kêm girse heye bike. Bingeha vê nêrînê ew bû ku, bi kirrîna perçeyeke berheman ji bo pirtûkxaneyên gel, firotina mînîmûm ya pirtûkan ji bo weşangaran garantî bike. Şêwirmendiyê her salê hezar (1000) heb berheman, du sed û bîst (220) berhemên sereke (di nava wan de helbest û tiyatro jî hene) û hezar û pêncsed û pêncî (1550) heban ji sed û sîh berhemên ji bo cîwanan dikirî.

Di welateke wisa piçûk de, ev hejmaran aliyeke girîng ên berhemên ku bi zimanê norwêçî têne çapkirin e: Her wiha ji wana sed heb jî romanên ku têne tercûmekirin divê zêde bibin. Di sala 2009'an de heman şêwirmendiyê hezar heb jî pirtûkên ceribok, ji heftê berheman, li lîsteya xwe ya kirînê zêde kir. Pirtûkxane çardeh govarên çandî dikirin, hinek ji wan jî alîkariya çapkirinê distînin.

Weşangerên ku tîrajên wan di bin rêjeya normal de ne bi awayeke xurt têne destekkirin. Ev alîkarî ji wan re dibe sedem ku ew di derbarê mijarên zehmet de jî, yanê berhemên ku di xeterê de ne, weşanê bikin. Bi vê sîstema alîkariyê karê nivîskariyê jî rehet dibe, mafê wan li ser pirtûkên ku têne firotin derdikeve % 20-22'yan, ev jî dibe du qatê hin deran. Bihayê vê programê derdikeve derdorê 11.3 milyon euroyan.

Li gorî vê sîstemê, bi armanca parastina mafê edîtoran, bi taybetî di derbarê xebatên ku ji wan re têne pêşniyarkirin, Şêwirmendiya Hunerî komîsyoneke ji bo xwendina hemû pirtûkan birêxistiye. Bi awayeke giştî, ev sîstem baş dixebite û ji bo pirtûkxaneyên piçûk, ku li hemû deverên welat belave ne, bûye alîkariyeke mezin. Her wiha ev sîstem ji her sê zimanên fermî re jî dibe bersiveke baş. Ji van zimanan yek ji bingeha cûrbecûr devokan çêdibe –ev jî bûye sedemê ku li Oslo du heb tiyatroyên neteweyî hebin- ya din jî Sami ye, ji aliyê gelê xwecih yê Bakur ve tê axiftin.

Ev programa ji bo alîkariya weşanxaneyan ji aliyê gelê norweçî ve pir baş hatiye pêşwazîkirin. Dema ku em bihaya vê programê bi yê welatên din re qiyas dikin, reqemên giştî digehêje asteke gelek jor. Kapasîteya kirînê ya pirtûkxaneyan qasî ya Amerîka'yê û her wiha ya Brîtanya ya dema yekemîn Ronald Reagan/Margaret Thatcher e. Weşankar dikarin pişta xwe bi kirîna pirtûkxaneyan girêbidin, ku ji bo hin pirtûkan hejmar digehêje hezar, hezar û pênsed (1500) hebî. Li Amerîka û Brî-

**Dîrektorê weşanxaneya ku armanca wê ne qezenckirina aborî ye, The New Press, André Schiffrin di berhema xwe ya bi navê (d'Allers-retours -Çûn û Hatin-, Liana Levi, Paris, 2007) baş diyar dike ku welateke piçûk, an jî îzolebûyî -Norweç- çawa karibûye medya serbixwe, weşanê û sektora çandê biparêze û cesaretê bide wan ku afirêner bibin.*



Ahmet Gümüştekin (Ejderhayê çiyayê Albatre'yê)

tanya'yê bûtçeya pirtûkxaneyan, a ji bo kirîna berheman, weke hemû programên din ên alîkariya ji bo xebatên civakê, hatiye sekinandin. Vê rewşê li ser programa norwêçî hinekê bandor çêkiribe jî ew di asteke piçûk de maye per capita1.

Em programa zêdetir radîkal hatiye meşandin bihêlin dawî, û ev ya herî kevn e: Xwedîtiya salonên civakî yên sînemayan. Tenzîmeke neteweyî ya salonên şaredarêyan, di derbarê derketina fîlmên nû de hemû derdorên pêwendîdar agahdar dike. Ev tenzîm dibe sedemê ku fîlmên nû bigehêjin hemû herêmên ku li paş wate. Di çarçoveya vê programa alîkariya civakê de, nêzîkê dused (200) ekran ji bo sed û sî hezar (130 000) temaşevanan xizmetê dikin.

Li Oslo, dema ku fîlmên nû yên serkeftî ku ji aliyê Hollywood'ê ve derketine, werin ser ekranan, derhêner dikarin fîlmên din, ên hatina wan qels in, di warê aborî de, bigirin û wan di salonên mezin de nîşan bidin ku pêşî li fîlmên ku nabin parçeyek çanda civakê bigirin.

Her wiha, bê ku bi kesî re qirecir were kirin, "bêqaydetiya norweçî", rastiyeke xwe dide pêş: Li vî welatî sîstemeke bêhempa hatiye çêkirin2. Ji Fransa'yê cudatir, vî welatî saziyên xwe yên weke kilîda garantiya serxwebûna çandê nefirot sektora aborî. Bêguman, sandoqên dewletê tije ne, ev jî bûye sedemê ku programên, weke ya kirîna pirtûkan ji aliyê pirtûkxaneyan ve bimeşin. Lê belê kontrola rayedarên herêmî ya ji bo salonên sînemayan qasê pereyê ku ji petrolê tê hate niqaşkirin. Tişteke din ku me matmayî kiriye jî ev e: Ev program di pir aliyan de bûne sedemê ku di nava rayedarên saziyên cûrbecûr de sîstemeke rêveberiya baş pêşbikeve. Ev jî di nav salên dirêj de, bi awayeke pir zirav hatiye fikirandin. Jiber vê yekê mînaka norweçî ku heta niha lipêşketiye, heq kiriye ku, bi dîqeteke pir mezin, binê wê were xetkirin.

Wergera ji fransî
Ahmet Dere

---

(1) Bêguman ev hejmar ji yên Fransa'yê zêdetirin, ku li vê welatî kirîna berheman ji aliyê pirtûkxaneyan ve di asteke pir marjînal de ye. Ne mumkun e ku em bikaribin li Fransa'yê vê hejmarê tespît bikin jî, jiber ku encama wan tenê ji aliyê dikanên pirtûkan û fîrmeyan ve têne kirin.

(2) Encamên di derbarê çapemeniyê û weşanan de ji agahiyên fermî yên hikûmetê hatine girtin. Agahiyên di derbarê sînemageriyê de ji gotareke pir baş ya Nils Klevjet Aas, ku di International Film Guid, 1988, ji aliyê National Association of Municipal Cinemas li Oslo ve ji nûh ve çap bûye, hatiye girtin.

PROVOKASYON Û PRONOGRAFIYA HUNERA HEMDEM

Ji bo avakirina cîhaneke nû, xerabkirina vê cîhanê!

DANY-ROBERT DUFOUR*

Hunera hemdem "şoreşger e", lewma yên ku jê hez nakin yan paşverûyên bi rastî ne yan jî paşverûyên ku pê nizanin paşverû ne ango neo-paşverû ne. Îro mohr û etîketên bi vî rengî li herkesê diwêre li wateya hin berhem û pratîkên hunera hemdem bipirse, tê xistin. Ji berdêla bikevin xetera ku guman ji wan were kirin populîst, nezan yan jî ehmeq in, mirov gelek caran tercîh dikin dengê xwe nekin û fikrên xwe nebêjin, ev rewş balkêş nîne.

Hûn kîjanê baştir dibînin, ya kevneparêz an jî ya şoreşger? Hûn aliyê modernîteyê yan jî yê akademîzmê (nêrîna bi tevahî teorîk ya li mijarekê) digirin? Bi vî awayî ji destpêke ve pêşiyê li guftûgoyan tevan digirin. Bandora vê rêbazê gelekî mezin e û hêja ye armanc û amûrên wê bên ronîkirin: Ji ber ku eger ev rêbaz ne bi tenê di guftûgoyeke diyar a li ser hunerê û li ser huneke taybet ya ji vê guftûgoyê qut nabe de tê bikaranîn, ew her wiha di qada fereh a retorîka siyasî de jî tê bikaranîn. Hingî qada hunerî ya em behsê dikin, bi rola "modelekê" radibe û divê armancên wê werin ravekirin.

Ji bo analîza kêrhatina vê modelê, heja ye em weke mînak li slogana bingehîn a fikra lîberal (lîberalîsmê) binêrin ku Bernard de Mandeville di Fable des abeilles (çîroka mêşên hingiv) (1704) de pêşniyar dike: "Gunehên şexsî (ezezî, ferperestî, çavbirçîtî...), ji gelemperiyê re xêr e." Wateya vê wiha ye: "Tişta hûn weke guneh dibînin, ya rastî xêr e." Yan jî: "Eger hûn wateya wê ya pêşî bigirin dest guneh e, lê wexta hun wateya wê ya duyemîn bigirin dest xêr e." Ev fikir çelexwarî û jirêderketî ye, ne di warê exlaqî de belê di warê wateya gotinê ya bi ezmûnan ceribandî. Lewra ew, pirsgirêkê (şîddeta pirî caran hilweşîner e ya ajo û îhtîrasên sedema wan ev evîna em jêre dibêjin egoîzm e) dike çareserî. Jirêderketî ye, heta du caran ji rê derketî ye, ji ber ku ew nirxên sabît hemûyan şêlo dike û di xwe de wî heqî dibîne ku karibe her tiştî û dijberê wî bêje: guneh xêr e, spî reş e... Ev retorîk weke mekîneyeke talankirina tevahiya qeneetên rexnegir dixebite. Ev qeneetên rexnegir berewajiya wê, tişta rast ji ya nerast cihê dikin.

Da ku mirov bigihîje vê wateya duyemîn, bes e ku yê diaxive tiştên ku divê ti kes nîşan nede, nîşan bide: Bi vî awayî provokasyonekê çêdike. Ango li gorî wateya peyvê ya etîmolojîk bangekê dike ku dikare weke qebqebû û xwe bêminetkirinê were fêmkirin. Bi provokasyonê ez bang li yekî din dikim da ku bide ser şopa min, weke ku min jêre gotibe, heke diwêrî tu jî bike. Lewra provoke kirin ev e ku mirov bi zanebûn... Tişta ku nabe were gotin, bibêje. Lê ji ber ku ez baş dizanim divê tişta dikim nekim, hem ti kes nikare gazinan ji min bike û hem jî ya herî girîng ez yê din jî dikişînim asta xwe, ez sînorekî diyar dikim ku têde em xwe bi xwe ne, cihekî teng yê aqilçêtir û jîrtiran, yê mirovên ji kompleksan xelasbûyî, cihekî ku berewajiyê cihên gelemperiyê yên tijî qedexe, têde her tişt dikare bê gotin.

Fonksiyona û kêrhatina vê retorîka xasûkî xapandina mirovê mirov pêre diaxive ye. Bala mirov dikşîne, heta bi dizî bike ku pêre li hev bike - "Hûn fêmdikin ya ku ez dixwazim bêjim..." Her çiqasî bi rastî fêmnekiribe jî, ji tirsa li derveyî yên dizanin neyê hiştin mirov neçar dimîne bersiva erê bide vê pirsê... Mirov naxwazin di nava yên ehmeq de yên ne hêja ne di nava civaka bijarteyan de cihê xwe bigirin, werin bicihkirin.

Dema hunera hemdem dibe cihekî têde li her amûra xapandina mirovê lê dinêre tê gerîn - balkişandin, berjewendî û lihevkirina bi dizî - ev hunera manipulasyonê ku xisleta reklamê ye, îro di hunera modern de jî tê bikaranîn.

Mînak têra xwe hene. Mirov li berhemên hunermendên herî navdar ên serdema me bifikire, bes e. Van rojên dawî mamosteyê belçîkî Jan Fabre li Muzexaneya Louvre bijarteyeke ji pîsiyên xwe bi xwe pêşkêşî Jeff Koons dikirin. Ew Mikey-l'angê (mekekê me Mikey) me ye û bi kûçikên xwe yên nehîtî yên malê bi nav û deng e. Formula kevin û bi bandor a bi dizî lihevkirinê û lihevkirinên li ser berjewendiyên qirêj bêyî ku lawaz bike stratejiya gelekî bi hêz ya "wateya duyemîn" di nava hunera post-modern de nîşan dide: 1) Provokasyonên bê tabû; 2) Provokasyoneke ku tu wateya wê ya din tine ye; 3) Ev yek wê cîh bide tesîreke medyatîk a peyde bibe... 4) Çerxeke spekulatîf a balkêş e.

Ji 1996'an û pêve Jean Baudrillard, di nivîseke ewqasî wêrek de ku navê wî ji aliyê parazvanên vê hunera "wateya duyemîn" ve pirr caran dihate hildan, ev xasûkî ji hev xist û got: "Ev hetîketî hemû pesnê xwe pê dide ku bi wateya duyemîn û henekpêker a hunerê ciwan dibe. Hûn çi bi wateya wê ya yekemîn û çi bi ya duyemîn lê binêrin ew tine û bêwate ye. Lêzêdekirina estetîkê wê ji vê hetîketiyê xilas nake, berovajî: Ev du caran hetîketî ye. Xwe lê datîne ku tine ye. Ew dibêje ez ne ti me! Û di rastiyê de jî ew ne ti ye (1)."

Baudrillard di vê rewşa du caran tine de rezîliyeke bi rastî ya neerînîbûneke huner wê radigire, dibîne. Ev (hetîketî) xwe bi kapasîteya xwe ya ji nirxên sabît ên herî zêde bi cihbûyî qutbûnê digire, berê xwe dide yekane armanca xwe lêgerîneke wateyê, ango lêgerîna wateyên nû. Huner nikare bi tenê bi qasî nîqaşeke peyamekê were kêm were dîtin, ew tiştên ku em hîn pê nizanin dibêje, tiştên hê nehatin tomarkirin dide xuyakirin, li dinyaya em nasdikin, tiştan zêde dike.

Lê ev hewldana şoreşger di hunera hemdem ya fermî de êdî bi tenê di rewşa vedîtina tiştên nû de hatiye sînordarkirin û kêmkirin. Ev jî xisleta hilberandina kapîtalîst e. Helbet pêdiviya bi afirandina xwestek û îhtîrasên nû sedema vê rewşê ye. Ev yek rê li ber tevlihevbûnekê mezin a vedîtina tiştên nû û lêgerîna wateyê vedike. Li vir, hunera hemdem mexdura ve rewşê ye. Em dikarin vê tiştê bi qaîdeyekê vebêjin: Bazara hunerê çiqasî xurt bibe, ewqasî wê şertên giştî yên bazarê xwe li ser hilberandina hunerî ferz bikin. Hingî hunera hemdem wê tiştên ku mirov ne li bendê ne hilberîne, lê ti wateya wan nîne û îhtîmala hebûna wateyeke wan jî tineye.

Hunera ku bi rastî şoreşger e, dinyayê bi armanca ji nûh ve çêtir ava bike ji hev dixe, dihêle mirov bi awayekî rêzdar bikene, ya rastî ev kenek e ku mirov azad dike. Lê hunera hemdem bi kenekî gelekî cuda dikene, kenekî nihîlîst e ku henekê xwe bi kêfa dilê xwe bi tevahiya nirxên exlaqî dike û ti armanca wê nîne: Huner bi tenê bi hêza kêliyekê heye ya ku wê weke heyî qebûl dike û hemû ev e.

Ev hunera hem bêedeb, bêexlaq (narsîst) û hem jî ji xwe razî û bi difre (sînîk), ango "narsînîk (narcynique)" bi hesanî naye naskirin ji ber ku li ser prensîpeke gelekî berbelav a hîperdemokrasiyê xwe runiştandî ye: Ji hev cudakirina objeyeke asayî ji afirandineke hunerî ya rastî êdî bûye karekî ne mumkin. Ji bo ku karibe vê yekê pêk bîne divê mirov hiyerarşiyekê bikarbîne. Lê her hiyerarşî hin nirxan ferz dike. Wateya vê jî ev e, meyilekê eşkere ji bo nîzamê heye, lê her nîzam jî di nava xwe de bi awayekî cidî totalîtarîzmê dihewîne: Tiştên asayî û besît, yên nirxê wan weke sohbeteke li qehwexaneyê, weke nimûne siya faşîzm yan jî ya stalînîzmê di qada siyasî de û ya totalîtarîzmê jî di qada felsefî de bi rexnegiriya ji Kant ji me re mîras mayî, xetera wan wê mezintir bibe.

Çalakiya "rexnekirina" prensipên rastî û yên xeyalî ji hev cuda dike, wateya vê jî ew e ku divê timî "dadgeheke mentiq (2)" hebe. Da ku karibin ji dadgehê, terorê û dîktatoriyên din birevin, divê ti hiyerarşiya rexnegir neyê qebûlkirin. Ev e ya ku rûmeta afirandinên hunerî dide lodek pisî. Dixwazin bi vê bikin nirxê afirandineke hunerî bi wan (berhemên hunera hemdem) jî bidin, heta qîmeteke zêdetir. Dev ji pêşandanê û danîşanê berdane, wateya vê jî ew e ku pêwîstiya jihevcihêkirina rastî û ya pêşkêşkirî ne xema wan e û vê yekê dikin sedema heqkirina vî nirxî. Ev hunera hemdem, bêyî ku mesafeya sembolîk di navberê de bi cih bike, ajoyên hunermend yên provakatîf, yan jî ajoyên provakatîf yên ku kirin ew weke berhemeke hunerî were qebûlkirin yekser pêşkêş dike. Ev jî rola koleksiyonvanan e, bêguman François Pinault (3) yek ji wan e ku herî zêde sembolîk e.

Berhema îronîk a hunermende belçîkî Wim Delvoyenin a bi navê Cloaca (2000), roviyekî hezmkirinê yê mirov ê kêrhatî yê ku di kontrola kompûteran de baş dixebite pêşkêş dike: Berhema hezmkirinê di ambalajeke bêhewa ya plastîk de ku li ser markeyên Coca Cola û Ford'ê hene tê pêçan û yeka wê bi nêzî 735 euroyan tê firotin. Ev şibandina herî baş a vê sîstemê ye.

Mirov dibîne ka çawa retorîka bêexlaq û jirêderketî heta bi

* *Fîlozof (Zanîngeha Paris 8, Koleja Navneteweyî ya Fîlozofiyê)*



Ahmet Gümüştekin (Ahura Mazda)

mustehceniyê diçe: Tê îdîakirin ku mirov dikare û divê her tiştî bike objeyeke firotinê. Eger pêşandana ya ku mirov nikare nîşan bide, ku bi tenê ajo heq didin van, hunerê hildiberîne û dike ku mirov peran bi dest bixin, hingî naxwe herkesî azad e rêzik û qaîdeyên bazarê ji dil qebûl bike, dawerivêne hinavên û li gorî vê tevbigere. Armanca van rêzikan têr û razîkirina ajoyan e û girîngiyê bi tenê bi bi zewq û kêfa yekser, xwestî, pêşandayî dide. Helbet ji bilî ajoyên cinsî jî ajo hene. Hunerê ev tişt kiriye rejîmeke ultra-lîberal.

Ev toleransa hunera hemdem ji bo kelevajiyê ne tesadûfî ye. Tevî ku li ser navê azadiya xweîfadekirinê pêşniyarên herî zêde nabe bên qebul kirin, divê bên tolere kirin, emê çawa nebînin ku vê ultra-demokratîzmê, di warê siyasetê de bi tevahî heman tişt e ku dikare yek ser ber bi zordestiyê ve bibe – li aliyê din ji dema komara (La République) Platon ve em dizanin ku ku ev veguhertin mumkin in.

Bi vî rengî em bûn şahidên pîrozkirina kirinên… ne bi rastî. Demeke dirêj vê pîrozkirinê xwe spart berhema hunerî ya Marcel Duchamp ku di sala 1917 de ready made ya yekemîn pêşkêş kiribû: cihekê mîzkirinê yê standart ku navê fontaine (kanî) lê hatî kirin. Di wê demê de bûyereke wisa çalakiyeke gelekî serûbinîhevkar bû ji ber ku hertişt rexne dikir: Statuya berhema li fabrîqayê hatî hilberîn, statuya tiştên hatî çêkirin, hunera Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê (4), cinsiyeta objeyan, wateya pêşengehekê… Gelek hunermendên piştî salên 1960'î xwe weke yên dayî ser şopa wî didîtin, bi tenê kirinên texlîd kirin, texlîdkirineke bê armanc: Em ketine zemanê "tu wê bêjî qey wiha ye" ku bi tenê bi yek riyê ve dikare mirovî bibe, ew jî "komediya" serûbinîhevkar e (ev peyv a nivîskar û esayîste –yê ku ceribandinan dinivîse- Philippe Muray e).

"Komediya" em behsa wê dikin hunera zindî jî eleqedar dike. Dema Jan Fabre li festîvala d'Avignonê ya 2009'an L'Orgie de la Tolérance (partiya seksê ya toleransê) pêşkêş kir, bi cidiyeteke kenê mirov pê were maturbasyon û orgazma mirovî nîşan dide, heta ji bişirîna nivîskarê fransî Rabelais jî bêpar e. Ev pêşandan bi tenê ji bo tişta ku ew bû hat nîşandan, ango bi tenê pornografîk ku piştgiriya bikaranîna stratejiya wateya duyemîn û hevkariya guneh dike. Ev jî destûrê dide şelobûn û nediyarêyan hemûyan. Dika klasîk xwe her wiha besît dike û xwe ji tevlîhevbûnê dike. L'Armida Hezîrana 2009'an li Kosmische Opera ya Berlîn'ê hat nîşandan, kir ku kompozîtor (5) Christoph Willibad Gluck û Sade anîn cem hev! Pirtûka Philippe Quinault du perde bûn û rolên aktoran para bêhtir tazî bûn û hêjayî felsefeya di odeya şexsî ya jinê de bûn. Yê ku derhêna Calixto Bieito bû. Wî xwe hîç jê veneda ku fikrên xurt yên îlham danê bîne ziman: "Nermbûn ruh dikuje", "Hêrs û kîn dibe ku bibin hêzeke kêrhatî ya motîve dikin", "Anîmalîzm (fikra ku di her kar û barê mirov de şehwet û hez weke bingeh dibîne) heta mirov bêje bes xwezayî ye", "Hûn bi tenê dikarin keseke/î ji cinsê xwe fêmbikin…

Ev lîsteya tiştên divê neyên ji bîrkirin ya Sade ku îro êdî xerîdarên wê kêm in, mirov îro pê her diçe bêhtir xwe nêzî hunera klasîk dike û bê guman bi vî awayî xwe weke serûbinîhevkar îlan dike: Ev yekane rewabûna wê ye… Lê belê bi tenê yek armanca vê serûbinîhevkirinê heye, ew jî bi qêrîn ragihandina vê prensîpa gelekî girîng a lîberal a sereke ye: Ji rastiya ferd pêve ti rastiyên din nînin; tevahiya koma civakê pêk tîne ji encama kirina ferdan pêve tiştekî din nîne: Weke encam, mirov dixwazin di danûstendinên xwe de destketî û karê xwe bigihînin asta herî jor. Alter-ego (yê din, nasnameya din) êdî weke şertê xwepêkanîna û pêşxistina herkesî nayê dîtin, berevajî weke tehlûkeyeke daîmî ya âstengkirinê tê dîtin. Huner û şaristaniya "her tişt ji ego re" xwe li her tiştî kerr dike û bi dixwaze ku mafên ferd neyên sînordarkirin. Çi serûbinîhevkirineke delal e ku dixwaze biyanîbûnê bi xwe û azadbûnê tevlîhev bike.

Wateya vê ne ew e ku hunermendên bi rastî êdî newate yên ku li ser daxwazên li derveyî tamên xurt ên kapîtalîzm qîmet didiyê kar dikin; em bi tenê navên yên kevin hil din di nav resaman de ji Bram van Velde heta bi Goran di muzîkê de ji Jean Dubuffet heta bi Paul Reyberolle hene. Belê her wiha di şanoyê de weke mînak Michel Schweizer heye ku di berhema xwe Bleib de têkiliya kûçik-gur bi xwediyê xwe re bi kar tîne da ku bi awayekî îronîk dirindetiya dinya îro lêbikole, yan jî Pierre Meunier ê ku di Sexamor de ya ku di navbera jin û mêr de diqewime lêdikole; bi makîneyên xerîb û nazik dûrî meqamên fermî, ji wan tê ku bişibînin (metaforan çêbikin) û bikin ku mirov bifikirin: Ev rola hunerê ye, bi awayekî li gorî rastiyê (otantîk) mirovan ji lîstikên di xeyal û fikran de xila bike û vegotina perspektîfa rexnegir a bûyeran.

Wergera ji fransî
Lokman Turgut

---

(1) Jean Baudrillard, "Komplo ya Hunerê'', Libération, Paris, 20 Mayis 1996.

(2) Bixwîne, Aude de Kerros, "Art moderne, art contemporain : l'impossible 'débat' (Hunera modern, hunera hemdem: 'gengeşeyeke' ne mumkin)", Le Débat, Parîs, hejmar 150.

(3) Serokê kevin yê koma Pinault-Printemps-redoute, sala 2007'an sêyemîn kesê herî dewlemend ê Fransa'yê bû û amatorekî mezin ê hunera hemdem e.

(4) Beatrice Wood, hevala Duchamp, weha dinivîsî: "Yekane hunerên Amerîka'yê afirandî lûle û pirên wê ne"; "Marcel", in Marcel Duchamp: Artist of the Century (Marcel Duchamp: Hunermenda sedsalê), MIT Press, Cambridge, 1990, rûpel 14.

(5) Kompozîtorê (bestevanê) alman (1714-1787) ku hewl da ya xwezayî û ya rastî dramatîk bixe nava operayê.

WERGER

Kî dikare peyva "Pero, che!" wergerîne?

ALBERTO MANGUEL*

JORGE LUIS BORGES di wê baweriyê de bû ku divê werger bêje bi bêje neyê kirin û digot: ''Şaşitî ew e ku em jibîr dikin ku her ziman xwedî şêwazeke cuda ye ku mirov pê karibe gerdûnê hîs bike û bibîne.''

'Werger' navekî ye ku em didin tevgera herî samîmî ya xwendinê. Her xwendin werger e. Bi xwendinê veguherîn pêk tê. Yanî mirov êdî gerdûnê ne tenê bi awayeke fîzîkî dibîne, derbasî asteyeke wisa dibe ku dikare wê herwiha hîs bike û bijî.

Mirov ji cîhana nivîsandinê (bêjeyên nivîsandî) derbasî cihaneke din (bêjeyên dîtî û bîhîstî) dibe. Di van demên dawî de, hin lêkolînên zanistî nîşandan ku aliyê hişê me yê ku xwendina nivîsan organîze dike, di heman demê de xwedî wê fonksiyonê ye ku şekil û mesafeyan jî ji hev derdixe. Bi gotineke din, faaliyeta xwendinê, ji aliyê psîkolojîk ve, şeklê fîzîkî yê gerdûnê werdigerîne tişteke xeyalî, di heman demê de xuyangî. Xwendin ji aliyê fîzîkî û materyelî ve, rastiya cihanê veduguherîne rastiya ku mirov li gorî xwe hîs dike.

Binavkirina tiştekî bi serê xwe wergera wê ye. Dema em malzemeyek yan kesekî bi nav dikin, şeklê wî yê fîzîkî bi xwe re pir wateyan derdixe holê; aliyê wî yê estetîk, polîtîk, civakî, psîkolojîk xwe dide ber çavên mirovan.

Dema mirov bibêje: 'Amerîka ya îspanyolî', ew jî bi serê xwe werger e, wergera bîranînekê ye. Bîranîna erdnîgara wê ya bêsînor, çîrok û dîroka wê ya bi niştecîhên çermsor re, tevgera wê ya dagirker, serxwebûna wê, dagirkeriya wê ya nû, bajar, çem û buhurên wê, berhemên wê yên wêjeyî, karxane, rê û jiyana her hemwelatiyek wê. Ev herdû bêje dikarin vebuguherin wateyeke gelek berfireh.

** Nivîskarê kanadî, bi eslê xwe arjantînî ye.*

Her werger bi destxistina nirxekê ye. Yek ji pêvajoyên herî berbiçav ku Amerîka'yê di pir aliyan de kir xwedî nasname, pêvajoya piştî hatina îspaniyan ya vê parzemînê bû. Di navbera zimanên xezayî yên vê parzemînê û yên biyaniyên ku piştre hatin ser vê xakê de di destpêkê de hevdîtin, şer, diyalog, hewldana hev tinekirinê, xwendin û di dawiyê de jî hev qebûl kirin çêbû.

Di dema Amerîka ya berê de, werger, tevger û navgîneke ewqas girîng bû ku bi saya wê kesekî dikaribû yê din nas bike û zimanê wî hîm bibe, ha ji bo wî fêm bike, ha ji bo bi wî re bikeve diyalogê û ha ji bo wî tine bike.

Li gorî efsaneyan, di dîrokê de, wergerê yekem yê Amerîka ya îspanyolî jinekê bûye, navê wê, yan Doña Marina yan jî Malinche bûye. Ev jina endîjen (niştecîh) di navbera Hernan Cortes û Moctezuma de rola wergeriyê lîsti ye.

Jose Cadalso, di berhema xwe xwe ya nehemîn ya bi navê Nameyên Marokanî de ku di sala 1774'an de qedandiye wiha dibêje: 'Ev mînakeke nuxwaz e û layiqê pesindayînê ye ku bê hed û hesab, pêdiviya mirovan pê heye, lê bi şertê ku bi tevgere nazik ji encamên mezin û pewîst re xizmetê bike'

Di perspektiva pederşahî de, bi gotineke din di nêrîna serdestiya mêr de, bi rêya wergerê, cara yekem bû ku, ji bo fêmkirina zimanê yê din, li ser xaka dagirkirî di şûna çek û şûrên mêranî de, navgîn û enstrumenteke 'nerm'-tir dihat bikaranîn. Helbet îtîbara wê, bi qasî wergera Saint-Jérôme yan jî ya Alphonse le Sage tine ku bi temamî bi modela kilasîk ya mêranî hatiye kirin. (Saint-Jerom di navbera salên 340-420 an de jiya ye û Încil ji zimanên yûnanî û cihû wergerandiye latînî. Alphonse le Sage jî di navbera salên 1221-1284'an de jiyaye û melîkê herêma Castille û ya Leon'ê buye. Wî di şûna zimanê herêma xwe castillanî de, latinî weke zimanê zanyarî û hukumdariyê pejirandiye.)

Di encama xebata wê cîwanika werger de (ku Nora Catelli wê weke Malinche'ya delal bi nav dike) zimanê niştecihên herêmê veduguze zimanê Xiristiyaniyê. Di vê tevgera veguhezînê de tiştek sihîrî derdikeve holê. Hemû nirx û dewlemendiya estetîk ya Ewrûpa'yê xwe dide der. Ev yek jî ji kaşîfên herêmê re dibe hêz û wesile ji bo ku karibin hem wê parzemînê û hem jî rola xwe ya li ser wê xakê li gorî xezaya herêmê binirxînin.

Nivîskarê Cadalso di nameya xwe ya pêncemîn de wiha dibêje: 'Her tişt ewqas bi hêsanî ji nav hev derket û ket ser rê, wek ku darê sîhêrê hatibe bikaranîn; keşif, bidestxistin, hukumdarî, serdestî, tev xweşikiyên awerte ne.'

Ew herwiha bi nêrîneke vekirî ya bêalî dibêje ji bo ku 'dadgeriya herî bi edalet saz bikin' ew neçar in herwiha serî li berhem û nivîsarên biyanî-jî bidin, ji ber ku hemû berhemên nivîsandî yên li ser bidestxistina desthilatdariya herêmê, yên îspaniyan e.

Ew dide zanîn ku 'Xwendina vê dîroka taybetî, pêwîstiyeke girîng e ku divê li dîroka giştî ya Îspanya'yê were zêdekirin.'

Ev xaleke bingehîn e: ji bo xwe nas bikî û têbigêhêjî, kesê din bixwîne. Di werger û veguhezîna zimanê xerîb ya zimanê ku mirov rojane bikartîne de hin rêç û bermayiyên çanda kesê li hember tê parastin. Mirov nasnama xwe di van bermayiyan de dibîne û bi xwe dihese.

Di berhema bi navê Cadalso'de, wergera ku bi zimanê Amerîkî hatiye kirin heye. Weke mînak pêvajoya tevgera keşfê, şûnve vedigerîne xala destpêkê û ernîgara wê ne li gorî mantiqê biyaniyan, lê li gorî koka xezaya wê, bi nav dike. Bi nazikiyeke mezin, werger û xwendinê bi hev ve girê dide.

Dara ku li gor avûhewayeke din kok girtibe, li ser xakeke cuda were danîn

Li Amerîka'yê, tevgera serxwebûnê ya gelên di bin desthilatdariya îspaniyan de, çiqas bipêşdiket, di wê asteyê de, daxwaza ji bo guherîn û nûjenkirina cîhanê jî ewqas bipêşdiket.

Îspanyoliya herêma Amerîka'yê ji ya li Îspanya'yê cudatir e. Pir sedemên wî hene: Yan ji ber ku niştecîhên herêmê dixwazin vegerin ser koka xwe û naxwazin gotin û bêjeyên xwe yên kevin ji bîr kirin, yan hin gotin û bêjeyên zimanê xwe yê zikmakê tevlî îspanyolî kirine, yan jî li gorî jiyana xwe ya rojane gotin û bêjeyên nû afirandine.

Îspanyolî ya kreol ji bili xwe naşibe tiştekî din, weke vegera ser koka xwe ye, weke xemilandineke ne bi bi awayê îspanyolî ne jî bi awayê endijen e. Tiştekê wisa ye ku bi taybetmendiyên xwe bûye metis, navbenkar û bûye pir.

Berî niha hatibû diyarkirin ku di salên 1800'î de, li Meksîka, li Perû û li Arjantîn'ê wergerên herî giranbiha û watedar di encama sansora Îspanya'yê de hatine kirin. Îspanya'yê di wan deman de bazirganî û birin û anîna berhemên nivîsandî û pirtûkên fiksiyonê qedexe kiribû.

Li Amerîka ya îspanyolî, piştî van wergerên girîng 'xwendevanên wisa derketin ku evîna wan ya xwendinê hilberîna berhemên wêjeyî derxist asteke bilind.'

Werger êdî tevgereke ne tenê ji bo kesên xwedî xwendin û nivîsandinê ye, ew hewiha bûye faaliyeteke fermî ku xitabê tevahiya civakê dike.

Di nava vê atmosfera xwendinê ya herêmî, ya kevin û ya pêşerojê de, zimanzanê venezûelî Andres Bello li ser rêziwateke nû ya îspanyolî kar dike ku bi taybetî xîtabê amerîkiyên îspanyolî bike.

Ew di nivîsareke xwe de bi vî awayî behsa vê xebata xwe dike: ''Bi vê xebata xwe, îddîa nakim ku ez ji bo gelê Castillan dinivisînim. Dersên min bi taybetî ji bo birayên min, gelên Amerîka ya îspanyolî hatine amadekirin. Gelek girîng e ku em zimanê ecdad, bav û kalên xwe bi awayê herî pak biparêzin. Ji ber ku ev ziman, rêbaz û navgîneke bi tenê ye ku dikare di navbera hemû gel û netewên îspanyolî yên li ser herdû parzemînan dijîn de, tekiliya biratiyê dayne. Helbet ev ne pakiyeke li gor baweriya batil e ku ez hewldidin derxim pêş. (...) Xirabî û êşa herî mezin ku dikare mirovan mehrûm bihele ji dewlemendî û ji aliyên veşartî yên zimanê civakekê, zayîna neolojizmê ye, bi gotineke din afirandina bêjeyên nû ye. Eger pêşî lê neyê girtin, ev yek dikare bandoreke xirab li zimanê nivîskî yê li Amerîka'yê bike. Ziman weke bedeneke jîndar e; Beden jîndariya xwe ji kîjan aliyê xwe digire? Element û libat weke nasnameya beden, nikarin bi serê xwe jîndariyê pêkbînin. Lê yekvûcûd û yekgirtîbûna berdewamî ya tevgera van libatan, di pêkanîna jîndariyê de, ji şekil û cihêrengiya wan girîngtir in.''

Fonksiyon li pêşiya form e, bi gotineke din tevgera libatekî ji şiklê wî girîngtir e: Ev formula safî karrollînî ku dibêje ; 'li wateya wî miqayet be, deng bi xwe xwedî li xwe derdikevin' lî Amerîka ya îspanyolî di sîstema wergera nivîsên wêjeyî de pir bi berfirehî tê bikaranîn. 'Ez ji bo kê wergerê dikim'? Diyar e ku ev gotin ji Malînche bigire heta îro, sirûşta bingehîn ya wergerên vê parzemînê ye.

Sedsalekê dû re, di çarçoveya pêşnîyazên Borges de, wergerên herî baş yên Amerîka ya îspanyolî dev ji wergera bêje bi bêje ku encamên eceb derdixin holê, berdan û awayê wergereke serbest ya ku wateyê ji xwe re esas digire, derxistin pêş. Êdî



Jina helbestvan di hunera rojhilat de - Efekt LMD kurdî

bi wergerê nedihat xwestin ku tevnê, berovajî bikin û tenê gotin û bêjeyên ziwatekî li zimanên din wergerînin. Miguel de Cervantes, navên Luis Zapata û yê Horace bibîr anîbû û ecêbiya wergera bêje bi bêje bi vê gotinê anîbû ziman: ‘wek ku mirov berovajî li tevna xalîçeya filamanan binêre.’’

Karê wergerê wezîfeyek pir zehmet û tevlihev e ku jêre merîfetên awerte divê: Wek ku mirov eslê tiştekî li ser zemîneke nû ava bike, wek ku mirov xezaya herêmekî bi gotin û bêjeyên biyanî dagir bike, yan jî wek ku mirov dara li gor avûhewayeke din kok girtibe li ser xakeke cuda dayne.

Di sala 1974’an de, Borges, di El Hacedor, de bi navê La Trama (Tevn li darxistin) nivîsek piçûk weşand. Ez dixwazim vê nivîsê ji nûh ve li vê derê jî binivisînim.

“Tirsa di dilê wî de derketibû asteya herî bilind. Cesar, ji ber darbeyên giran yên xençeran ku ji hevalbendên xwe dixwar, li bin peykerekî êdî ji qidûm ketibû. Di nava ewqas devên xençer û serêyan de, ruyê Marcus Junius Brutus fîrq kir, delaliyê wî, dibe ku kurê wî be jî. Wê demê yêdî hewce nedît xwe ji darbeyan biparêze û wiha qêriya: “Ma tu jî, kurê min!” Shakespeare û Quevedo ji vê derê, gazinc û qêrîna tijî hes, bi destxistine.

Kêfa qederê dihat ji dubareyan re, ji cihêrengî û ji sîmetrêyan re. Piştî Nonzdeh sedsalan, li başûrê bajarê Buenos Aires, şivanekî (gaucho) ji aliyê şivanên din ve tê lêdan, dema li erdê dikeve, di nava êrişkaran de, kurê xwe yê watevî firq dike. Bi awirên matmayî, bi dilekî tijî gazinc, lê vedigere û bi dengekî hêdî jê re dibêje: “Pero, che” (Ev biwêj divê neyêne xwendin, tenê dema werin bîhîstin dikarin bigêhêjin wateya xwe). Ew wî dikujin, lê ew nizane ku bi mirina wî re sahneyek heman rengî xwe dubare dike.

Berî çend salan, bi aramca ku vê nivîsa Borges, bi hin dostên xwe yên kanadî re parvebikim, min xwest wê wergerînim îngîlîzî. Lê min pir zehmetî kişand, yek ji astengiyên asê, bi taybetî jî biwêja “Pero, che!” bû. Ev îfade bi awayeke mukemel nikare were wergerandin, ev gotin li ser xaka Arjantin’ê, ewqas ji kûr ve kok girtiye ku ne mumkune mirov karibe wî di zeviyeke din ya ziman de ji nu ve dayne. “Pero, che” dibe ku bûbe perçeyekî nasnameya Arjantîn’ê. Gilî û gazinceke ewqas ji dil û ewas taybetî ye ku nikare li ti derekî din yê cîhanê were bilêvkirin. Li Îngîltere û li Amerîka ya Yekgirtî “Pero, che” nayê gotin, li Îspanya, li Meksika yan li Kuba’yê jî zêde nayê bikaranîn, “Pero, che” gotineke taybetî ye û bûye wate û nasnameya axaftina kreolî.

Baş e ku dîroka wergerê ji mucizeyên piçûk pêkhatiye. Bihnpakî, erdem, aqil, merîfet, tecrûbe, lêkolîn, tesaduf: Her yek ji van faktoran di pêkanîna wergereke serkeftî de dikeve dewrê. Lê dîsa jî di vî karî de, ya herî girîng û bingehîn, kalîteya mucîzê ye. Di vê zeviya afirandina wêje de, serkeftineke bê mucîze tine.

Nivîsareke koçerî ku ti car kon venagire.

Ew wergera ku ez nikaribûn ji nav dereketama, min dev jê berda. Bikaranîna bêjeyên weke hev serê min êşandibû. Ji bo hinek bala xwe sivik bikim û êşa serê xwe kêm bikim, min berhema Gilbert Keith Chesterton ya bi navê A Short History of England, xwend. Borges jî ev pirtûk baş nas dikir. Ji nişka ve ev hevok derket pêşberî min: ‘’Demên dûr û dirêj, wiha dihat zanîn ku netewa brîtanîk ne ji aliyê Jules Cesar ve lê ji aliyê Brutus ve hatiye afirandin. Kontrast û dijberiya di navbera wê keşîfa rastîn û ya avabûneke fantastîk û xeyalî de, xaleke komîk heye. Mîna ku gotina bi latînî ya Jules César “Et tu, Brute?” karibe di îngîlîzî de wisa were gotin: “What, you here?” Biwêja “What, you here?” ya Chesterton wergera mukemel ya biwêja ‘Pero, che’ ye. Yan jî biwêja ‘Pero, che’ ya Borges wergera mukemel ya ‘What, you here?’e. Werger jî weke xwendinê di herdû îstiqametan de jî dikare rêwitiyê bike: ji çavkaniyê ber bi nivîsa orijinal ve, yan jî ji nivîsa orijinal ber bi çavkaniyê ve. Çavkanî û orijinal di wê rêwitiyê de pir caran wisa tevlihev dibin ku ji navhev dernakevin, û pir caran jî wateyên xwe diguherînin. Kî xwediyê berhemê ye, kî wergerê wan biwêjan e? Borges yan Chesterton? Ne mumkun e were zanîn. Kronolojî û anakronolojî bi gotineke din rastnivîs û çewtnivîsa tarîxan, têgehên ne hewce ne ji bo darizandina wergerekî û ya çavkaniyên wê.

Xwendevanên ku di pirtûkxaneya gerdûnî de derdikevin gera nivîs û berhemên ku xwe di wan de dibînin, dema kaliteya wergerê qebûl dikin, wezîfe û barê wan girantir dibe. Wê demê, nivîs û hevokên ji wê rûpelê tên girtin, veduguhêzin nivîsen cûrbecûr ku di nava xezineya bêjeyên xwendevan de reng diguherînin, di şiklên cuda de dibin xwedî wate, tecrûbeyên xerîb bi destdixin, dibin xwedî bîranînên nû û di refên pirtûkxaneyên cuda de tên hilanîn.

Werger-xwendevan di şûna nivîseke sabît de ku ji şûna xwe nalebite, nivîseke koçerî ku ti car kon venagire û tim di nava tevegerê de ye, pêşnîyaz dike. Vaye, paradoks û nakokiyên hunera wergerê ev in: Bcerhemeke wêjeyî di domahiya koçberiyeke berdewam de û bi xêra keşfên nû dikare hêz bigire, kêmtir wate buguherîne û bi awayeke mucîze bêmirinî dibe cewherê xezaya wî. Ji xwe xeza ya hunerî ya berhemê jî tiştek wisa ferz dike.

Wergera ji fransî
Bedran Dere

VENEZÛELA

Karakas li pey stratejiya pêşketinê de ye

MARK WEISBROT*



Ahmet Gümüştekin (Heft sirrên gerdûnê)

Di serdana Brezîlya ya 2'ê Adarê de Wêzîra Karê Derve ya Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê Hillary Clinton ji bo mîheke ji keriyê xwe qutbûyî ya li baxçeyê pişta mala xwe waezek kir: "Em hêvî dikin ku hukûmeta Venezûela'yê ji nûh ve (...) mulkiyeta şexsî misoger bike û li aboriya bazarê vegere (1)." Ti tiştî nû nîne. Ji 2003'an ve Venezûela'yê tevahiya rekorên mezinbûna aborî şikandin. Muxalifên desthilatdariya heyî, di nava wan de Washington û piraniya çapemeniya navneteweyî jî hene, her "dinalin, di xemgîniya xwe de digirîn û hêvî dikin" çawa ku di navê strana rockvanê navdar Buddy Holly "Crying, waiting, hoping (girîn, li bendê mayîn, hêvîkirin)" de jî heye. Wan gelek nivîsî û got, guleya petrolê wê dereng neteqe, bi vê jî bûyerên li gorî dilê xwe anîn ziman.

Lêbelê; di nava 5 sal û nîvan de hilberîna hundir a brut a reel a Venezûela'yê ji sedî 95 zêde bû, xizanî nîvî bi nîvî kêm bû û xizaniya zêde jî bêhtirî ji sedî 70'î kêm bû. Xercên civakî ên serê şênî sê caran ji ya berê zêdetir bû û di heman demê de gihîştina xizmeta tenduristiyê û perwerdeyeke zexmtir jî gelekî baştir bû. Sala 2006'an hilbijêran bi piraniyeke ji sedî 63'an Serok Hogo Chavez hilbijart û minetdariya xwe nîşan da. Ev rêje ya herî zêde bû ku Chavez bi dest xistibû.

Her çawa be, piştî ku aboriya Dewletên Yekgirtî serberjêr çû, ber bi dawiya 2007'an ve, aborî dest pê kir bi pêşket. Di trîmestra dawî ya sala 2008'an de bihayê kurên petrolê bi awayekî gelekî zêde kêm bûn. Ji asta rekorê 99,5 euroyan daket 29,7 euroyan. Ji dema greva mezin a sektora petrolê ya salên 2002-2003'an ve Venezûela careke din bi krîza aborî re rûbirû bû; hilberandina hundir a brut sala 2009'an ji sedî 3.3 paşve ket. Daxwazên dijminên Chavez pêk hatin. Weke dema piştî oforiya di navbera 1973-1977'an ya şoka pêşi ya petrolê de, ev dana Xwedê ya reş (petrol) bi tenê dikare rê li ber hilweşîna aborî veke.

Gelo em dikarin evqasî ji vê yekê piştrast bin? Lêkolînên li ser xisletên vê krîzê nîşan didin ku ev krîz ne bivê nevê bû. Lêçûna sektora taybet ji sala 2008'an ve kêm bûbû. Piştî ku bihayê petrolê gelekî kêm bûn, lêçûna vê sektorê bêhtir kêm bû. Wê wextê hukûmetê dikarî planeke rûhpêanîna sektora enerjiyê bixe dewrê, riya vê jî zêdekirina lêçûnên gelemperiyê bû da ku cihê ku ji daxwaza sektora taybet vala mayî tijî bike. Hukûmetê ev nekir. Berevajî, mezinbûna sektora gelemperiyê bi awayekî hişk kêm bû. Sala 2008'an rêjeya mezinbûnê ji sedî 16.3 bû, di 2009'an de ev rêje daket ji sedî 0.9'an.

Ji bo Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF) û hin saziyên din ên sektora fînansê, ji mêjve ye misêwa du tiştên bi hevre hene: Welatên dewlemend, yên weke Dewletên Yekgirtî yan jî Brîtanya dikarin bi awayekî rewa destûrê bidin xwe ku bi gelêkî zêdeyî budçeyên xwe lêçûnên wan hebin, da ku li ber tesîrên paşveçûneke aborî xwe bigirin; welatên pêşdikevin divê ya berovajî vê bikin, ango lêçûnên sektora gelemperiyê kêm bikin û zêdeyî budçeya xwe mesrefê nekin. Heçî Çîn bû bi xêra planeke rûhpêanîna aborî ya mezin bi awayekî serketî xwe ji qeyranê xilas kir û tevî aloziya aborî ya global jî di 2009'an de ji sedî 8.7 mezin bû.

Hemin, avantaja hukûmeta çînî heye ku tevahiya sîstema bankeyan kontrol bike: Jê hat ku banke û saziyên malî neçarî dana krediyê bike, hêja ye mirov bizane ku lêçûn û pererazandinên gelemperiyê ji sedî 20'ê hilberandina hundir a brut in. Bolîvya, dewleteke ku qada wê ya watevrayê mezin nîne, jê hat

* *Hev-Dîrektorê Center for Economic and Policy Research (Navenda ji bo Lêkolînên Aborî û Siyasetê), Washington.*

ku di dema rast de siyaseteke ruhpêanîna aborî bixe dewrê ku ger mirov mezinahiya aboriya Bolivyayê li ber çavan bigire ji ya Dewletên Yekgirtî baştir û kerhatîtir bû. Vê planê hişt ku par Bolîvya performansa herî baş a parzemînê bi rêjeya mezinbûna aborî ya ji sedî 3 bi dest bixe. Hilberandina hundir a welatên din berevajî vê kêm bû.

Welatên pêşdikevin yên dixwazin siyaseteke ruhpêanîna aborî di dema serberjêrçûna aborî de bi rêve bibin, bi muhafezekirina rezervên xwe yên dovîzan di asteke têrker de divê tewazûna butçeyê li ber çavan bigirin. Dewletên Yekgirtî ne mecbûr e vê bike, lewra ew dikare lêçûnên kirînên xwe yên ji derve bi pereyên xwe bide.

Tewazûna çûnûhatina pereyan a Venezûela'yê di sala 2008'an de têra xwe dovîz jêre dihiştin, welêt dolar kom kiribûn. Di dema hilweşîna kura petrolê de dovîzên weke kar jêre diman, bi lez veguherîn zirarê... Bi tenê ji bo 6 mehan: Hukûmetê ji van dolarên kombûyî pere birin da ku lêçûnên kirînên ji derve bide. Ti tiştî li ser hukûmetê ferz nedikir ku bihêle aboriya wê têk biçe. Wê dikarî ji rezervên dovîzan ku têra xwe gelek mabû – 30 milyar dolar - hinekî din jî bibe, li dijî reva sermayê têbikoşe û heta eger biviya wê karîbû ji bazarên navneteweyî bi qasî ku jêre diviya deyn bikira. Deynê derve yê gelemperiyê yê Venezûela'yê têra xwe kêm e (ji sedî 11'ê hilberandina hundir a brut) û tevahiya deynên gelemperiyê bi tenê ji sedî 20'ê heman hilberandina hundir a brut in. Ji bo em li ber hev bigirin em li mînaka Dewletên Yekgirtî binêrin; deynên gelemperiyê ji sedî 100'ê hilberandina hundir a brut in.

Weke dewlet di destê Venezûela'yê de ji bo fînansekirina hewcedariyên ruhpêanîna aborî bi xwe têra xwe dovîz hene. Pêdiviya wê bi dovîzan bi tenê ji bo lêçûnên kirînên xwe yên ji derve û ji bo parastina asteke rezervên dovîzan a guncav heye. Ev kirînên ji derve ji ber pêşketina wê ya aborî her diçe zêdetir dibin – berevajî welatekî ku aboriya wê xira dibe, kirînên welatekî wisa yên ji derve wê bi awayekî mentiqî kêmtir bibûya.

Ev çavdêrî hemû nîşan didin ku mezinbûna aborî ya welatekî ne ewqasî girêdayî bihayê petrolê ye, weke ku bi giştî tê bawerkirin. Di destê hukûmetê de navgînên destwerdanê hene da ku li gorî rabûn û ketina bazara petrolê tevbigere, lewra deyndariya wê kêm e û rezervên wê yên dovîzan jî zêde ne.

Ji heft salan û virve Venezûela jixwe bi rewşeke bêhtir bi fikar re rûbirû bû: Nirxê pereyên wê gelekî zêde bû. Di 2003'an de hukûmetê ji bo dolerekê nirxê bihevguherînê weke 1600 bolîvarên wê demê (1.6 bolîvarên îro (2)) diyar kir. Piştî du devaluasyonan sala 2005'an bihayê dolarekê ji 2.15 bolîvaran bihurî. Heta Çile ya borî jî ev kura bihevguherînê weke xwe ma.

Ji ber vê kura bihevguherînê ya diyarkirî, zêdebinirxbûna pereyê Venezûela'yê her diçe zêde dibe. Înflasyon li Venezûela'yê ji welatên pêre bazirganî dikirin bêhtir bû: Di nava 7 salên dawiyê de navîna înflasyonê salê ji sedî 20 bû. Eger weke hîpotez em bêjin pereyê Venezûela'yê kêliya kura bihevguherînê ya diyarkirî ji bo dovîzan kete meriyetê nirxê wê zêde nebû, hingî li gorî pîvanên reel înflasyon wê bibûya ji sedî 130.

Ev rastî dike ku bihayê berhemên tên firotînî derve xweber zêde bibe û bihayê kirînên ji derve jî kêm dike. Kirînên ji derve bi awayekî lihevçêkirî dibin bazareke baş (3). Di van şertan de zehmet e, heta ne mumkin e ku Venezûela bi piralîkirina aboriya xwe para sektora petrolê kêm bike. Ya rastî ji heft salan û vi ve ji vî aliyî ve ti tişt neguherî.

8'ê Çile ya bihurî ji bo rûh bi ekonomiya hilberîner bîne, kirînên ji derve yên nelazim kêm bike û firotina ber bi derve ve teşwîq bike, Karakas'ê devaluasyonek kir. Hukûmetê navê "eyarkirina bolîvarê" li vê devaluasyonê kir. Ji bo piraniya kirînên ji derveyî welêt kura 4.3 bolîvar bi dolarekê hat diyarkirin – maşîn, alavên înformatîk û telekomunîkasyonê, alavên elektronîk yên nava malê, xizmet, tekstîl, alavên luks, tutin, vexwarin û hwd. Di heman demê de ji bo tevgera aborî ya ku weke gelekî girîng dihat dîtin jî kura 2.3 bolîvar bi dolarekê hate diyarkirin, ev kur ji bo berhemên xwarinê yên ji cotkariyê, perwerde, çalakiyên zanistî û teknolojîk, tenduristî, mekîne û bi awayekî giştî kirînên derve yên ji bo sektora gelemperiyê derbas dibe.

Ev "eyarkirina bolîvarê" bêguman wê du caran tesîrê li zêdebûna înflasyonê bike. Belê, çawa di dema devaluasyonên mezin ên di salên derbasbûyî (Brezîlya, Rûsya, Arjantîn) de qewimî, mirov dikare li bendê be ku ev bandor demî be. Bi herhal, eger ew heq dike hêza hevrikiyê ya Venezûela'yê baş bike jî, diyar e, ew ne têrker e.

Bayê înflasyon her tê, bi hejmarên reel wê zêdebinirxbûna pereyên Venezûela dîsa qat bi qat zêde bibe. Pirsgirêka înflasyonê ku di navbera 2008 û 2009'an de ji sedî 30.9'an daket ji sedî 25.1'ê, pirsgirêkeke talî ye. Misoger e înflasyon divê were têkbirin, di heman demê de ew xwe nêzî xeta ji sedî 20'an dike ku piraniya ekonomiyên makro bawer dikin, înflasyon rêjeya mezinbûna aboriyê kêm dike (4).

Bêguman Venezûela'yê rejîmeke bihevguherîna pereyan a nerm û qayîşokî ya ku wê dîsa eyarkirî bimaya, qebûl bikira, ev ê ji bo wê bi xêr bûya. Bêyî ku hêza wê ya hevrikiyê bixe tehlûkeyê, kontrola wê li ser sermayê wê bimaya û wê derfet bidaya aboriya xwe piralî bike. Wateya vê wê bibûya ev; ji xwe re afirandina navgînên stratejiyeke bi rastî ya pêşketinê. Li parzemîna Amerîka'yê ya ku ev bi dehsalan e girêdayî neo-lîberalîzmê ye, ev konsepteke bêhtir egzotîk e.

Di vê navberê de bihayê petrolê dîsa bilind bû û gihişte serê varîlê 80 dolarî. Tevî ku mirov divê bi dîqet nêzî pêşdîtinên bi vî rengî bibe jî, projeyên US Energy Information Administration (USEIA) –yek ji servîsên wezareta enerjiyê ya amerîkî – behsa bi awayekî birêkûpêk zêdebûna bihayê zêrê reş (petrol) dike û bihayê serê varîla petrolê ji bo sala 2020'an weke 98 dolar pêş dibîne (5). Li aliyê din Înstîtuya lêkolînên jeolojîk a Dewletên Yekgirtî - US Geological Survey (USGS) – di 22'ê Çile de da zanîn ku rezervên petrolê yên Geliyê Orénoque nêzîkê 513 milyar barîlî ne – du caran li texmînên heta îro dihatin kirin gelek e. Ev jî dike ku li gorî rezervên petrolê Venezûela bi gelekî bide peşiya Erebîstana Suûdî (266 milyar varîl) (6).

Li gorî ya darî çav, Karakas kontrola çavkaniyên petrolê di dest xwe de bigire7 û tedbîrên makroekonomîk yên xwe ferz dikin qebûl bike, hingî pêşiya wê vekirî û fereh e ji bo ku gelek tecrubeyên aborî, siyasî û civakî biceribîne û ji yên kêrhatî fêr bibe.

Wergera ji fransî
Lokman Turgut

---

(1) Asociated Press, Karakas, 4'ê Adara 2010'an.

(2) Li gorî qanûna veguherîna pereyan a ku Çileyê 2008'an kete meriyetê, 1000 bolîvarên heta hingî, ji hingî û pêve bûn bolîvarek.

(3) Kêmbûna firotina ber bi derve ve ya berhemên ji bilî petrolê di 2009'an de bi ji sedî 44.7'an gihişte asta herî jêr. Li aliyê din kirînên ji derve di navbera 2004 û 2008'an de ji sedî 190.7 zêde bûn (di sala 2008'an de ev rêje ji sedi 22 bû).

(4) Em li vir ta bi derziyê ve bikin û bêjin, ev mijarek e ku ekonomîst li ser qet li hev nakin.

(5) http://www.eia.doe.gov/oiaf/forecasting.html

(6) BBC Mundo, London, 23'ê Çileyê 2010'an.

(7) Di mijara petrolê de "qanûna petrolê" ferz dike ku şîrketa neteweyî ya Venezuelayê PDVSA di projeyên bi şîrketên biyanî gişan re û di her beşa bikaranîna petrolê de (derxistin, veguherîn û firotina berhemên ji petrolê) bi rêjeya herî kêm ji sedî 60'î xwediyê piraniyê be.

KANADA

Destên namerd li ser petroleke qirêj

Çima em ji bo ronkirin û jihevderxistina vê qîr û qetrana tîr a di nava xîzê de di binê erdê de bombeyeke nukleerî nateqînin?! Di salên 1950'î de ev fikrê destpêkê hatiye bîra hin kesên mejiyê wan ji aliyê zêrê reş (petrolê) ve hatî girtin û bûne dînê wê. Lê bêhtir ya hat tercîhkirin birrîna daristanan, zuwakirina çem û rûbaran, erdkolan û bi gelek avê şûştin bû. Sala 1967'an Suncor ê amerîkî kana pêşî vekir û 30 salan varîla petrolê ya herî biha ya dinyayê hilberand. Di dawiya 1990'î de pêşketina teknolojîk û bilindbûna bihayan kir ku ev kar bi kar be; di 2003'an de 173 milyar varîl rezerva petrolê ya hatî piştrastkirin, Kanada'yê di rêza rezerva petrolê de hema li pişt Erebîstana Suûdî li rêza diduyan bi cih dike.

Şansekî baş ji bo Serokê DYE'yê yê berê George W. Bush li hev hatibû ku dixwest ji sedî 75'a girêdana petrolê ya amerîkî bi rejîmên dijmin re kêm bike. Sala 2005'an ji bo ku bersivê bide pêdiviyên wezareta parastinê, wî stratejiyeke enerjiyê ji bo sedsala 21'ê destnîşan kir. Ev stratejî xwe disipêre sotemeniyên weke niftê yên ne girêdayî peymanan (ne konvensiyonel) di nava van de yên Alberta'yê jî hene. Serokwezîrê ji Alberta'yê yê Kanada'yê Stephen Harper, kurê kadroyekî Împerial Oil, êdî pesnê xwe dide ku ew "hêzeke super a enerjiyê ku peyde dibe" bi rê ve dibe (1). Roja piştî hatî hilbijartin, Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê û Kanada'yê biryar dan ku hilberîna ji xîzê ya petrolê bigihînin rojê 5 milyon varîlan, da ku heta 2025'an bersivê bide ji çar paran yekê pêdiviya amerîkî.

Kanada bêhtirî ji sedî 65'ê petrola ji Alberta'yê difiroşe Dewletên Yekgirtî yên Amerîka'yê. Ev par wê ti carî kêm nebe, lewra peymana danûstendina serbest a Bakurê Amerîka (Alena) vê parê misoger dike. Tevî çend dengên rexnegir ên ji nav refên demokratan jî, Barack Obama bi ti awayî ev rastî neguherî. Li aliyê xwe Harper jî hez dike meyla xwe ya ji bo bazara serbest, berjewendiyên Çîn'ê û miyarek û 900 milyon dolarên kanadayî yên wî sala 2009'an razendina bibîrbixe. Çi amerîkî, çi ewrûpî û çi asyayî, şîrketên mezin ên petrolê bêhtirî 200 milyar dolarên kanadayî ji niha ve di nav xîzê de veşartin.

E. R.

Wergera ji fransî
Lokman Turgut

---

(1) Bixwîne, Marc-Olivier Bherer, "La diplomatie belliqueuse d'Ottawa (dîplomasiya harr a şerxwaz a Ottowayê), Le Monde diplomatique, Sibata 2009'an.

Ahmet Gümüştekin

Di sala 1966'an de li Bakûrê Kurdistan'ê li bajarê Batman'ê ji dayik bûye. Di salên zarokatiyê de dest bi wênekêşiyê kiriye. Akademiya Hunerên Ciwan ya Zaningeha Mîmar Sinan xwendiye. Di sala 1997'an de li Stenbol'ê atolye ya xwe ya yekem vedike. Di sala 2003'an de pîşengeha xwe ya yekem bi navê rengên piştî tariyê vekir û gav avêt nav cîhana hunerê. Berhemên Güneştekîn ku tevlî bi dehan pîşengehan bûye, di gelek koleksiyonên taybet de cîh digre. Hunermend di weneyên xwe de bi giranî cîh dide mîtolojiya Kurdistan û Mezopotamya'yê.

PÎRTÛK

Rêwîtiya Fîl'ê

FRANÇOIE BARTHÉLÉMY

Scrabble

Encamê hestên ku bi nexweşiyê hatiye xemilandin: Karêkterekî piçûk û bêhêvî, di rêyeke bûyerên girîng û bibandor de, kesayetiyên mezin û zilamên civakê, çalakiyên gelek xirab ên mirovan û xwepêşandanên biheybet ên xwezayê, diyalog û nivîsandin, pirs û bersivên ku tim hevdû dişopînin, bê ku werin bidawîkirin… Wisa dixûyê ku di vê romana José Saramago de "hemû tiştên xwezayê" cîh digirin. Beriya hemû amadekariyên pirtûkekê li ser hêza xeyalan tê nexşekirin, heman pirtûk li ser bingeha bûyereke dîrokî ku xetên wê di arşîvên neteweyên ewrûpî de veşartî ne hatiye nivîsandin. Emê bi tîpên mezin behsa xalên ku nivîskar zêde balê nekişandiye ser bikin.

Di sala 1551'an de, hukumdarê Portekîz'ê Joao III û xanima wî Catherîne d'Autriche fîlekê bi navê Salomon diyariyê Archiduc (Prens) Maximilien d'Autriche kiriye. "Çermê wê fîla Asya'yê, ku bi tenê bûye, feqîrok e, nîve nîv rengê wî gewr û qehweyî ye, bi lekeyan û bi pûrtê deqdeqokî bûye, di halê wî de diyar e ku ew di nava rewşeke xemgîn de ye, digel hemû wê halê wî de ew ji rewşa xwe razî be." Ev heywana biaqil di serê xwe yê mezin de pir fikran derbas dike, weke ku Buthro, hevalê wî yê ku ji Hindistan'ê hatiye, bi hestên xwe û hewesê dide der. Ew dikare, di derbarê zemanê me de, fîgûra xerîbiyê ku ji bo nanê xwe bilîze.

Di dema rêwîtiya bi kêştiyê ku ew hatin, ew û eskorta wan, ji Portekîz'ê heta Îspanya'yê, piştre jî ji Îspanya'yê heta Îtalya'yê, bi armanca ku bigehêjin Viyana'yê, li vê derê zilam û jina wî ewê ji xwe re bikin hacetê niqaşên bi civakan re. Li heman derê civak di bin zexteke olî de ne, rêveberiya keyfî ku roj bi roj bandora xwe fireh dike, pêkhatina bawermendiya girseyan bi awayeke çavgirtî, kiryarên dêreke Katolîk ku li dijî Luther, digel ku ew mirî ye, neheqiyên mezin kiriye.

Bi armanca "kêmkirina bandora hêza protestan", rayedarên olî, bê ku teredût bikin, çalakiyên pir bixezeb dikin. Bi heweseke mezin, nivîskar –ew bi xwe jî raberî êrişên heman dêrê hatiye- bi awayeke vekirî dibêje çawa keşîşekî Dêra Basilique ya Saint-Antoine, ya li Padoue'yê, ji Buthro dipirse ku ew dikare bikeve fîlekê bîne ser çokan: "Tenê li ser yek nigekî bike." Nîşandaniyekê kurt ya heywanan. "Li ber deriyê Basilique'yê li pêşiya girseyeke şahîd ku ji hemû zemanên pêşerojê re bûyerê tasdîk dike, fîl a ku bi yek lêdanekê li ser guhê wî çokên xwe tewand, ne tenê yekê, ji bo ku keşe kêfxweş bibe wî herdû çokên xwe, li pêşiya hukumdarê xwedê ku li ser asîmanan e û her wiha li pêşiya nûnerên wî ku li ser erdê ne bihev re tewand."

Silav ji bo şahîd. Çava li ser hemû fen û fûtan vebikin, li hemû qirêjiyên siyasetmedarên ku dixwazin nav û şanên xwe mezintir bikin, xapandina gelan ku ji aliyê fermandarên leşkerî ve, bi dirûşmeyên netewperest dikevin şeran… Nivîskarê mezin û ramanger Samarago me vexwendeyê fikirandinekê, weke ji duh heta îro, li ser hevpariya jiyana di navbera mirovan dike. Ev yek wisa tê kirin ku bêyî zêde ciddî were dîtin. Ew bi xwe jî amade ye ku bidîqet li kiryarên xwe binêre. Di dema rêwîtiyê de, karwan di nava mijekê sivik de derbas dibû, wî ev tişt baş nedît û wiha got: "Divê yek bi xwe ji xwe re biaxife ku bikaribe çend wêneyên wêjeyî, bê ku xwezaya wan hebe, bigire." Fersendeke din ji bo xwendevanan jî ew e ku ew lêvbiken bin.

(Nivîskar José Saramago, ji aliyê Geneviève Leibrich ve, ji portekîzî bo fransî hatiye wergerandin, Seuil, Paris, 2009, 217 rûpel, bihayê wê 19 euro)

Wergera ji fransî
Ahmet Dere

Le Monde Diplomatique kurdî
Ji aliyê Independent Kurdish Medien Group GmbH ve tê weşandin

Edîtorê giştî
Faysal Dağlı

INDEPENDENT KURDISH MEDIEN GROUP GMBH

Kaiser-Wilhelm-Ring 27-29
50672 Köln / Almanya

Desteya rêvebirîyê
Murat Satık
Rıza Dinç
Metin Göktepe
Faysal Dağlı

ALMANYA
Le Monde Diplomatique kurdî (kurmancî)

Şêwirmenda weşanê
Berîvan Aymaz

Asîstanta edîtor
Semra Polat

Asîstantê weşanê
Sharo İbrahim Garip

Rêvebirê hunerî
Hasan Hüseyin Deveci

Designer
Mehmet Nazmi Demir

Tlf: 00 49 (0) 221 56 94 162
Fax: 00 49 (0) 221 56 94 200
info@lemondekurdi.com
www.lemondekurdi.com

KURDISTAN
Le Monde Diplomatique kurdî (soranî)
Ji aliyê Rûdaw Media Company ve tê weşandin

Tlf: 00 964 (0) 750 488 56 96
info@lemondediplo-kurdi.com
www.lemondediplo-kurdi.com

Rûdaw Media Company
Caddeyî 100 Metre, Hewlêr,
Kurdistan / Îraq

FRANSA
Le Monde Diplomatique

Damezrêner
Hubert Beuve-Méry

Rêvebir
Serge Halimi

Sernûser
Maurice Lemoine

Cîgirên sernûser
Martine Bulardi,
Philippe Rivière, Anne-Cécile Robert

Redaksiyon
Alain Gresh, Mona Chollet,
Pierre Rimbert, Dominique Vidal

Rêvebirê hunerî
Alice Barzilay

Dokumantasyon
Olivier Pironet

Sekreter
Sophie Durand, Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris

ABONETÎ
Independent Kurdish Medien Group GmbH
Post Bank
Konto: 371219609 - BLZ: 50010060
IBAN: DE84 5001 0060 0371 2196 09
BIC: PBNKDEFF

Almanya:
Salane: 50 Euro - 6 meh: 25 euro
Dervayê Almanya:
Salane: 60 Euro - 6 meh: 30 euro